



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

WERGER WEK KIRINEKE ÇANDÎ

-Li Ser Riyên Ji Wergernasiyê Ber Bi Kurdolojiyê Ve-

Ziyattin YILDIRIMÇAKAR

13711017

Mêrdîn – 2016



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

WERGER WEK KIRINEKE ÇANDÎ

-Li Ser Riyên Ji Wergernasiyê Ber Bi Kurdolojiyê Ve-
Ziyattin YILDIRIMÇAKAR

13711017

Şêwirmend

Doç. Alk. Mesut KESKIN

Mêrdîn – 2016

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “WERGER WEK KIRINEKE ÇANDİ-Lİ Ser Riyên Ji Wergernasiyê Ber Bi Kurdolojiyê Ve-” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

26/01/2016

Ziyattin YILDIRIMÇAKAR

JI BO RÊVEBERIYA ENSTITÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI
TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çandê de wekî Teza
Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok:.....

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam:.....

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam:.....

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmze

Doc. Dr. Alk. Mustafa Aslan

Wekîlê Rêveber Enstitûyê

(Mor)

NAVEROK.....	I
PÊŞGOTIN.....	III
KURTE.....	IV
ÖZET.....	V
SUMMARY.....	VI
KURTEBÊJE.....	VII
DESTPÊK.....	1

BEŞA YEKEM

WERGER Û WERGERSNÂÎ

1.1 PÊNASEYÊN WERGERÊ.....	6
1.1.1 Wergernasiya beriya sedsala bîstan- Pênaseyên Zimannasiyî.....	8
1.1.2 Ekola Ereban/Dewra Emewî û Ebbasiyan.....	10
1.1.3 Wergernasiya piştî sedsala bîstan.....	12
1.1.4 Werger wekî <i>zanist</i> , meseleya hemtayîtiyê.....	12
1.1.5 Pênaseyên Fonksiyonist.....	16
1.1.6 Pênaseyên Çandî.....	16
1.2 WERGERSNÂÎ-DÎROK Û PERGALA BEŞEKE JI ÇANDNASIYAN.....	18
1.2.1 Wergernasî.....	18
1.2.2 Ji destpêkê heta 1970an.....	18
1.2.3 Ji 1970an heta iro.....	21
1.2.4 Vegerîna çandî di wergerê de.....	24
1.2.5 Wergêr, girîngî û taybetiyên wergêr.....	27
1.3 WERGER DI ÇANDNASIYÊ DE.....	29
1.3.1 Teoriya Polîsîstem (Itamar-Even Zohar) û Wergernasiya Teswîrî(Gideon Toury).....	30
1.3.2 Teoriya Skoposê (Hans Vermeer û Katharina Raiss).....	33
1.3.3 Vegerîna Çandî di Wergernasiyê de	35
1.3.4 Vegerîna Wergerî di Çandnasiyê de.....	37
1.3.5 Wergernasî wekî Interdîsîplînerî.....	39
1.3.6 Venuti- Biyanîkirin û Ehlîkirin.....	40
1.4 ÇI YE WERGER-PÊNASEYEK GIŞTÎ Û NÛJEN.....	42

BEŞA DUYEM

WERGER Û KURDNASÎ

2.1 DESTPÊKÊN WERGERÊ DI KURMANCÎ DE.....	48
2.1.1 Destpêka wergera kurdî beriya 1980yan.....	48
2.1.2 Wergera kurdî piştî 1980yan.....	54
2.2 WERGER DI KURDOLOJÎYÊ DE.....	58
2.2.1 Kurdolojî.....	58
2.2.2 Rola wergerê di Kurdolojiyê de beriya Ekola Hawarê.....	60
2.2.3 Rola wergerê di Kurdolojiyê de piştî Ekola Hawarê.....	63
2.3 WERGERA PEYVÊN KULTÛR-SPESÎFÎK JI METNÊN KURMANCÎ LI GORÎ RÊBAZÊN EHLÎKIRIN Û BIYANÎKIRINÊ.....	65
2.3.1 Ehlîkirin û biyanîkirin.....	65
2.3.2 Çend stratejiyên wergerê ku ji bo hêmanên kultûr-spesîfik di ehlîkirin û biyanîkirinê de tên bikaranîn.....	68
2.3.3 Dahûrana mînakên wergerên kurdî li gorî ehlîkirin û biyanîkirinê.....	70
2.4 WERGER WEK ZIMANÊ SEREKE YÊ KURDOLOJÎYÊ.....	77
2.4.1 Vegerîna çandî di wergerê de û Kurdolojî.....	77
2.4.2 Kurdolojî wek Wergernasî.....	83
ENCAM.....	86
ÇAVKANÎ.....	93

PÊŞGOTIN

Ev teza li ser rola wergerê di kurdî û Kurdolojiyê de ye. Bi taybetî piştî 1980yan Vegerîna Çandî di wergerê de pêk hat ku ji ber vê, ji dewsa nêrînên zimannasiyî yên çandî li ser wergerê hatin bikaranîn. Armanca me lêgerîna rola wergerê di kurdî û Kurdolojiyê de ye bi nêrîn û nêzîktêdayînên çandî ku piştî Vegerîna Çandî di wergerê zêdetir hatin bikaranîn. Piştî vê vegera çandî werger êdî tenê wekî metn nehate dîtin û bi çandê re kete hevkarigeriyekê, ji ber vê jî nîqaşên derveyî zimannasiyê di wergerê de vebûn. Em ê jî nîqaşên ku bi Vegerîna Çandî tevî wergernasiyê bûn, li ser wergera kurdî şîrove bikin. Ango ev teza bêtir lêanîneke(adaptasyon) van nîqaşana li ser wergera kurdî ye. Herwiha em ê di beşekê de li ser dîroka wergera kurdî jî bisekinin.

Destpêkirina tezekî, rêvebirina wê, û her asta wê motîvasiyonek, piştgiriyeke û alîkariyekê dixwaze ku mirov bikare dest bi karekî bi vî awayî bike û bikare bimeşîne. Bi taybetî dema mijar dibe kurdî û Kurdolojî ji ber sedemên îhmalkariya kurdî ya bi salan û nûbûna wê li zanîngehan ev pêvajoyê hêj diwartir dibe.

Ji ber wê ez di serî de spasiyê ji şêwirmendê xwe Doç. Alk. Mesut Keskin dikim ku di destpêka teze de motîvasiyonek da min ku ez bikarim dest bi vî karî bikim û piştgirî û alîkariyek da min ku ez bikarim binivîsim. Herwiha ez spasiyê xwe ji Doç. Alk. Kamal Soleimani û Behrooz Shojai dikim ku ji bo ku ez rêya xwe bibînim di destpêka teze de gelek alîkarî dane min.

Axiriyê, Ez spasiyên xwe li Doç. Alk. Îbrahîm Seydo Aydogan dikim ku fikrên xwe yên li ser wergerê û çavkaniyên xwe bi min re parve kirin û spasiyên xwe li hevalên xwe yên lêkolîner Yakup Aykaç, Mesut Arslan, Ferhat Yilmaz û Şirin Filiz dikim ku ji bo dîtina çavkaniyan alîkarî dane min.

Ziyattin YILDIRIMÇAKAR

Mêrdîn/26.06.2016

KURTE

WERGER WEK KIRINEKE ÇANDÎ

-Li ser riyên ji Wergernasiyê be bi Kurdolojiyê ve-

ZIYATTIN YILDIRIMÇAKAR

Vegerîna çandî di wergernasiyê de û vegerîna wergerî ew mijar in ku ji 1980yan vir ve hatine nîqaşkirin. Ev herdu çalakiyên wergerê werger ji dûrî nêzîktêdayînên zimannasiyê xistin û wan wergera ku di peywenda "hemtayitî"yê de tenê wekî çalakiyeke zimannasiyê dihate zanîn, vê carê wekî çalakiyeke çandî pênase kirin; bi taybetî jî vegerîna wergerî wergerê dike xala nîskokê ya dîsîplînen din. Ev teza li ser rola wergerê di kurdî û Kurdolojiyê de ye bi taybetî bi nêrîna *Vegerîna Çandî ya di Wergernasiyê de*. Ji bo ku di peywenda vê "vegerînê" de wergera kurdî û Kurdolojiyê binirxîne, berê pênaseya wergerê dike, li ser aliyê dîrokî û çandî yê wergerê disekine û wergerê wekî çalakiyeke çandî pênase dike; paşê li ser mijarên wekî wergernasiya kurdî, rola wergerê di Kurdolojiyê de disekine; piştî ku mînakên wergera kurdî dide di peywenda stratejiyên Venuti yê teorîsyenê çandî yê wergerê, mijara wergerê wekî zimanê sereke yê Kurdolojiyê nîqaş dike.

Peyvên sereke: Kurdolojî, Wergera kurdî, Wergernasî, Vegerîna Çandî, Vegerîna Wergerî.

ÖZET

KÜLTÜREL BİR PRATİK OLARAK ÇEVİRİ

-Çeviribilimden Kürdolojiye Giden Yollarda-

ZİYATTİN YILDIRIMÇAKAR

Çeviribilimde *kültürel dönemeç* ve *çevirisel dönemeç* 1980lerden beri tartışılabilen konulardır. Bu iki çeviri hareketi çeviriyi sadece bir dilbilimsel aktivite olarak "eşdeğerlik" bağlamında ele alan yaklaşımlardan uzaklaştırıp, onu kültürel bir hareket olarak tanımlama eğiliminde bulunmuş ve özellikle de çevirisel dönemeç çeviriyi diğer disiplinlerin odak noktası olmaya götürmektedir. Bu tez, özellikle *Çeviribilimde Kültürel Dönemeç*'ten hareketle çevirinin Kürtçe ve Kürdolojideki rolü üzerinedir. Bu "dönemeç" bağlamında Kürtçe çeviri ve Kürdolojiyi irdelemek için bu tez; önce çevirinin tanımını yapıp çeviribilimin tarihi ve kültürel boyutunu ele almakta ve çeviriyi kültürel bir etkinlik olarak tanımlamaktadır; daha sonra Kürtçe çeviri tarihi, Kürdoloji'de çevirinin rolü konularını işleyip, bir kültürel çeviri teorisyeni olan Venuti'nin çeviri stratejileri bağlamında Kürtçe çeviriden örnekler verdikten sonra 'Kürdolojinin temel dili olarak çeviri' konusunu tartışmaktadır.

Anahtar Kelimeler: Kürdoloji, Kürtçe Çeviri, Çeviribilim, Kültürel Dönemeç, Çevirisel Dönemeç.

SUMMARY

TRANSLATION AS A CULTURAL PRACTICE

-On the Roads from Translation to the Kurdology-

ZIYATTIN YILDIRIMÇAKAR

The topics *Cultural Turn* in Translation Studies and *Translational Turn* have been discussed in translational studies since 1980s. These two translation movements are inclined to define translation as a cultural activity by removing translation from the strategies that handles it only as a linguistic activity in context of "equivalence" and especially *Translational Turn* has caused translation to be the focus of other disciplines. This thesis is on the role of translation in Kurdish and Kurdology in context of especially *Cultural Turn* in Translation Studies. In order to evaluate Kurdish translation and Kurdology in terms of this "turn", the thesis first handles the definition of translation, then history and cultural aspects of Translation Studies and defines translation as a cultural activity. After that it handles Kurdish translation history, the role of translation in Kurdology and after giving examples from Kurdish translation in terms of Cultural Translation theorist Venuti's translation strategies it discusses 'translation as the main language of Kurdology'.

Key Terms: Kurdology, Kurdish Translation, Translation Studies, Cultural Turn, Translational Turn.

KURTEBÊJE

amd.	Amadekar
B.	Beş
bnr.	Binêre
BZ	Beriya zayîne
ç.	Çap
dnd.	Di nav de
h.b.	Heman berhem
h.g.	Heman gotar
h.r.	Heman rûpel
hwd.	Her wekî din
j.	Jimar
MA	Metna armanc
MJ	Metna jêder
nd.	Nivîskarên din
PZ	Piştî zayîne
r.	Rûpel
vgz.	Veguhêzer
wer.	Wergêr
weş.	Weşanger/Weşanxane
ZA	Zimanê armanc
ZJ	Zimanê jêder

DESTPÊK

Van salên dawî, bi taybetî piştî salên 1980yan hevkarîgeriya wergernasî û çandnasyê pêk hat. Ji ber vê hevkarîgeriyê jî, nêzîktêdayînên çandî di nav wergernasyê de berbelav bû û li dewsa nêzîktêdayînên zimannasyî ev nêzîktêdayînên çandî derketine pêş. Sedema vê guherîna di wergerê de vegeerîna çandî(cultural turn)¹ bû ku di nav wergerê de di salên 1980yan de pêk hat. Digel ku di nav wergernasyê de ev nêzîktêdayînên çandî derketine pêş, wergernasî bixwe jî êdî di nav dîsîplînên din de xwe dide xuyakirin. Di pirtûka Andre Lefevere û Susan Bassnett bi navê Avakirina Çandan(Cunstructing Cultures) de, ya ku di sala 1998an de çapbûye, Susan Bassnett diyar dike ku vegeerîna çandî ya di wergernasyê de ev deh salî zêdetir e pêk hatiye, vegeerîna wergerî(translational turn) ya di nav çandnasyê de jî di rê de ye. Bi van gotinan îşarefî ketina wergernasyê nav çandnasyê dike. Herwiha di van salên dawî de behsa vegeerîna wergerî di nav çandnasyan(humanities) tê kirin.

Armanca vê tezê nixandina rola wergerê di kurdî û Kurdolojiyê de ye . Ji ber vê, wergera kurdî² û Kurdoloji bi rêbazên çandî hatine nixandin. Di vê peywendê de em ê wergera kurdî û Kurdolojiyê li gorî *vegeerîna çandî di wergernasyê* de binixînin û em ê li ser *vegeerîna wergerî* jî fikrên xwe bînin ziman.

Ji ber ku kurdî, wekî di edebiyatê de, di zimannasyê de û bi taybetî di qada wergernasyê de zimanekî îhmalkirî ye, girîngiya vê xebatê zêdetir dibe. Mijareke din ya ku vê tezê girîng dike jî ew e ku, wê bi nêzîktêdayînên çandî nixandinan li ser wergera kurdî bike. Li ser wergera kurdî heta vê gavê xebatên akademîk zef kêr

¹Me peyva "turn" ya îngîlîzî wekî *vegerîn* wergerand ku em ê "cultural turn"ê re bêjin *vegeerîna çandî* û "translational turn"ê re jî bêjin *vegeerîna wergerî*. Peyva *turn(vegerîn)* di çandnasî û wergernasyê de ji bo guherînên di qadekî de tîrîkaranîn lê mirov nikare her guherînê re bêje *vegerîn*. Yanê metod yan jî stratejiya mijarekî biguhere mirov nikare wê wekî *vegerîn* binav bike. *Vegeerînek* dînamîkek e û dema ku paşeroja wê guherînê zêde bixuye pêk tê, û belkî guherîneke wusa pêk hatibe ku mirov wê mijarê cardin terîf bike. Wekî mînak îddîaya *vegeerîna çandî* di nav wergernasyê de ew e ku wergernasî êdî tenê bala xwe nede ser zimannasyê û bi çandê ve jî mijûl bibe. Piştî vê nêrîna çandnasyê jî wergernasî xwe ji qada zimannasyê ya teng xilas kir û mijarên cure cureyî ku tîkiliya wan bi wergernasyê ve hebûn derketin, wekî: kolonyalîzm û wergernasî, çandnasî û wergernasî, şidet û wergernasî û hwd. Ev mînaka *vegeerîna çandî* ya di wergernasyê de bû. (Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Mary Snell-Hornby, "The turns of Translation Studies", **Handbook of Translation Studies**, Vol. 1, (366-370), John Benjamins, Amsterdam/ Philedelphia 2010.)

² Di seranserê tezê de ji wergera kurdî qesta me wergera kurmançî ye.

derketine, yê derketî jî çend gotar in ku ew jî bêtir ji aliyê zimannasiyê ve nêzîkî wergerê dibin; lewma, xebateke bi vî awayî ku ji aliyê nêzîktêdayîn û rêbazên çandî ve behsa wergera kurdî û Kurdolojiyê dike girîngtir dibe.

Hewcedariya mijara me ew e ku wergera kurdî digel nîqaşên nêzîktêdayînên filolojîk, yê çandî jî biceribîne ku niha di nav wergernasiya cihanê de berbelav e. Ji ber ku nîqaşên wergera kurdî yê heyî vê gavê li ser zimannasiyê dimeşin, hewce ye ku mirov balê bikişîne li ser çandê û nêzîktêdayînên çandî jî. Lewma, taybetiya vê tezê ew e ku wê hem dîroka wergernasiyê û wergera kurdî bide nasîn, hem jî nêzîktêdayînên çandî derxe pêş ku perspektîfeke çandî di wergera kurdî de destnîşan bike. Ji aliyekî din ve jî di peywenda mijareke aktuel ku wekî "vegerîna wergerî" tê naskirin, wê nîqaşan li ser Kurdolojiyê bike.

Nêzîktêdayînên çandî bi taybetî piştî salên 1980yan li ser wergerê roleke taybet leyîst, ku bi saya wê êdî werger ji bandora zimannasiyê xilas bû û mijarên curbicur wekî Wergera Postkolonyal (Harish Trivedi, Susan Bassnett), Şîdet û Werger (Veena Das) û hwd. di bin navê wergernasiyê de hatin pêşkêşkirin. Herwiha ji aliyê teorî û stratejiyan ve jî bêtir yê çandî derketin pêş wekî Ehlîkirin (Domestication) û Biyanîkirina (Foreignization) Venuti. Ev pêvajoya ku bi têkiliya çandnasî û wergernasiyê dimeşiya vê gavê hatiye radeyekî ku êdî, bi peyva "vegerîna wergerî" di nav çandnasî û çandnasiyan de, behsa vegerîna wergerê di nav dîsîplînên din de yan jî bandora wergerê li ser dîsîplînên din tê kirin. Nîqaşa ku li salên 1980yan bi Susan Bassnettê bi gotara wê "vegerîna wergerî di nav çandnasiyê de" dest pê kir, vê gavê bûye mijareke sereke ku Doris Bachmann Medick li ser dixebite bi taybetî bi "vegerîna wergerî di nav çandnasiyan" de, ku bi awayekî "çandnasiyan wekî wergernasî" pênase dike. Vê nêrînê jî pêkan kir ku mirov li ser qadên xebatê bi nêrîneke analîtîk ya nû bixebite ku li wir werger peywira navbeynkarî (mediation), mizakere (negotiation) û veguhestinê (transformation) dibîne.³

Mary Snell Hornby guherînen di wergerê de wuha rave dike:

³ Doris Bachmann Medick, "The 'Translational Turn' in the Literary and Cultural Studies: The Example of Human Rights", **New Theories, Models and Methods in Literary and Cultural Studies**, (213-233), WVT Wissenschaftlicher Verlag Trier, Bergstraße 2013.

"Tu guman tune ye ku, herçiqas ji aliyê gel ve neyê zanîn jî, di dîsîplîna wergernasiyê de têgeha *wergerê* ji 1980yan vir ve ji aliyê wateya xwe ya orjînal, hişkehişk zimannasiyî berfirehtir bû ku goşeyên civaknasî, etîk, xebatên postkolonyal, ragihandinên bêaxaftin(nonverbal communication), ji ber pêvajoya gerdûnîti(globalîzasyon) mereqên nû û pêşdeçûyîna teknolojiya enformasyonê û gelek goşeyên din di pir weşanên din de dikare were nîşandan."⁴

Ev mijar ji vî aliyê ve girîng e ku wê, bi nîqaşên ku vê gavê di qada wergernasiyê de tên kirin nêzikî Kurdolojiyê bibe, herwiha mijareke aktuel e ji ber ku werger gav bi gav ji filolojiyê dûr ketiye û dikeve jî, û hevkarîgeriya wergernasî û çandnasiyê perspektîfên nû ji bo wergernasiyê vekiriye; bi taybetî têgehên wekî "vegerîna çandî" ku di salên 1980yan de dihate nîqaşkirin di warê wergernasiyê de û "vegerîna wergerî" ku hêj têgeheke nû ye û tê nîqaşkirin.

Armanca me ji bo nivîsandina tezeke bi vî awayî ew e ku em bi perspektîfeke nûjen nêzikî wergera kurdî û Kurdolojiyê bibin, ku ev ji dewsa perspektîfa zimannasiyî ya çandî ye. Wekî çawa nîqaşên wergernasiyê ku ji gotinên wekî -ka em peyv bi peyv wergerînin yan wate bi wate- dûr ket û perspektîfeke nû ji bo xwe vekir û ji ber vê jî rola wergerê guherî em ê jî bi taybetî di peywenda vegerîna çandî de rola wergera kurdî bigerin.

Di beşa yekê de, herwiha beşa duduyan de me bi awayekî kronolojîk behsa dîroka wergernasiyê û behsa wergera kurdî kiriye. Ji ber ku ev herdu beş jî li ser dîroka wergernasî û wergera kurdî meşiyane, nivîsandina bi rêbazeke kronolojîk herdu beşan jî ji bo nivîsandin, xwendin û têgehejtinê hêsantir dike.

Beşa yekem li ser Werger û wergernasiyê ye ku tê de çar heb binbeş bi cih dibin ku mijarên wan bi rêzê ve bi vî awayî ne: Pênaseyên wergerê; wergernasî; werger di çandnasiyê de; û pênaseyeke giştî ya wergerê. Di vê beşa yekem de em ê hewl bidin ku wergerê bidin nasîn, dîroka wergernasiyê ji destpêkê heta dema nûjen bidin û bi taybetî li ser nêzîktêdayînên çandî bisekinin ku di wergernasiyê de bi taybetî ji salên 80yan vir ve bandoreke xurt li ser werger û Teoriya wergerê dike. Di vê peywendê de em ê guherîna ku piştî salên 80yan di wergerê de çêbû û wekî

⁴ Mary Snell-Hornby, "What's in a turn? On fits, starts and writhings in recent Translation Studies", *Translation Studies*, Vol 2. (1), 41-51.

vegerîna çandî di wergernasiyê de hate binavkirin, binirxînin û behsa pêşeng û teorîsyenên wê wekî Susan Bassnett, Mary Snell Hornby û Andre Lefevere bikin. Herwiha em ê behsa Lawrence Venuti û metodolojiya wî jî bikin, ji ber ku rêbazên Venuti yên çandî li ser wergernasiyê girîng bûn. Venuti kesek e ku bi rêbazên çandî ku wekî ehlîkirin û biyanîkirin tê naskirin nêzîkî wergerê bû, herwiha li ser têgeha nedîtîniya (invisibility) wergêr nivîsand û destnîşan kir ka wergêrek bi bikaranîna peyv-fraz-hevokên çanda jêder çiqas di wergera xwe de xwe nîşan dide yan jî bi lêanîna metna wergerî bi tamamî li gorî çanda armanc çiqas xwe nedîtî dike, ku rewşa navborî ya yekem dibe biyanîkirin ya duyem dibe ehlîkirin. Armanca bikaranîna Venuti ji van rêbazan ew e ku destnîşan bike ku hemû berhemên ku ji zimanên din werdigerin bo îngîlîzî ehlî dibin, yanê ji wergeriya wan tiştek naxuye ku mirov wusa têdigihêje ku berhem di eslê xwe de îngîlîzî ne û îtiraza Venuti jî li ser vê yekê ye ku zimanên din dema tînan wergerandin bo îngîlîzî mirov nizane qet werger e. Paşê em ê ji bo wergerê pênaseyeke giştî bidin ku pênaseyeke bi çandê ve girêdayî ye.

Di beşa duyem de ku me wekî werger û kurdnasî binav kiriye, ewilî, em ê bi danasîna dîroka wergera kurdî (kurmancî) dest pê bikin ku me wekî beriya 1980yan û piştî 1980yan kiriye du beş. Di vê mijarê de armanca me ew e ku em bi çavkaniyên sînordar ku me karîbû em bidest bixin, dîroka wergera kurdî binirxînin. Paşê em ê hewl bidin ku, bi behskirina wergerên biyanî ku piraniya wan di destpêkê de ji aliyê mîsyoner û rojhilatnasan ve hatine kirin, rola wergerê di dîroka Kurdolojiyê de nîşan bidin. Wekî xala sêyem ya vê beşê em ê mînakên ku me ji wergerên kurdî hilbijartine, bi metodolojiya Venuti -ehlîkirin û biyanîkirin- binirxînin ji bo ku em bibînin ka hilbijartina peyvên/frazên/hevokên bi çandê ve girêdayî de wergêr kîjan rê tercîh kiriye û ev rê li gorî qaîdeyên Venuti çî nîşan dide. Metnên ku em ê binirxînin ji du pirtûkên ku ji îngîlîzî hatine wergerandin, û pirtûkeke ji tirkî hatiye wergerandin, hatine hilbijartin. Herwiha her berhem ji weşanxaneyên cuda û di demên cuda de derketine. Ya yekem bi wergêriya Sami Hezil pirtûka Oscar Wilde *Prensê Bextewar* e, ya duyem bi wergêriya Firat Cewerî pirtûka John Steinbeck *Mişk û Mirov* e, ya sêyem jî bi wergêriya Mustafa Aydogan pirtûka Orhan Pamuk, *Navê Min Sor* e ye. Di dawiya vê beşê de em ê mijarên "vegerîna çandî" ya ku di

wergernasiyê de çêbûbû û "vegerîna wergerî" nîqaş bikin û rola wan ji bo geşedana kurmancî û Kurdolojiyê binirxînin.

Beşa dawî, ji encamê pêk tê û di vê beşê de em ê perspektîfên xwe ji bo wergera kurdî û Kurdolojiyê bi rêz bikin, û di peywenda vegerîna çandî di wergernasiyê de û vegerîna wergerî, wergera kurdî û Kurdolojiyê binirxînin.



BEŞA YEKEM WERGER Û WERGERNASÎ

Ev beşa li ser van mijaran radiweste: Mijara yekem *pênaseyên wergerê* ye ku li vir em ê pênaseyên ji bo wergerê hatine danîn bidin naskirin û li ser kêmbûn û zêdebûna wan biaxifin. Ya duyem *wergernasî* ye ku di vê binbeşê de em ê wergernasiyê di bin du dîrokên yan jî du serdeman de -wekî ji destpêkê heta 1970yan û ji 1970yan heta îro- binirxînin. Ji ber ku wergernasiya beriya 1970yan de wergernasî ne wekî dîsîplîneke serbixwe dihate qebûlkirin, lê piştî 1972yan bi nivîsa James Holmes bi navê "Nav û Xwezaiya wergernasiyê"(The Name and Nature of Translational Studies) ji bo wergerê pênaseyeke nû derket ku ew êdî ji filolojiyê qetiya û wekî dîsîplîneke serbixwe û înterdîsîplîner hate pejirandin. Di binbeşa sisêyan de, di bin sernavê *werger di çandnasiyê de* em ê rave bikin ka werger ji aliyê çandnasiyê ve çawa hatiye terîf û tehlîlkirin û di beşa dawiyê de di bin sernavê *çî ye werger de* jî em ê ji pênaseyên ku ji bo wergerê hatine gotin ya ku ji bo nêzîktêdayînên çandî derdikeve pêş bi tehlîleke ve binirxînin. Em ê ewilî, behsa pênaseya werger û wergernasiyê⁵ bikin. Piştî wê, ji ber ku mijara teza me li ser werger û çandnasiyê ye em ê behsa çandnasiyê jî bikin û elaqeya werger û çandnasiyê bidin xuyakirin.

1.1 PÊNASEYÊN WERGERÊ

Beriya ku em dest bi pênaseya wergerê bikin ku ji aliyê teorîsyenên curbicur ve hatine kirin, divê em behsa peyva wergerê bikin ka ji ku tê û wateya wê çî ye. Di peywenda mijara me de, peyva wergerê di ferhengên Oxfordê ya îngîlîzî de wuha derbas dibe: *Tevgera wergêranê* (yan jî encama wê); *veguhezîn*(transfer), *kişandina* [tişteki] ji kesekî, *cihekî*, *mercekî* bo yeke din; *tevger* yan *pêvajoya wergerandina* ji zimanekî bo yeke din , di heman demê de *berhema vê*, *versiyona* bi zimanekî din. Ger em ji aliyê etîmolojiyê ve koka wergerê binasînin peyva latînî 'translatio' ji 'translatum'ê tê ku ew jî şeweya partîzîp, perfekt, pasîf (PPP) a 'transfer'ê ye. Transfer

⁵ Me peyva wergerê ji bo 'translation' bikar anî, peyva wergernasiyê jî em ê seranserê teze dewsa 'Translation Studies' bikar bînin.

jî tê wateya birina tişteki ji cihekî bo cihekî din.⁶ Divê mirov li vir bala xwe bide peyva 'transfer'ê, yanê veguhezîne. Ji ber ku di peywenda wergerê de em peyvan derbasî zimanekî din dikin, bi vî awayî wateyekî di zimanekî din de nîşan didin, rave dikin.

Werger mijareke berfireh e, ji ber wê, em ê li vir tenê behsa wergera nivîskî bikin ne ku behsa wergera devkî ku wekî şîrovekirin (interpretation yan jî interpretating) jî bi nav dikin. Wekî me li jorê jî dest nîşan kiribû di wergerê de veguhezînek çêdibe yanê bi gotineke herî hêsan di nav du zimanên cuda yê nivîskî de metna orijînal ya nivîskî ji bo zimanekî din yê nivîskî tê wergerandin:

Metna Jêder(MJ) bi Zimanê Jêder(ZJ)-----Metna Armanc(MA) bi Zimanê Armanc(ZA)⁷

Ji bilî vê pênaseya wergerê, teorîsyenên curbicur li gorî têgihêjtina xwe hem peyva wergerê hem jî werger bixwe pênase kirine. Yek ji wan Jeremy Munday e. Li gorî pênasekirina Munday: "Çend wateyên têgeha *wergerê* hene: Ew dikare behsa qada mijarê ya giştî bike, behsa berhemê (metna ku hatiye wergerandin) yan jî behsa pêvajoyê bike ku di kurdî de em ê jê re bêjin *wergêran*.^{8,9} Tiştê Munday li vir behsê dike ya yekem zanista wergerê ye ku em ê jê re bêjin *wergernasî* jî, ya duyem metna hatiye wergerandin bixwe ye ku em ji wê re jî dibêjin *werger*, ya sêyem jî pêvajoya wergerandina metnekî ye û em dîsa ji wê re jî dibêjin *werger*.

Li gorî Newmark jî werger " gelek çarçûnên ne hercar bi awayê ku nivîskar di metnê de niyet kiriye, wateya metnekî derbasî zimanekî din dike."¹⁰ Lê werger herdem nikare tiştê ku nivîskar niyet kiriye, bi heman awayî yan jî bi heman têgihêjtinê derbasî zimanê din bike.

Çawa ku werger wekî tişteki stabîl nemaye û di pêvajoya dîrokê de hem ji

⁶ Oxford English Dictionary, "translation", Oxford University Press.

⁷ J.C. Catford, **A Linguistic Theory of Translation**, Oxford University Press, Oxford 1965. r. 20.

⁸ Ev têgeh ji gotara Ergin Öpengin hatiye hildan ku 'werger'ê weki translation, 'wergêran'ê jî weki translating pênase dike; bnr. Ergin Öpengin, "Bizava Wergerê di Kurmanciyê de", **In Proceedings of first international conference on Kurdish Literature**, xxx. Sanandaj, University of Kurdistan Press, 2011, r. 1(jêrenot).

⁹ Jeremy Munday, **Introducing Translation Studies**, Routledge, New York 2001, r. 4-5.

¹⁰ Peter Newmark, **A Textbook of Translation**, Prentice Hall, New York 1988. r. 5.

aliyê teoriyê ve hem jî ji aliyê pratîkê ve guheriyê wusa jî pênaseyên ku ji bo wergerê hatine danîn guherîne. Wekî mînak di destpêkê de teoriyên zimannasiyê li ser wergerê zêdetir dihatin bikaranîn. Lê piştî bi taybetî 1970yan teoriyên çandî jî ketine nav wergerê; ji ber wê, pênaseyên wergerê jî guherîn. Ji aliyê din ve ji bo ku mirov pênaseyên ji aliyê teorisyenan ve hatine danîn bîne ziman divê mirov li gorî dem û senifandinekê here, ji ber ku hindî ku dem derbas bû, nêrînên li ser wergerê guherîn, nêzîktêdayîn û stratejiyên nû ketine nav wergerê û bi van jî ne tenê teorî û nêzîktêdayînen wergerê guherîn di heman demê de têgihêjtînen li ser pênasekirina wergerê jî guherîn. Me jî di pêşkêşkirina pênase û teoriyên wergerê de senifandineke kronolojîk kir, ji bo ku em bikaribin hem bi awayekî kronolojîk, hem jî kategorîk van pênaseyan pêşkêş bikin wekî Jeremy Munday di pirtûka xwe "Destpêk ji bo Wergernasiyê"(Introducing Translation Studies)¹¹ de kiriye. Ev pênase li gorî stratejî û teoriyên wergerê hatine kirin û di van pênaseyan de jî min nav û ekolên derketine pêş nivîsand ji ber ku ne mimkun e mirov fikrên hemû wergêr û teorîsyenan bi rêz bike.

1.1.1 Wergernasiya beriya sedsala bîstan- Pênaseyên Zimannasiyê

Mirov dikare wekî Peter Newmark jî dibêje ji wergernasiya beriya sedsala bîstan re bêje serdema beriya zimannasiyê jî. Beriya vê sedsalê, werger di peywenda "rasterast" (word for word- peyv bi peyv), "serbest" (sense for sense- wate bi wate) de dihat pênasekirin ku ev pênase ji Cicero (sedsala yekem BZ) û St Jerome (sedsala çarem PZ) dest pê kir . Bi gotina Cicero bixwe, wî heman şêwe û fikr parastin lê bi zimanê ku em bikar tînin îfade kirin, yanê serbest wergerand. Peyv bi peyv wernegerand; lê dîsa jî stîl û hêza zimên jî parast.¹² Yek ji wergêrê navdar yê wê serdemê St. Jerome dema wê hîngê ji yewnanî bo latînî Peymana Kevn (old testament) wergerand dîsa Cicero şopand û "*ne peyv bi peyv lê wate bi wate wergerand.*"¹³ Ev nîqaşa wergerê ya rasterast yan serbest bingeha Teoriya wergernasiyê avakir ku yek ji nîqaşên wergerê ya girîng e ku heta îro jî hatiye.

Nîqaşa ka em rasterast yan serbest wergerînin di ekolên wergera erebî û çînî

¹¹ Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 7-15.

¹² Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 19.

¹³ E.H. Jerome(St Jerome) (395 CE/ 1997) vgz. Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 20.

de jî dewam kir. Li ba Ereban bi taybetî di serdema Ebbasiyan de, wergerên keresteyên zanistî û felsefî yê yewnanî bo erebî, gelcaran jî bi wasiteya suryaniyê dihate kirin ku suryanî wekî zimanê navbeynkar dihate bikaranîn.¹⁴

Martin Lutherê ku Peymana Kevn û ya nû ji yewnanî wergerande almanî(ya herêmî) dîsa hezar û sed sal piştî St. Jerome be jî heman teknîk bikar anî û *serbest* wergerand. Li gorî Luther: "Divê tê dayikeke li malê, zarokên li kûçeyan, mirovekî ji rêzê yê li sûkê bipirsî, li devê wan binihêrî ka çawa dipeyîvin û tê wusa wergerînî; bi vî awayî ew ê têbigihêjin û bibînin ku tu bi wan re bi almanî diaxivî."¹⁵ Jixwe Luther Încîl wergerande zimanê rojane ku ji aliyê herkesî ve bê fehmkirin.

Peyvên Luther û yên Cîcero û St. Jerome ji me re aşkere dikin ku hê wan deman, herçiqas bi rêbazên hêsan be jî, nîqaş li ser *çawaniya* wergerê hebûye û ev nîqaş jî li ser vê yekê bûye ka rasterast yan serbest wergerînin.

Piştî wan, yên li ser wergerê xebitîn bêtir bi awayekî *preskrîptîv* xebitîn. Yek ji van kesan Etienne Dolet e ku di sala 1540î de pênc prensîp ji bo wergerê pêşkêş kirine:

1. Divê wergêr nivîsa nivîskar baş fehm bike, muxlaqîyan ji holê rake.
2. Divê wergêr hem ZJ hem jî ZA baş bizane ji bo ku îhtişama zimên kêmtir neke.
3. Divê wergêr ji wergera peyv bi peyv dûr bikeve
4. Divê wergêr ji latînzekirin(bikaranîna peyvên latînî) û formên cuda dûr bisekine.
5. Divê wergêr peyvên bi awayekî guncav bi hev ve girê bide.¹⁶

Li vir jî armanc dîsa ji dewsa wergera peyv bi peyv afirandina wergera serbest e. Wekî di gotinên van kesan de jî dixuye di wê demê de ku Newmark wekî "beriya zimannasiyê" bi nav dike, mijara wergerê yan jî bala rêbazên wergerê li ser nîqaşên wergera rasterast yan serbest e. Ji van herduyan jî wergera serbest derdikeve pêş.

¹⁴ Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 20.

¹⁵ Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 22.

¹⁶ Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 26.

Wergêrê alman Friedrich Schleiermacher ji nîqaşên wergera rasterast an a serbest dûr dikeve û pirseke cuda dike: "Gelo mirov çawa nivîskarê ZJ û xwendevanê ZA bîne bal hev?" Wekî bersîva vê pirsê xwe jî, Schleiermacher jî bo wergêr du rêyan pêşkêş dike. Divê ew ê yan nivîskar aciz neke û xwendevan ber bi nivîskar bikişîne; yan jî wê xwendevan aciz neke û nivîskar ber bi xwendevan bikişîne. Schleiermacher ya yekem hildibijêre yanê xwendevan ber bi nivîskar dibe. Li gorî wî jî ev hîssiyateke wusa dide xwendevan ku ew berhema orîjînal dixwîne. Vê rêbazê re jî dibêje biyanîkirin(alienation) ku dijberî rêbaza wî ya din naturalizasyonê ye ku metnê nêzîkî xwendevan dike.¹⁷ Ev rêbazên wî jî ji aliyê Venuti ve di salên 1990an de, ji rêzê ve wekî biyanîkirin û ehlîkirin hatin binavkirin.

1.1.2 Ekola Ereban/ Dewra Emewî û Ebbasiyan

Di ekola wergerê ya ereban de dewrên herî girîng dewra Emewî û ,Ebbasiyan bû,¹⁸ lewma li vir em ê bi taybetî behsa wergera dema van herduyan bikin.

Ereban di dîrokê de yekemîn car çalakiyeke wergerê ya rêkxistî û bi rêjeyeke mezin pêk anîn. Ev çalakî di dewra Emewîyan de (661-750) dest pê kir û di dewra Ebbasiyan de (750-1258) jî gihêjete asta xwe ya herî bilind, bi taybetî jî di bin hikumdariya el-Memun de werger kete dewreke zêrîn ku navenda vê çalakiyê Bexda bû.¹⁹ El-Memun li Bexdayê Beyt-ül Hikme(Mala Aliman) da vekirin ku peywira akademî, buroya wergerê û pirtûkxaneyê didît ku ji zimanên wekî yewnanî, suryanî, sanskrît, farsî û nabatean werger dihatine kirin bo erebî. Di dema Ebbasiyan de werger ji suryanî dihatine kirin, ji ber ku berhemên yewnanî hatibûn wergerandin bo suryanî û ji suryanî jî dihatine wergerandin bo erebî, yan jî ger ew pirtûk di suryanî de hêj nehatiba wergerandin wê gavê berê ji yewnanî dihatine wergerandin bo suryanî paşê jî ji suryanî bo erebî, yan jî carna rasterast ji yewnanî bo erebî dihatine wergandin.²⁰

Yek ji wergêrên herî navdar yê dewra Ebbasiyan Huneyn Îbnî Îshaq bû ku

¹⁷ Mary Snell-Hornby, **The Turns of Translation Studies-New paradigms or shifting viewpoints?**, John Benjamins, Amsterdam/Philadelphia 2006. r. 8.

¹⁸ Baker, Mona and Samed Fekhry Hanna, "Arabic Tradition", **Routledge Encyclopedia of Translation Studies**, (328-337), Routledge, Oxford 2009. r. 329.

¹⁹ Baker û Samed Fekhry Hanna, **h.b.**, r. 330.

²⁰ Baker û Samed Fekhry Hanna, **h.b.**, r. 331.

100 destnivîs wergerande suryanî û 39 heb jî wergerande erebî ku di nav wan de berhemên Arîsto, Plato û Ptolemî jî hebûn. Îbnî Îshaq di wergerên xwe de berevajî rêbaza wê demê ya "rasterast" bi rêbaza "serbest" wergerand.²¹ Di wê dewrê de wergêrên wekî Yuhanna Îbnî-el Birtîq û Naima el-Hîmsî bi rêbaza rasterast berhem wergerandin ku wan li hemberî her peyveke yewnanî peyveke erebî bikar dianî yan jî dema ew peyv di erebî de tunebûya ji yewnanî deyn dikir. Ev rêbaza serkeftî nebû, lewma gelek wergerên ku ji aliyê El-Bitrîq ve hatine kirin paşê cardin ji aliyê Huseyn îbnî Îshaq ve hatine sererastkirin.²²

Ev çalakiyên wergera Eraban ji aliyê gerdûnî ve girîng bû: Ji ber ku wergêrên ereban di destpêkê de di dinyayê de pirtûkên girîng ji qadên wekî felsefe, tib, matematîk, wêje û ji zanistên din wergerandine erebî, û agahî û Ereban zanînen xwe li ser wan zêde kirin paşê ew cardin wergerandin û veguhestine zimanên Ewropî. Evê jî bandoreke mezin li ser şaristaniya gerdûnî çêkir.²³ Bi taybetî jî di dewra Ebbasiyan de çalakiya wergerê herî gurr bû, lewma em dikarin bêjin ku bandora wergera ku di dewra Ebbasiyan de hat kirin li ser hemû zanîna Ewropayê çêbû.²⁴

Herwiha piştî van çalakiyên wergerê yê di dewra Ebbasiyan de ku mirov dikare wekî Dewreke Zêrîn ji bo wergerê bi nav bike, gelek berhemên orîjînal di qadên wekî astronomî, erdnîgarî, zimannasî, teolojî, felsefe, sîmya de hatine nivîsandin. Kesên wekî Îbnî Sîna, El-Tarabî, El Rîzî jî di nav van nivîskaran de hebûn. Gelek nivîskarên ku berhem dinivîsandin zimanê yewnanî nedizanîn lê bi saya wergera wê ya erebî filozofên wekî Arîsto dixwandin û bi saya wergerê zanîna xwe ya felsefîk zêde dikirin. Yek ji wan kesan ku bi vî awayî bi saya wergerê zanîna xwe zêde kir û berhem nivîsandin Îbnî-Rûşd bû.²⁵ Yanê bandora wergerê ji bo derketina kesên wiha navdar de gelek girîng bû, her wuha bi saya wergerê felsefe û zanistên din li cem Ereban pêşde çû.

Mirov dikare du sedeman ji bo pêşveçûna wergerê ya di dewra Ebbasiyan de

²¹ Baker û Samed Fekhry Hanna, **h.b.**, r. 332.

²² Baker û Samed Fekhry Hanna, **h.b.**, r. 333.

²³ Rababah, D. Hussein Abdo, "The Translation Movement in the Arab World: From the Pre-Islamic Era Until the end of Umayyad Dynasty(Before 610-750 A.D.)", **International Journal of Language and Linguistics**, 3(3), r.129.

²⁴ Baker û Samed Fekhry Hanna, **h.b.**, r. 333.

²⁵ Baker û Samed Fekhry Hanna, **h.b.**, r. 333.

wiha nîşan bide: Ya yekem ew bû ku di dewra Emewiyan de Ereban *hêza zanînê* baş fem kiribû û ji bo ku bigihêjine zanînê jî werger lazim bû ku wan ev mesele baş femkiribûn. Ya duyem jî ew bû ku di dewra Ebbasiyan de di navbera entekeltuelên Xrîstiyân û Misilman de nîqaşên fikrî hebûn û pêdiviya Misilmanan ji mantiqa Arîsto û felsefeya Yewnanan hebû ji bo ku bikaribin di nîqaşên li hemberî Xrîstiyanan bi ser bikevin, û ev jî bi wergerê pêk dihat.²⁶

Wergera bo erebî di bin Osmaniyan de bi taybetî jî bi înisyatîfa (Kavalali) Memet Elî Paşa ve hat kirin. Di Osmaniyan de herçiqas farsî û tirkî hebûn jî erebî dîsa wekî zimanê hîndarî û zagonê ma, lewma dîsa wergera bo erebî dewam kir.²⁷

1.1.3 Wergernasiya piştî sedsala bîstan

Wergernasiya piştî sedsala bîstan êdî bi teorî û rêbazên nû ve dewlementir bû, destpêka vê serdemê dîsa teoriyên zimannasiyê bû. Lê bi taybetî piştî ku wergernasî êdî ji girêdana zimannasiyê û wêjeya danberhevî dûr ket û wekî dîsîplîneke serbixwe hate binavkirin pêşveçûnên girîng tê de çêbûn, nêzîktêdayînên çandî bêtir di qada wergernasiyê de xuya bûn; ji ber van pêşveçûn û guherînan jî werger ji sedsala beriya xwê cudatir hate terîfkirin.

1.1.4 Werger wekî zanist, meseleya hemtayîtiyê

Zimanzanê Ruso-Amerikan Roman Jacobson di pirtûka xwe ya navdar "On the Linguistic Aspects of Translation"(Li ser Aliyê Zimannasiyê yê Wergerê de), wergerê bi sê awayan an jî bi sê cureyan pênase dike.²⁸

Wekî cureyê yekem behsa *wergera linavzimanî (intralingual)* dike ku ev cure ji bo ku berhem baştir bê femkirin wergernadina wê bi şêweyeke din e. Bo nimûne wergera Mem û Zînê bi lêanîna xwe ya îro ku ji aliyê nivîskarên wekî Jan Dost û Perwîz Cîhanî ve hatiye kirin ji bo ku berhem xwendinbartir û têgehêştinbartir be

²⁶ Suçin, Mehmet Hakkı, **Journal of Turkish Studies**, Arapça Çeviri Geleneği: Altın Dönem, Harvard University Department of Near Eastern Languages and Civilizations, 2010. r.7.

²⁷ Baker û Samed Fekhry Hanna, **h.b.**, r. 334.

²⁸ Basil Hatim û Jeremy Munday, "**Translation an Advanced Resource Book**", Routledge, New York 2004, r. 5.

mînaeke wergera linavzimanî ye.²⁹ Yanê nivîsandina heman berhemê bi awayekî din e. *Wergera navberzimanî (interlingual)* wergera herî berbelav e ku ji zimanekî bo zimanekî din tê kirin. Wergera ji pirtûkeke îngilîzî bo kurdî mînaeke vê wergerê ye. Cureyê sisêyan ku Jacobson behs dike *Wergera navbersemîyotik (intersemiotik-wergera di navbera sîstemên semiyotîk de)* e. Wekî mînak dema ku pirtûkekî bo filmekî adapte dikin tiştê vê derê tê kirin wergera navbersemiyotîk e. Tenê wergera di navbera zimanan de ji aliyê Jacobson ve wekî 'wergera berbihev' (translation proper) tê qebûlkirin.³⁰ Lê divê mirov vê jî bêje ku Jacobson ziman ji derveyî pênaseya wê ya axaftine ber bi semiyotîkê ve bir. Ji ber ku wî ji bo wergerê du pênaseyên nû anîn ku got werger ne tenê di navbera du zimanên cuda de (interlingual), li nav zimanekî bixwe (intra-lingual) û herwiha di navbera sîstemên semiyotîk de jî pêk tê. Jacobson ji aliyekî ve li ser pênaseya wergerê ji yên piştî xwe vediqete ku ew ji aliyê wergerê ve zimên derdixe derveyî armanca wê ya axaftinê. Jacobson wergerê wekî tiştêkî wusa dibîne ku her gavê mirov dikare ji zimanekî derbasî yekî din bike, lê pênaseya wî li ser çandê û cudahiyên zimanan yên rêzimanî nasekine. Li gorî Munday tiştêkî din jî di pênaseya Jacobson de kême e. Wî xêza navbera wergera di nav zimanekî de û wergera di nav zimanan de baş rave nekiriye. Lewma, wekî mînak em nikarin baş bizanin ka ev "zimanê din" ku wî behs kiriye zarava jî di hundirîne yan na.³¹ Bêguman ev nîqaşa ji bo wergerên di navbera soranî û kurmancî de jî girîng e.

Di sala 1965an de J.C. Catford di pirtûka xwe ya *Teoriya wergerê ya zimannasiyê* de wergerê wekî beşeke ji wêjeya danberhevî pênase dike û li gorî wî peywenda di navbera zimanan de pîranî du-alîyî ye (two directional). Lê wekî pêvajoyekê werger herdem yek-alîyî ye (unidirectional), ji ber ku her gav ber bi yek alîyî ve diçe yanê ji *Metna Jêder* ber bi *Metna Armanca* ve û li gorî vê nêrîna xwe jî pênaseyeke wuha ji bo wergerê dike:

Veguhaztina keresteya metna di zimanekî de (ZJ) bi keresteya metna

²⁹ Öpengin, h.g., r. 5.

³¹ Jeremy Munday, "Translation Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (419-428), John Benjamins, Amsterdam/ Philadelphia 2010.

hemta(equivalent) di zimanekî din de (ZA)³²

Catford di vê pênaseyê de girîngiyê dide peyva "hemta"yê ji ber ku li gorî wî problema sereke ya pratîka wergerê dîtina hemtayîtiya wergera di Zimanê Jêder de ye.³³ Li gorî nêrîna Catford *ji bo wergerê peyvên wekîhev yan jî hemta ji dewsa hev bînin bikaranîn bes e*. Li vir Catford wergerê ji mirovan û çandê vediqetîne û ji ber vê jî mirov dikare bêje ku pênase û Teoriya Catford, wê ji bo tetbîqên rojanê têrê neke.³⁴ Ji ber ku unsûrên zimanî, çandî û civakî jî tevî pêvajoya wergerê dibin.

Wekî Catford, hin teorîsyenên din jî "ewilî bi çavekî *zanistî* (scientific) li wergerê dinihêrîn. Di zanistê de jî peywira zanistê ew bû ku tenê *yek* pênaseya rast derxe holê. Yanê werger yan rast bû yan jî xelet. Têgeha "hemtayîti"(equivalence) ji ber vê derket û ji aliyê Jacobson, Nida, Catford û yên piştî wan jî hat nîqaşkirin û bikaranîn û li ser wê teorî hatin danîn. Mirov dikare vê nêrînê wekî 'objektîvîzm' yan jî versiyoneke 'pozîtîvîst' binav bike."³⁵

Niha jî hin zanyarên wergerê hene ku îddîa dikin werger bitemamî objektîf e û tenê bi yek awayî rast dikare were îfadekirin. Lê ev nêrîna kêr zêde di serdema "post-pozîtîvîst"³⁶ ya wergerê de hatiye piştguhkirin. Lê belê li gorî gotinên zanyarê wergernasiyê Anthony Pym di destpêka vê dîsîplînê de armanceke girîng ew bû ku wergerê wekî dîsîplîneke *zanistî* nîşan bidin.³⁷ Ji ber vê jî behsa hemtayîtiyê dikirin. Yanê werger wekî afirandina metnekî bû ku ev metna, bi metna xwe ya jêder ve hemta bû. Eugene Nida ji bo ku wergerek hemta be fikra *hemtayîtiya formal û dînamîk (formal and dynamic equivalence)* avête ortê. Li gorî vê fikrê jî çend qaîde

³² Catford, **h.b.**, r.20.

³³ Catford, **h.b.**, r.21.

³⁴ Arzu Özyön, "*Çeviride Eşdeğerlik Kavramının Tanımlanması ve Eşdeğerlik ile İlgili Sorunlar*", International Journal of Languages' Education and Teaching Vol. 2, (28-39), 2014.

³⁵ Sandra Halverson, "Translation", **Handbook of Translation Studies**, Vol. 1,(378-384), John Benjamins, Amsterdam/ Philadelphia 2010.

³⁶ Ger em li ser wergerê vê nêrînê şîrove bikin berê bawerî ew bû ku yek rastî heye di wergerê de; wergêr pey wê rastiyê bû ku metnê jî wusa wergerîne. Lê, ev nêrîna di salên dawî de guherî û lewma êdî nêrînên wan wekî post-pozîtîvîst tên dîtîn, ji ber ku fikr, nirx, nêrînên wan tesîrê li ser wergerên wan dike.

³⁷ Anthony Pym, "European Translation Studies, une science qui dérange, and Why Equivalence Needn't be A Dirty Word", **TTR: Traduction, Terminologie, Rédaction** 8 (1), (153-176), vgz., Halverson, **h.b.**, r. (378-384),

derxistin. Li gorî qaîdeyên wî ji bo ku wergerê hemta be divê:³⁸

1. wateyekê bide
2. rih û tarzeke orîjînal li ser hebe
3. wê îfadeyeke naturel û hêsan hebe
4. bertekeke wekî [metna orîjînal] bîne holê.

Piştî wî, Koller bi pêşdebirina tîpolojîyê ve, ev fikra hemtayitîyê berfirehtir kir ku Koller pênc cureyên hemtayitîyê pêşkêş kir: (a) Hemtayitiya Nîşandar(denotative) ku naveroka der-zimanî (extralinguistic) ya metnê di hundirîne, (b) hemtayitiya konotativ(connotative) ku tîkiliya wê bi hîlbijartinên peyvan re heye, (c) hemtayitiya text-normativ ku bi cureyên metnan re elaqedar e (d) hemtayitiya pragmatîk ku wergerê metnê yan mesajê di hundirîne û dawiyê (e) hemtayitiya formal ku bi şêwaz û estetîka metnê ve elaqedar e.³⁹

Di salên 1980 û 1990an de di wergerê de nêzîktêdayînên neobjektîf derketin ku li gorî van, nêrîna ku wekî avakerîti (constructivism) jî tê behskirin (ne tenê di peywenda wergerê de, bi giştî) teswîr ne rast yan xelet in lê ji hev cuda ne û pênasayên tiştan li gorî cih û demê diguherin. Heta van salan werger bi awayekî preskrîptîv dimeşîya ku ji wergerê re dihat gotin(yan jî emirkirin) ka "çawa wergerîne".⁴⁰ Jixwe nîqaşên li ser wergerê ger preskrîptîv nebûya qet girîngî nedidanê. Lê Piştî salên 1980yan hem ji nîqaşên hemtayitîyê dûr ketin hem jî nêrînen teswîrî(descriptive) dûrketin ku êdî qûral-qaîdeyan zêdetir, çavdêriyên teorîsyenan û fikrên wan li ser van çavdêriyan girîngtir bû. Yek ji wan kesan ku werger bi awayekî teswîrî pênas kir jî Gideon Toury bû, di sala 1995an de bi pirtûka xwe "Wergernasiya Teswîrî û Ji Wê Wêdetir"(Descriptive Translation Studies and Beyond). "Êdî taybetmendiyên zimannasiyî yê zimên mijara bingehî nebû; lê meseleya bingehî erka wergerê di *çanda armanc* de bû. Bi peyva çandê qesta Toury hemû çarçoveyên civakî bû ku di wergerê de cih digirt wekî norm, kelepûr, ideolojî,

³⁸ Eugene Nida û C.R. Taber, **The theory and practice of translation**, E.J. Brill, Leiden, 1969. r. 164. vgz., Sandra Halverson, "Translation", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (378-384), John Benjamins, Amsterdam/ Philadelphia 2010.

³⁹ Panou, Despoina, "Equivalence in Translation Theories: A Critical Evaluation", **Theory and Practice in Language Studies**, Vol. 3, No. 1, r. 4.

⁴⁰ Pym, "European Translation Studies, une science qui dérange, and Why Equivalence Needn't be A Dirty Word", **TTR: Traduction, Terminologie, Rédaction** 8 (1), (153–176), vgz., Halverson, **h.b.**, r. (378-384).

nirxên wê civakê[...]"⁴¹

Digel ku mirov îfade bike, mirov dikare bêje ku hemtayî ew e ku metna jêder, heman tesîra ku di ziman û çanda jêder de çêdike, di çanda armanc de jî çêbike. Lê ev hemtayî ne tenê bi peyvan ve sînardar e, herwiha çand û unsûrên civakî jî tev vê pêvajoyê dibin.

1.1.5 Pênaseyên Fonksiyonist

Hin teorîsyenên ku digotine xwe "fonksiyonîst" ji nîqaşên hemtayîtiyê dûr ketin û bi tîkiliya armanc/erk, yan kombînasyonên erka zimên û çandê ve mijûl bûn. Dûrketina ji nîqaşên hemtayîtiyê rêyeke nû vekir ji bo wergerê ku êdî werger ne bi peywendên metnên jêder-armanc lê bi hemû armanca metnê dihate pênasekirin. Fonksiyonist bala wergêran kişandine ser wan metnan ku şeweyên wan bi rewşa derdikeve û bi kes û normên çandî û kelepûrî ve tê destnîşankirin.⁴² Yanê werger ji zimannasiyê derket, wekî çalakiyeke di navbera çandan de hat nasîn.⁴³ Teoriyeke fonksiyonist bi navê Skoposê ji aliyê teorîsyenê Alman Hans Vermeer ve hate amadekirin û li gorî vê teoriyê, erka berhemê biryara pêvajoya wergerê dide. "Vermeer wergerê ji veguhezîna zimannasî wêdetir wekî veguhezîna çandî dibîne ku ziman li vir dibe parçeyeke çandê."⁴⁴

1.1.6 Pênaseyên Çandî

Ew kesên ku me behsê kirine pênaseyên wan hemûyan bi awayekî wergerê terîf dikin lê rastiyeke din jî heye ku zanista wergerê wekî me li jor jî behs kir di van 30-40 salên dawî de zehf guherî û wusa dixuye ku bi tîkiliya wê bi dîsîplînên nû ve û bi teknolojiyê ve wê hindî here biguhere. Bi taybetî piştî salên 1970yan bi guherîna pênaseya wergernasiyê ve êdî pênaseya wergerê jî guherî. Ji ber wê, divê mirov pênaseyên çandî jî li ser pênaseyên li jor zêde bike.

⁴¹ Snell-Hornby, **The Turns of Translation Studies-New paradigms or shifting viewpoints?**, r. 49.

⁴² Christiane Nord, "Functional Approaches", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1,(120-128), John Benjamins Amsterdam/ Philedelphia, 2010.

⁴³ Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 87.

⁴⁴ Snell-Hornby, **The Turns of Translation Studies-New paradigms or shifting viewpoints?**, r. 54.

Kesên ku bi nêzîktêdayînên çandî ve mijûl in metna ku tê wergerandin tenê ji aliyê zimannasiyê ve nafikirin, herwiha ji aliyê çandî ve jî wergerê terîf dikin. Dema mirov behsa pênaseyê çandî ya wergerê dike divê mirov pênaseya beriya wê ya zimannasiyî bîne bîra xwe. Nêzîktêdayînên zimannasiyî bêtir bi hemtayîti, wergera rasterast an a serbest ve elaqedar dibû. Lê piştî pevajojeyê dirêj ku heta hate nêzîktêdayînên çandî, êdî kesê ku werdigerand mecbûr bû ku bala xwe bide ser çandê jî. Bi vî awayî jî mirov dikare pênaseya wergerê ya çandî wuha bike: Werger digel ku pevajojeyê derbaskirina metnekî ji zimanekî bo yeke din e herwiha di vê pevajojeyê de çandek jî derbasî yeke din dibe. Lewma, bala wergêran ji teoriyên zimannasiyî guherî hat li ser çandê, aliyê çandî yê metnê.

Andre Lefevereê ku digel Susan Bassnett wekî avakarê vegerîna çandî tê nasîn, wergerê wekî jinûvenivîsandin terîf dike, herwiha wê wekî manîpulyasyonê dibîne:

"Helbet werger jinûvenivîsandina metneke orjînal e. Hemû tiştên jinûve tîn nivîsandin armanca wan çî dibe bila bibe, îdeolojî û poetîkayê taybet nîşan didin û bi vî awayî edebiyatê manîpule dikin ku di civakê de bi awayekî kar bike. Jinûvenivîsandin ku di bin xizmeta hêzêde ye ji aliyê erênî ve dikare feydeyê bide werara edebiyat û civakê. Jinûvenivîsandin dikare têgehên nû, celebên nû, amûrên nû bide naskirin û dîroka wergerê di heman demê de dîroka nûjeniyê ye, dîroka şewandina hêza çandekî li ser yeke din e. Lê jinûvenivîsandin dikare nûjeniyê bitepîsîne, wê xira bike û zefî jî bike [...]"⁴⁵

Li gorî Lefevere werger bi otorîte û meşruiyetê ve girêdayî ye û herwiha bi hêzê ve jî girêdayî ye û ji ber vê jî munaqeseyên gurr li ser hebûn, hê jî hene. Werger ne tenê "pencereyek e ku ji cîhanê din re vedibe" lê werger -herçiqas gelcaran bi bédiliyê eşkere nebe jî- qanalek e ku li ser wê tesîrên *biyanî* dikarin bikevî nav çanda xumalî(native), pê re bikevî şêr û heta dikarin wê xira bikin jî.⁴⁶

Piştî salên 1980yan nêzîktêdayînên postmodernîst û çandî derketin. "Nêzîktêdayînên postmodernîst û çandî çalakîyên ji bo pênaseya wergerê bêwate didîtin. [...] Bala tevgerên çandî yê di wergernasiyê de kete ser nêzîktêdayînên teorîk wekî Teoriya feminist, Teoriya cînsiyetê, dekonstruksiyon û Teoriya

⁴⁵ Andre Lefevere, **Translation/ History/ Culture**, Routledge, New York 1992, r. xi

⁴⁶ Andre Lefevere, **Translation/ History/ Culture**, r. 2.

postkolonyal" ⁴⁷ "Nêzîktêdayînên kultûr-teorîk bi wergereke taybet ve (yanê pênasikirina wergerê ve) kêmtir elaqedar dibin lê mêla xwe didine ser rêyên taybet ku têkiliyên cînsiyet yan hêzê, îdeolojiyê, peywendên polîtîka yan dîrokê, yan potansiyela aktivizmê heta dawiyê di qada wergerê de bê bikaranîn."⁴⁸

Werger û wergernasî qadeke dînamîk e ku ji ber gerdûnîtî, teknoloji, nêzîktêdayînên çandî, felsefî, edebî hwd. ve di guherîneke domdar de ye. Destpêka van guherînan jî bi veqetana wergernasiyê ji zimannasiyê çêbû. Wergernasî piştî nêzîktêdayînên çandî bi gelek dîsîplînan re ketiye têkiliyê; bi dîsîplîn û mijarên wekî postkolonyalîzm, civaknasî, felsefe, dîrok hwd. Ji ber van sedeman jî wergernasî êdî wekî înterdîsîplîner dihate dîtin û li gorî vê rola wê jî werger êdî ne tenê bi wergerandina peyvan diqediya. Ew dîsîplîna⁴⁹ ku bi nîqaşên peyv bi peyv yan wate bi wate dest pê kir, di serdema nûjen de bû qada nîqaşên li ser mijarên wekî nêzîktêdayînên çandî, kolonyal, postkolonyal û hwd.

1.2 WERGERNASÎ – DÎROK Û PERGALA BEŞEKE JI ÇANDNASIYAN

1.2.1 Wergernasî

Wergernasî dîsîplînek e ku li ser diyardeyên têkiliya wan bi wergerê re heye, dixebite. Herçiqas werger û şîrove (interpreting) pratîkên kevn in ku ev hezar sal e tînin kirin jî Wergernasî qadeke nû ye.⁵⁰ Di vê beşê de em ê dîroka Wergernasiyê, ne ku dîroka wergerê, bi taybetî di peywendên teoriyên çandî bidin nasîn.

1.2.2 Ji destpêkê heta 1970yan

Nivîsandina li ser mijara wergerê zef kevn e ku ji aliyê Cicero û Horace

⁴⁷ Snell- Hornby, *The Turns of Translation Studies-New paradigms or shifting viewpoints?*, r. 381.

⁴⁸ Snell- Hornby, *The Turns of Translation Studies-New paradigms or shifting viewpoints?*, r. 381.

⁴⁹ Divê em vê jî bêjin ku wergernasî ji aliyê çend teorîsyenên wekî Susan Bassnett ve wekî dîsîplîn nayê qebûl kirin.

⁵⁰ Munday, "Translation Studies", *Handbook of Translation Studies* Vol. 1, (419-428).

(sedsala yekem BZ) û St. Jerome ve (sedsala çarem PZ) hatiye nîqaşkirin. Nîqaşên wê demê ev bûn: Gelo wergerê bibe rasterast/peyv bi peyv yan serbest. Wergera St. Jerome ya Încîla Yewnanî bo Latînî tesîr li ser wergêrên piştî wî kir ku jixwe wergêrana încîlê bi tena serê xwe mişkuleyên mezin derxistin û bi sedsalan bû sedema pevçûnan. Werger ji bo belavbûna Xrîstiyaniyê pir muhîm bû, lewma di nîqaşên dînî de li ser dirustî û tşkiliya metnên jêder û armanc zef disekinîn. Werger di sedsala 16an de tevî matbaayê, li Ewropayê di şewestandina Protestaniyê de li hemberî Romaya Katolik bû çekeke polîtîk. Încîl ji bo zimanên herêmî hate wergerandin û vê jî alikarî kir ku zimanên netewî pêşde herin. Wergerên bi vî awayî yê herî navdar wergera Martîn Luther bo Almanî (di sala 1534an de tamam bû) û wergera Wyclif (1385-95) û Tyndale bo Îngîlîzî (1525-6) bûn.⁵¹

Xebatên Cicero, St. Jerome û Luther ji bo wergernasiyê girîng bûn. Herçiqas tiştên wan got di nav teoriyên wergernasiya modern de qasî wê demê muhîm nebe jî, dîsa jî di dîroka vê dîsîplînê de kesên girîng in. Li gorî Munday teorisyenên din yê destpêka wergernasiyê ku divê mirov navên wan bihejmêre ev in:

"Di sedsala 17an de helbestvan û wergêrê Îngîlîz (bi taybetî John Dryden [1631–1700]), Romantikê Alman di destpêka sedsala 18an û destpêka sedsala 19an (wekî mînak, Johann Wolfgang von Goethe [1749–1832], Friedrich Hölderlin [1770–1843], August Wilhelm Schlegel [1767–1845] û, bi taybetî, Friedrich Schleiermacher [1768–1834]), Viktoryan wekî Matthew Arnold (1822–1868) û ramangêr û nivîskarên sedsala 20an wekî Walter Benjamin (1892–1940), Ezra Pound (1885–1972), Jorge Luis Borges (1899–1986) û Vladimir Nabokov (1899–1977). Di antolojiyên modern yê girîng de navên Biguenet û Schulte (1989), Schulte û Biguenet (1992), Robinson (1997), Venuti (2000/2004), Weissbort û Eysteinnsson (2006) jî derbas dibin.⁵²

Li gorî Munday herçiqas pratîka wergêranê kevn be jî xebata li ser wergerê piştî para duyem ya sedsala bîstan bû dîsîplîneke akademîk. Beriya wê demê jî werger bêtir di kûrsan de ji bo hînkirina zimên bi *rêbaza wergera zimên* ku wekî *language translation method* tê naskirin dihat bikaranîn. Piştî 1960an li Amerîkayê komxebatên wergerê vebûn ku bê nîqaşkirin ka werger çawa dikare pêş bikeve. Di van salan de *wêjeya danberhevî* jî derket ku wêjeya du çand û zimanên cuda dide ber hev. J.C. Catford di pirtûka xwe "Teoriya Wergerê Ya Zimannasiyî" (Linguistic

⁵¹ Munday, "Translation Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (419-428).

⁵² Munday, "Translation Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (419-428).

Theory of Translation) de Teoriya wergerê bi vî awayî terîf dike: "Teoriya wergerê bi wan peywendên di navbera zimanan de elaqedar dibe û beşeke wêjeya danberhevî ye."⁵³ Beşeke din ku werger bû mijara wê jî *dahûrana danberhevî (contrastive analysis)* bû ku li vir jî di sa zimanzanan du ziman didane ber hev û wekhevî û cudatîyên wan derdixistin. Werger jî êdî ji armanca hînkirina zimên dûr ket û ji dewsa wê li ser wergerê bixwe sekinî. Di salên 1950-60an bingeha teoriyên wergerê yê derketin zimannasî bû; yanê wergêr bêtir li ser pratîka wergêranê disekînî ku çawa dikare peyvan, frazan, hevokan hwd. di zimaneke din de îfade bike. Ji van Jean Paul Vinay û Jean Darbelnet pirtûka "Danberheva Stîlîstîk ya Fransî û Îngîlîzî" (*Stylistique comparée du français et de l'anglais*) (1958) derxistin ku li ser cudatîyên di navbera wergera frensî û îngîlîzî de nêrînên xwe par ve kirin. Tevî ku pirtûk li ser wergera îngîlîzî û frensî derxistibûn, tesîra pirtûkê ji wê mezintir bû û ew rêbazên wan pêşkêş kir di wergerê de bi salan hatine bikaranîn, hê jî tên bikaranîn. Di vê pirtûkê de Vinay û Darbelnet du stratejiyan bi navê *wergera dîrek* û *wergera oblîk* pêşkêş dikin ku mirov dikare wergera dîrek wekî wergera rasterast ya din jî wekî wergera serbest bibîne. Ev herdu stratejî jî heft rêbazan dihewînin, bi navê: Deynkirin/qerzkirin (borrowing), kalk (calque), wergera rasterast (literal), transpozîsyon, modulasyon, hemtayîtî û lêanîn.⁵⁴

Xebatên din ku li ser wergernasîyê, wê demê derketin pêş jî yê Eugene Nida bûn ku *Gramera Generatîv* ya Chomsky weki bingeha pirtûkên xwe bikar anî. Herwiha Nîda yekem kes e ku ji bo wergerê peyva zanîstê bikar anî. Peyva Almanî 'Übersetzungswissenschaft' jî di sa wê demê derket û ji bo wergernasîyê hat bikaranîn.⁵⁵

Heta 1970yan nîqaş li ser nav, danasîn û teoriyên wergerê bû ku bingeha wan zimannasî bû. Piştî vê maweyê êdî ev zanîst hêdî hêdî dibe zanîsteke serbixwe û bendên xwe yê bi zimannasîyê ve jî sist dike bêyî ku lap jê biqete. Di beşa li jêr de jî em ê behsa wê demê bikin ku wergernasî êdî dikare wekî zanîsteke serbixwe were terîfkirin.

⁵³Catford, **h.b.**, r. 20.

⁵⁴Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 56-57.

⁵⁵Munday, **Introducing Translation Studies**, r.7.

1.2.3 Ji 1970yan heta iro

Têgeha *Translation Studies* cara ewil di sala 1972an de ji aliyê James Holmesê helbestvan û wergêr ve hate pêşniyazkirin.⁵⁶ Bi xebata xwe ya bi "Nav û Xwezaiya Wergernasiyê"(The Name and Nature of Translation Studies) de Holmes navê *Translation Studies*ê li vê zanistê kir ku niha jî ev zanist bi vî navî di cîhanê de tê naskirin. Kesên wekî Cicero jî behsa wergerê kiriye lê heta salên 1970yê bêtir li ser vê nîqaşê sekinîne ka gelo *wergera rasterast* (literal translation) yan *wergera serbest* (free translation) bê bikaranîn baş e. Ji ber wê ye ku xebata Holmes girîng e ku wî çarçoveya wergernasiyê nîşan da ka çi dikeve nav vê pênaseyê. Jixwe piştî wî jî çarçoveya wergernasiyê hêj berfirehtir bû û bû înterdîsîplîner ku em ê di rûpelên pêş de behs bikin.

James S. Holmes nexşeyek çêkir û diyar kir ka wergernasî di nav xwe de çi dihewîne. Ev nexşeya ji aliyê wergernasê Israîlî Gideon Toury ve jî hat pêşkêşkirin lewma hin cihan navê wê wekî *nexşeya Holmes/Toury* jî derbas dibe. Li jêr me bi kurtasî behsa vê nexşeyê kiriye. Nexşeya Holmes Wergernasiyê dixê du beşan; yek ji wan *saf* (pure) yek jî *tetbîqî* (applied) ye. Beşa saf jî dibe du binbeşan; binbeşek *teswîrî* ye ku wergerê teswîr dike ka çi ye, çawa ye; yek jî *teorîk* e ku ji bo ku wergerê rave bike rê û rêbazan daydîne. Ev her yek binbeş jî dîsa binbeşên wan hene.⁵⁷ Li gorî Gentzler jî axaftina Holmes bi giştî wekî derbirîna bingehîn ya qada wergernasiyê tê qebûlkirin.⁵⁸

Wê demê nîqaş li ser bikaranîna nav jî derket ka ji bo wergernasiyê kîjan navî bikar bînin. Di îngîlîzî de peyva *Translatology* derket pêş; li hember vê di zimanên din de, di fransî de *Translatologie* û di îspanyolî de *Traductologie* derketin.⁵⁹ Peyva *Translatology* ya îngîlîzî piştî demekî guherî bû *Translation Studies*. Hindî dem derbas bû ev rastiya derket ku wekî di gelek qadên din de îngîlîzî çawa zora zimanan dibe, bi peyva *Translation Studies* jî dîsa zora zimanên din dibe û ev nav ji bo wergerê û di mijarên wergerê de bêtir tê bikaranîn.

⁵⁶ Sandra Berman û Catherine Porter (Ed.), **A Companion to Translation Studies**, Blackwell, Oxford, 2014, r. 2.

⁵⁷ Munday, **Introducing Translation Studies**, r.10.

⁵⁸ Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 10.

⁵⁹ Munday, **Introducing Translation Studies**, r.9.

Piştî Holmes werara wergernasiyê hêj geştir bû. Li Almanyayê teoriyên ku bingeha wan zimannasî bûn, dewam kirin. Li wir teoriyên bêtir li ser cureyê metnê hatin danîn ku Katharina Reiss yek ji wan kesan e ku li ser teoriyên bi vî awayî xebitî, û teoriyên li ser armanca metnê wekî *Teoriya Skoposê* ya Reiss û Vermeer derketin. Vê demê xebatên Mona Baker, Basil Hatim bêtir di bin bandora *Teoriya Zimannasiya Fonksiyonel a Sîstemîk* (Systemic Functional Linguistics) de man. Dîsa dawiya salên 1970yan û destpêka 1980an de ji aliyê Itamar Even-Zohar û Gideon Toury ve *Teoriya Polîsîstem* derket ku li gorî vê teoriyê wêje û celebên cuda, berhemên wergerandî û nehatine wergerandî tev, di pêşbaziyê de ne ku bibin serdest.⁶⁰

Di sala 1978an de Andre Lefevere ku ew jî teorîsyenekî polisistemist bû, got ku wergernasî bi problemên ku "di hilberan û teswira wergerê de derdikeve" ve elaqedar e.⁶¹ Yanê girîngiya pêvajoya wergerê anî zimên. Paşê, Susan Bassnett pênaseya wergernasiyê firehtir kir û bi van gotinên xwe ew wekî "disiplîneke serbixwe"⁶² nîşan da ku wergernasî êdî "beşeke biçûk ya zanista edebiyata danberhevî nîn e, êdî qadeke taybet a zimannasiyê jî nîn e, lê beşeke zêde kompleks e û qada wê jî zef berfireh e."⁶³ Bi van gotinên Bassnett xuya bû ku werger êdî wê bibe dîsîplîneke serbixwe û înterdîsîplîner. Bi gotina Venuti "di vê serdemê de wergernasî bi awayekî navnetewî û înterdîsîplîner wekî dîsîplîneke nû ya akademîk derket"⁶⁴

Kesên ku wergernasî wekî dîsîplîneke serbixwe pênase kirin Susan Bassnett û Andre Lefevere bûn; lê bangên ji bo beşeke taybet hê di sala 1814an de li Almanyayê ji aliyê Friedrich Schleiermacher ve bi van gotinên wî hatibû kirin: "Li her derê teorî bi me re ne, lê heta niha tu kesî bi bingeheke saxlem teoriyeke wergerê dernexistiye pêş, yanê yeke ku bi mantiqî hatiye pêşxistin û li ser hatiye xebitîn. Tenê perçe pêşkêş kirine. Lê, çawa ku dîsîplîneke bi navê arkeolojî heye, divê wusa jî

⁶⁰ Munday, *Introducing Translation Studies*, r.14.

⁶¹ Andre Lefevere, "Translation Studies: The Goal of the Discipline", *Literature and translation*, (234-5), ACCO, Louvain 1978, vgz., Susan Bassnett, *Translation Studies*, Routledge, New York 2005, r. 12.

⁶² Munday, *Introducing Translation Studies*, r. 12.

⁶³ Munday, *Introducing Translation Studies*, r. 12.

⁶⁴ Lawrence Venuti, *The Translation Studies Reader*, Routledge, New York, 2004, r.1.

wergernasî hebe."⁶⁵ Li gorî Snell Hornby ev "perçe"yên ku Schleiermacher behs dike; wergera peyv bi peyv, wate bi wate, wergera sadiq û ya serbest bû ku nîqaşên li ser van têgehên heta dema Cicero û Horace diçe.⁶⁶

Di van 40 salên dawî de konferans û komxebatên li ser wergerê zêde bûn û li Amerîka û Ewropayê li zanîngehan beşên taybet ji bo wergerê vebûn û werger jî êdî bêyî ku têkiliya xwe bi dîsîplînen wekî zimannasiyê, dîrokê, felsefeyê biqetîne bi tena serê xwe bû dîsîplînek. Ji ber ku Wergernasî bû mijareke berfireh û înterdîsîplîner û ji ber ku teoriyên curbicur derketin, senifandina van karekî wusa hêsan nebû.

Lê çend teorîsyenan li gorî xwe xebatên wergernasiyê senifandine. Ji van em ê berê senifandina Munday li jêr bidin:

1. Teoriya wergera zimannasiyê, dahûrana danberhevî ya zimanan di nav de û hemtayîti.
2. Teoriyên Fonksiyonîst yê wergerê li Almanyayê, teoriyên cureyê metnê (text-type) û Skopos di nav de.
3. Teoriya Polîsîstem û teoriyên din yê sîstemî, Ekola Manîpulasyonê û Wergernasiya Teswîrî(Descriptive Translation Studies) di nav de.
4. Vegerîna Çandî ku Bassnett û Lefevere serkêşî kirin (1990). Di salên 1990an de Wergernasiyê modelên teorîk ji Xebatên Çandî(Cultural Studies) adapte kir yan jî deyn kir, bi taybetî ji Xebatên Femînîst û Cînsiyetê û Xebatên Postkolonyal. Meseleyên hêz û ideolojiyê û ev bi wergerê çawa tene destkarî kirin, girîng bûn.
5. Elaqeya domdar ku ji aliyê Romantîkên Alman, bi taybetî Schleiermacher ve di meseleyên felsefî yê derbarê hermeneutîka edebî û etîk de.⁶⁷

Piştî salên 1980yan ku wergernasî êdî wekî dîsîplîneke serbixwe hate naskirin, êdî ji gelek aliyan ve pêşde çû. Wekî mînak li Rojavayê û derveyê Rojavayê

⁶⁵ Friedrich Schleiermacher, "Alte Literatur, Über die Farbengebung des Alterthümlichen in Verdeutschung alter klassischer Prosa", *Die Musen*, 1814, r.104.vgz., Snell- Hornby, **The Turns of Translation Studies. New paradigms or shifting viewpoints?**, r.6.

⁶⁶ Snell- Hornby, Snell- Hornby, **The Turns of Translation Studies. New paradigms or shifting viewpoints?**, r.6. r. 7

⁶⁷ Munday, "Translation Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (419-428).

xebatên postkolonyal hatine kirin. Li cîhanê, li welatên wekî Çîn, Hîndîstan û li welatên ereb xebatên li ser wergernasiyê zêdetir bûn. Ji aliyê teknolojiyê ve jî werger pêşde çû, wekî mînak di kompûteran de bernamêyên wergerê hatin bikaranîn û herçiqas ku di wergerên wekî edebî de ne mimkun e ku bigihêje asta wergera mirovan dîsa jî bernamêyên kompûterê karên wergêran hêsantir û pratîktir kirin.

1.2.4 Vegerîna çandî di wergernasiyê de

"Vegerîna çandî di wergerê de ji bo wê pêvajoyê tê bikaranîn ku di wergerê de dewsa nêzîktêdayînên zimannasiyî, yên çandî hatin bikaranîn û wergêran girîngî dan rola faktorên çandî. Dewsa nêzîktêdayînên zimannasiyî ku peyv, fraz, hevok û metn pişkên wê ne, di nêzîktêdayînên çandî de çand dibe pişka sereke ya wergerê [...] Girîngiya çandê ji bo wergerê dikirpîne. [...] Bala wergerê ji metna jêder guherî hate li ser metna armanc, ji nivîskar hate li ser wergêr û ji çanda jêder hat li ser çanda hilgir [...]"⁶⁸

Wekî li gotînen jor jî diyar dibe wergêr dema ku metnek wergerand êdî nekaribû wekî berê tenê bala xwe bide ser başwergerandina hevokê, yan metnê; lê mecbûr dimîne êdî taybetiyên çanda metna jêder û metna armanc jî bîne ber çavê xwe ku bikaribe temsîliyeta çanda zimankê di zimanê ku werdigerîne de bide xuyakirin.

Herwiha Edwin Gentzler jî destnîşan dike ku du guherînen girîng ku di dawiya sedsala bîstan de qewimî, yek ji wan guherîna ji teoriyên bingeha wan metna jêder, ber bi teoriyên ku bingeha wan metna armanc bû. Guherîna girîng a din jî ev bû ku di hînkirina wergerê de digel unsûrên zimannasiyê, faktorên çandî jî cih girtin.⁶⁹

Munday jî heman tiştî dibêje ku di wergernasiyê de *vegerîna çandî* (*cultural*

⁶⁸ Yan Chen û Jinging Huang, "The culture turn in Translation Studies", **Open Journal of Modern Linguistics**, Çile 2014, <http://www.scirp.org/journal/ojmlhttp://dx.doi.org/10.4236/ojml.2014.44041> (15. 07. 2015), r. 491.

⁶⁹ Edwin Gentzler, **Contemporary translation theories**, Multilingual Matters, Clevedon and Philadelphia, 2001, (rûpel nehatiye gotin) vgz., Susan Bassnett, *The translational turn in cultural studies*, Susan Bassnett, "From Cultural Turn to Translational turn: A Translational Journey", **Literature, Geography, Translation**, (67-80), Cambridge Scholars Publishing, UK 2011.

turn)⁷⁰ ji bo dahûrandina wergerê ji çarçoveya *xebatên çandî (cultural studies)* ve tê bikaranîn.⁷¹ Teorisyenên di vê mijarê de derdikevin pêş Susan Bassnett, Andre Lefevere û Lawrence Venuti ne. Di destpêkê de Bassnett û Lefevere bûn, piştî wan jî Venuti bi mijarên li ser etîk, nedîtîna (invisibility), stratejiyên ehlîkirin û biyanîkirinê ve derkete pêş. Di pirtûka Jeremy Munday de tiştê ku Bassnett û Lefevere yê din vediqetîne û derbarê karê wan yê li ser wergerê ev rêzên li jêr derbas dibin:

"Berewajî teoriyên zimannasiyê en wergerê Bassnett û Lefevere ji zimên wêdetir çûn û li ser hevkarîgeriya di navbera werger û çandê sekinîn ku çand di mijarên firehtir wekî kontekst, dîrok û kelepûrê de tesîr û zorê li wergerê dike [...] Yanê tevgera ji wergera wekî metn ber bi wergera wekî çand û politîkayê ye ku Mary-Snell Hornby(1990), di nivîsa xwe ya di heman koleksiyonê de wekî 'vegerîna çandî' bi nav dike. Vegerîna Çandî ji aliyê Susan Bassnett û Andre Lefevere ve ji bo vê tevgera çandî wekî metaforekê tê bikaranîn û xebatên [...] di koleksiyona wan de bi hev ve girêdide."⁷²

Susan Bassnett û Andre Lefevere di pirtûka xwe *Werger, Dîrok û Çandê de (translation, history and culture)* dema behsa teoriyên wergerê yê zimannasiyê⁷³ dikin dibêjin ew teori "ji peyvê derbasbûn û ber bi metnê ve hatin lê ne ku wêdetir". Yanê teoriyên zimannasiyê tiştê li ser nîqaşên li ser peyvan zêde kirin û li ser metnê jî sekinîn, girîngiya metnê jî di wergerê de derxistin meydanê lê nekarîna wêdetir herin. Ji ber ku wan çand piştguh kir. Gotinên Susan Bassnett li ser Yurî Lotman derbarê girîngiya çandê di wergerê de mînakek e:

"Semiyotîkê Sovyet Yuri Lotman zimên dişibîne dilê mirovekî û çandê jî dişibîne bedena wî, bi vî awayî zimên wekî navenda çandê dibîne û li gorî wî hevkarîgeriya di navbera herduyan de hêza jîyanê didomîne. Çawa ku bijîşkekî ku dilê mirovekî emeliyat dike mecbûr e çavê wî li bedena wî nexweşî jî be [ji bo ku bi xeletî kêrê li cihekî wî nexwe nekuje]; bi vî awayî wergêrek dema ku werdigerîne mecbûr e li çandê jî miqate be, ne tenê li zimên. Ji ber ku wergêrek mecbûr e ku ji herdu aliyên jî îstîfade bike, hem ji çandê hem jî ji zimên da ku bikaribe operasyoneke biserketî bike."⁷⁴

Em ji bo vê rewşê mînakekê hêsan li ser kurdîyê bidin wê baş were femkirin.

⁷⁰ Herwiha têgeheke bi navê wergera çandî(cultural translation) jî heye ku ji aliyê teorisyenê çandasiyê yê postkolonyalîst Homî Bhabha ve hatiye bikaranîn ku elaqeya wê bi wergernasiyê ve tune ye. Divê ev herdu pênase neyên tevlihevkirin.

⁷¹ Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 125.

⁷² Munday, **Introducing Translation Studies**, r.127.

⁷³ Teoriyên wergerê yê zimannasiyê (Linguistics oriented Translation Studies), zimannasiyê hildidin navenda xwe û li gorî teorisyenên wekî Andre Lefevere, Susan Bassnett û Venuti ev teorî mijarên çandî û civakî didin aliyekî, ji ber vê jî kêr dimînin.

⁷⁴ Susan Bassnett, **Translation Studies**, Routledge, New York 2005, r. 23.

Dema ku wergêrek ji îngîlîzî bo kurdî peyva 'yes' wergerand, divê li gorî peywendê lê binihêre ka kî ji kî re dibêje, ka yekî mezin ji yekî biçûk re dibêje yan heman temen in, ka li ku dibêje hwd. Ji ber ku ji dewsa 'yes'ê di kurdî de du peyv tîn bikaranîn ku yek 'erê' ye, bêtir em di diyalogeke bi hevtemenên xwe re bikar tînin; peyvek jî 'belê' ye ku em bêtir ji bo hurmetê, ji bo kesên me mezintir bikar tînin ku ev tişta jî bi çanda kurdî ve elaqedar e. Îcar, wergerek dema ku ev tişta nizanibû, yanê çand piştguh kir wê demê xeletiyên absurd derdikevin.

Piştî vegeerîna çandî di wergerê de û gelek vegeerîna din wekî vegeerîna gerdûnîtiyê, vegeerîna îkonîk, vegeerîna hêzê hwd. derketin. Vê dawiyê jî ji aliyê Mary Snell Hornby, Susan Bassnett û bi taybetî ji aliyê teorisyenê çandnasiyê Doris Bachmann-Medick ve *vegeerîna wergerî di çandnasiyê de tê nîqaşkirin*. Ev nêrîna li ser wergerê, yanê vegeerîna wergerî, wergerê derdixe derveyî têgihêjtineke metn û zimanî û wê berfirehtir dike.⁷⁵

Bachmann Medick di gotareke xwe de mînakê heqên mirovî (human rights) dide ku di wê mînakê de heqên mirovî bi perspektîfê wergerî dinirxîne. Wekî li wir derbas dibe danezana heqên mirovî yê Neteweyên Yekgirtî (the UN Universal Declaration of Human Rights-UDHR) digel ku ji bo 379 zimanan hatiye wergerandin ji bo gelek dîsîplîn û rewşan jî hatiye wergerandin. Li gorî Medick di sala 1990an de pêncî dewletên endamê Konferansa Îslamê bi navê Danezana Kahîreyê li ser Heqên Mîrovî di Îslamê de (Cairo Declaration on Human Rights in Islam) danezana xwe belav kirin. Tişta ku li vê derê hatiye kirin ew e ku danezana UHDRyê li ser ya Kahîreyê şîrove kir. Yanê madeyên ku UHDRyê yê ku sekuler bûn li ser Danezana Kahîreyê li gorî şerîeta îslamê hatin adaptekirin. Bi gotina Medick ev danezana, revîzyoneke UDHRyê ye, û wergereke qismî ye. Medick wergerên ku bi vî awayî li ser UHDRyê hatine kirin wekî *wergerên qismî yê danezanên gerdûnî* terîf dike.⁷⁶ Di vê mînakê de mirov dibîne ku wergera bi vî awayî hinekî wergernasiyê vediqete, ji ber ku em li vir tenê li ser wergerandina metnekî xeber nadin, her wiha li ser

⁷⁵ Doris Bachmann-Medick, "The 'Translational Turn' in the Literary and Cultural Studies: The Example of Human Rights ", **New Theories, Models and Methods in Literary and Cultural Studies**, (213-233), WVT Wissenschaftlicher Verlag Trier, Bergstraße 2013.

⁷⁶ Bachmann-Medick, "The 'Translational Turn' in the Literary and Cultural Studies: The Example of Human Rights ", **New Theories, Models and Methods in Literary and Cultural Studies**, r. (213-233)

lêanîna rewşekî yan jî wekî Medick kirî li ser lêanîna danezanekî li ser yeke din xeber didin.

Wekî Bachmann Medick diyar dike têgehiştina wergerê ya adetî(ku ev têgehiştineke filolojîk û zimannasiyî ye) wekî wergera metnekî yan zimanekî, vê dawîyê berfirehtir bûye.⁷⁷ Digel gotinên Medick, nîqaş li ser "vegerîna wergerî" hene ka ev teoriyeke saf e yan hin fikr in ku di nav civaka zanistê de tèn hevîkirin.⁷⁸

1.2.5 Wergêr, girîngî û taybetiyên wergêr

Ger werger zivirandina metnekî ji zimanekî bo zimanekî din be wê gavê kesê ku vî karî dike jî wergêr e. Lê, çawa ku werger karekî wusa hêsan nîn e û tenê wergerandina metnekî bo zimanekî din nîn e, wusa jî wergêr û taybetî û hewcedariyên wergêr tenê wergerandina metnekî nîn e.

Umberto Ecoyê ku bixwe jî nivîskar û wergêr e diyar dike ku ev hersê hevokên di Fransî, Îngîlîzî û Italianî de, herçiqas heman tiştî dibêjin jî, nayên heman wateyê : Hevokên "donnez- moi un café", "give me a coffee" û "mi dia un caffè" nehemta ne herçiqas di hersê hevokan de jî heman daçek hebin û ji aliyê zimannasiyê ve wekîhev bin jî, ji aliyê çandê ve wekî hev nîn in. Eco diyar dike ku ger yek ji welatên cuda van bîne ziman, tesîra wan wê cuda be û ji bo behskirina adetên cuda tèn bikaranîn. Di vê mînaka ku wateya wê "qehweyekî bide min" e û vexwarina qehweyê di sê çandên cuda de tîne zimên ku di îngîlîzî de divê "please" heba kêleka wê û di fransî de "s'il vous plait" ji bo ku kesê li hemberî te nexeyide. Lewma Eco balê dikişîne li ser wê yekê ku divê wergêr derbarê kitekitên çandî yên metnan de hişyar be.⁷⁹ Wê gavê taybetiyên wergêrekî tenê wergerandina metnê, zanîna zimanê ku werdigerîne nîn e, herwiha zanîna çanda wî zimanê ku metnê werdigerîne ye jî.

Bêguman tiştên ku em ji wergêrekî hevî dikin bi demê re guherîn. Wekî mînak di destpêkê de tiştê ku ji wergêr hevî dikirin ew bû ku metnekî rasterast/peyv

⁷⁷ Bachmann-Medick, "The 'Translational Turn' in the Literary and Cultural Studies: The Example of Human Rights ", **New Theories, Models and Methods in Literary and Cultural Studies**, r. (213-233).

⁷⁸ Snell-Hornby, "The Turns of Translational Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (266-370), John Benjamins, Amsterdam/ Philadelphia 2010.

⁷⁹ Susan Bassnett, **Reflections on Translation**, (Ed.), Multilingual Matters, New York 2011, introduction xii.

bi peyv wergerîne ku xeletiyek çênebe. Piştî demekê, bi destpêka teoriyên wergerê ev rola wergêr jî guherî, ji ber ku wergêr êdî di wergerê de tiştên din wekî sadaqata metnê, hemtayıti hwd. re mijûl bû. Piştî 1970yan ku teoriyên çandî, postkolonyal hwd. ketin nav wergerê wê demê jî tenê zanîna zimên yan jî zanîna qaîdeyên wergerê têra wergêr nekir. Wergêr mecbûr bû çanda berhema werdigerîne baş bizanibe, mecbûr bû înterdîsîplîner bixebite.

Dema behsa wergêran dike Susan Bassnett mînakê Orhan Pamuk dide ku di sala 2006an de xelata Nobelê hildabû:

"Serkeftina Orhan Pamuk ya vê dawiyê ji aliyekî ve bi xêra qabiliyeta wî ya edebî pêk hat, lê ji aliyekî din ve bi xêra wergêra wî ya Îngîlîz, Mauren Freely, pêk hat ku ew bixwe jî romanûseke navdar e. Dema dadgerên pêşbazîya nobelê difikirin gelo berhema Pamuk hîlbijêrin ji bo xelatê an na, tiştê ku di hişê wan de ye versiyona Freely a Pamuk e.[Yanê Freely] nivîskarê [berhemên] Pamûk bi Îngîlîzî ye."⁸⁰

Ji bo danberheveke wergêr û nivîskar Lawrence Venuti peyvên wergêrekî Amerîkî, Willard Trask vediguhêze ku armanca Willard ew bû ku girîngiya çandî ya berhemên xwe nîşan bide: '[..]Dema ku tu romanekî dinivîsî, tu derbarê mirovan, cihan, hin tiştan de dinivîsî; yanê tu xwe îfade dikî. Lê dema ku tu werdigerînî tu xwe îfade nakî. Tu bi qabîlyeteke teknîkî tevdigerî. Min fehm kir ku divê wergêr û aktor xwediyê heman qabîlyetan bin. Tiştê ku ew herdu jî dikin ew e ku tiştê ku aîdî yekî/e din e hildidin û daydînin cihekî din wekî ku ew ya wan bixwe ye."⁸¹ Aktor û wergêr, herdu jî rolekî tînin cih.

Douglas Robinson sê pêdiviyên wergêr wuha diyar dike: *Şanaziya profesyonel, qazanca pera û çêj (a ku wergêr ji karê xwe distîne)*. Bi şanaziyê qesta Robinson ew e ku wergêr bi wergera xwe serbilind be. Ji bo ku wergêr bi wergera xwe serbilind be jî Robinson dîsa sê qaîdeyan pêşkêş dike: Yek ji wan *Pêewlebûn* e ku bêtir wergera metnê ye bi awayê ku xwendevan dixwaze bê wergerandin ku têbigihêje û çêj jê hilde; ji ber vê ye ku wergêr bi saetan li ser peyvekî disekine. Qaîdeya duduyan *ketina nav kar* e. Bi vê jî qesta Robinson ew e ku wergêr girêdayî kîjan saziya wergerê ye, beşdarî kîjan konferans û komxebatan dibe, têkiliya wî çiqas

⁸⁰ Bassnett, **Reflections on Translation**, r. 51

⁸¹ Lawrence Venuti, **The Translator's Invisibility**, Routledge, New York 2008. r.7.

bi wergerên devdora wî heye hwd. Bi vî awayî têkiliya wergêran bi hev re çêdibe ku nîqaşan li ser wergerê çêbikin ku di encamê de baştir werdigerînin. Ya dinê jî *etik* e. Gelek mînakên wê hene ku wergêr wateya metnê xira dike ji bo ku wê adapteyî televîzyonê yan kartoneke zarokan bike. Yan jî dema ji wergêrekî xwestin ku ji bo propagandaya nazîyan metnekî wergerîne wê demê wê wergêrîne yan na. Ev dikevîne nav mijara etîkê.

Pêdiviya duyem *qazanc* e ji ber ku wergêrên profesyonel ji bo ku pere qazanc bikin werdigerînin. Ji bo wê jî lezbûna wergêr, bikaranîna kompûterê hwd. girîng in.

Pêdiviya sisêyan *çêj* e ku wergêr ji karê xwe hilde. Ji ber ku werger karek e ku divê tu bi tenê li ser kompûterê yan qelem di destê te de bimînî. Kesekî ku çêj ji vî karî hilnede ne mimkûn e ku bikaribe ji bo demeke dirêj wê bidomîne.⁸²

Digel gotinên ku me li jor îfade kirî, wergêr ew kes e ku di navbera du çand û zimanan de navgînek e. Lewma, ji bo ku wergêr bikaribe navbeynkariya xwe baş bikar bîne, divê bala xwe bide li ser herdu çandan.

I.3 WERGER DI ÇANDNASIYÊ DE

Ev beşa behsa nêzîktêdayînên çandî di wergerê de dike ku bi saya van nêzîktêdayînên çandî vegeerîna di wergerê de⁸³ pêk hat. Em ê behsa pêkhatina vê literature bikin ka bingeha wê ji ku hatiye û heta ku çûye; teoriyên wekî Polîsîstem, Wergernasiya Teswîrî, Ekola Manîpulyasyonê çawa bingeha vegeerîna çandî avêtine, xebatên Lawrence Venuti tesîreke çawa li ser wê kiriye û nêzî salên 1990an wergernasî çawa bûye înterdîsîplîner.

Wergernasî qadeke dînamîk e ku zef zû diguhere û digihêje, bi taybetî jî teorî, stratejî û nêzîktêdayînên di wergeran de tînan bikaranîn. Wekî di gelek zanistên din de

⁸² Douglas Robinson, **Becoming a Translator-An Introduction to the Theory and Practice of Translation**, Routledge, New York 2003, r. 24

⁸³ Divê mirov Vegerîna Çandî (Cultural Turn) û Wergera Çandî (Cultural Translation) tevî hev neke. Vegerîna çandî têgehek e ku ji aliyê Mary Snell-Hornby ve di sala 1990î de hatiye pêşkêşkirin, paşê jî ji aliyê Susan Bassnett û Andre Lefevere ve di heman salê de hatiye bikaranîn û li gorî wê bala wergerê ji metnê dûr dikeve û nêzîkî çandê dibe. Vegerîna çandî bixwe bi gelek dîsîplînen din re tê bikaranîn, wekî vegeerîna çandî di civaknasiyê de lê li vir mijara me *vegerîna çandî di wergerê de* ye. Lê Wergera Çandî têgehek e ku di antropolojî/etnografîyê de; û çandnasî û xebatên postkolonyal de tê bikaranîn û li gorî van zanistan jî mijar û pênaseya wê diguhere.

nêzîktêdayînên nû li ser yên kevn ava dibin. Vegerîna çandî ya di wergerê de jî ji nişkave derneket. Paşxaneyê wê heye heta roja ku ew paşxane ji aliyê hin teorîsyenên wergerê ve hatin nirxandin, kêmasiyên wan hatin dîtin, yan jî ew nêzîktêdayînen ku berê dihatin bikaranîn êdî têra wergerê nedikirin. Xala werçerxê ji bo "vegerîna çandî" rexneya li ser nêzîktêdayîna zimannasiyê û rexneya li ser fikra hemtayîtiyê bû ku wekî xala sereke ji bo teorîzekirina wergerê dihate pejirandin. Lazim bû tiştên nû bikevin nav, yan jî guherînek çêbibe. Guherîneke ku di salên 1980yan de di wergerê de çêbû, nêzîktêdayînek e ku em wekî "vegerîna çandî" di wergerê de bi nav dikin. Jixwe mirov dikare bêje ev guherîna di wergernasiyê de di heman demê de paralelê derketin û pêşveçûna çandnasiyê meşiyaye. Ji ber ku çandnasî (cultural studies) jî di salên 1980yan li Amerîkayê derket, herçiqas wekî wergernasiyê paşxaneyê wê jî hebe ku diçe heta salên 1950yan li Britanyayê.⁸⁴ Susan Bassnett jî di heman fikrê de ye ku vegerîna çandî ya di wergernasiyê de beşek ji vegerîna çandî ye ku di çandnasiyan de li dawiya salên 1980yan û li salên ewil yên 1990an pêk hat ku şiklê gelek mijarên adetî guherand.⁸⁵

1.3.1 Teoriya Polîsîstem(Itamar-Even Zohar) û Wergernasiya Teswîrî (Gideon Toury)

Beriya derketina Wergernasiyê wekî dîsîplînekê, werger ji aliyekî ve wekî binbeşeke wêjeya danberhevî, ji aliyekî din ve wekî binbeşeke zimannasiyê dihate dîtin. Jixwe ji aliyê zimannasiyê ve jî, wergernasî li ser wekheviya peyvyan yanê hemtayitiya peyvên ji zimanên jêder bo zimanên armanc hûr dibû.

Bi derketina teoriyên wergerê ku bi awayekî bi çandnasiyê re pêwendîdar bû, ev nêrînên wergerê hêdî hêdî guherîn. Yek ji van teoriyên wergerê ya ku bi çandê ve elaqedar bû Teoriya Polîsîstem ya Itamar-Even Zohar bû. Teoriya Polîsîstem ji bo ku hin pîrsgirêkên wergerê çareser bike hate avakirin lê tesira wê li wergerê zêdetir bû.

⁸⁴ Aleida Assmann, **Introduction to Cultural Studies, Topics, Concepts, Issues**, The Warburg Institute, Berlin 2012, r. 19.

⁸⁵ Susan Bassnett, "Culture and Translation", **A Companion to Translation Studies**, (13-23), Multilingual Matters, New York 2007.

Li gorî Susan Bassnett Teoriya teorisyenê Îsraîlî Itamar-Even Zohar ya Polîsîstem ji bo wergernasiyê bingeha toximên çandî avêt.⁸⁶

Even Zohar bingeha Teoriya xwe ji xebatên teorisyenên edebiyatê yê Rûs hilda û di salên 1970yan de pêş de bir. Peyva sîstemê di vê teoriyê de xala girîng e ku ji aliyê formalîstê Rus Tynyanov ve hatiye pêşkêşkirin. Peyva Polîsîstemê ji bo ku strûktûra elementan ya pir-tewqî (multi-layered) îfade bike hate bikaranîn û ev strûktûr hemû bihev ve girêdayîne. Ev strûktûrên ku em behs dikin di Teoriya Polîsîstemê de her yek dibe sîstemek û ev sîstem bi hev ve girêdayîne. Berhemên wêjeyî jî girêdayî sîsteman e û wêjeya wergerandî sîstemek e. Ev sîstem hemû ser hev Polîsîstemê pêk tînin. Wêje beşeke xwediyê çarçoveya civakî, çandî, edebî û dîrokî ye û têgeha esas li vir sîstem e.

Even Zohar di sala 1970yan de ji cihê ku Formalîstên Rûs mabûn, hilda û pêşve bir. Armanca wî ya sereke ew bû ku hin pirsgerêkên Teoriya wergerê yê wê demê û pirsgerêkên strûktûra dîrokî ya edebiyata Ibranî çareser bike û sepandina fikrên formalîstan bi Teoriya Polîsîstemê encam da.⁸⁷ Li gorî Even Zohar wêjeya wergerandî wekî sîstemekî dixebite, bi wî awayî ku:

- ZA berhemekî ji bo wergerê hildibijêre;

-û sîstemên muşterek yê din tesîrê li ser norm, tevger û politikayên wergerê dikin.

Even Zohar ji van sîsteman re dibêje Polîsîstem ku bi hev re dixebitin û tesîrê li hev dikin û werareke domdar di nav vê Polîsîstemê de heye.⁸⁸ Yanê çand jî di nav vê Polîsîstemê de sîstemek e û werger jî tiştêkî wusa nîn e ku sînorên wê tam hatiye kifşkirin, lê çalakiyek e ku bi sîstemeke çandî ve girêdayî ye. Edebiyat jî di nav vê Polîsîstemê de sîstemek e û wergera edebî jî di nav sîstema edebiyatê de ye. Li gorî

⁸⁶ Bassnett, "Culture and Translation", **A Companion to Translation Studies**, (13-23).

⁸⁷ Mark Shuttleworth, "Polysystem", **Routledge Encyclopedia of Translation Studies**, (197-199), Routledge, New York, 2009.

⁸⁸ Munday, **Introducing Translation Studies**, r.109.

Gentzler Teoriya Polîsîstemê ji bo wergernasiyê pêşketineke mezin e û avantajên wê ji bo edebiyatê ev in: ⁸⁹

-Edebiyat bixwe tevî hêzên civakî, dîrokî û çandî dixebite.

-Even-Zohar ji xebata ku li ser metnê tenê bû, dîrket û ber bi xebata li ser wergera di nav sîstemên çandî û edebî ve çû.

-Pênaseya ne-preskriptîv ya hemtayıfî û guncaniyê li gorî rewşa dîrokî û çandî ya wergerê dikarî biguhere.

Tevî kêmasiyên wê, Teoriya Polîsîstemê tesîreke mezin li ser wergernasiyê kiriye û wergernasî ji modêlên preskriptîv ber bi yê teswîrî biriye. ⁹⁰

Nêzî dawîya 1970yan du komên zanyaran nêrîneke din li ser wergerê anîn ku bala wan ne li ser metna jêder bû lê li ser statu û erka wergerê di zimanê armanc de bû. Ji van herdu koman yek li Holanda û Îsrâîlê li dora teorîsyen Gideon Toury (Wergernasiya Teswîrî) navend girtibû ku navê vê komê wekî Ekola Manîpulasyonê jî tê gotin; ya din jî li Almanyayê bi serkêşiya Hans J. Vermeer bi nêzîktêdayînên Fonksiyonîst hatibû avakirin. Herdu kom bêyî haya wan ji hev hebe dixebitîn û li orta 1980yan herduyan jî fikrên xwe pêşkêş kirin ku wê demê diyar bû ku herdu jî li dewsa parçeyên zimannasiyê yê metna jêder li ser peywenda çandî ya wergerê hûr dibûn. ⁹¹

Teoriya Teswîrî ya Wergernasiyê ji aliyê terorisyenê wergerê Gideon Toury ve hat amadekirin ku ew jî Îsrâîlî bû û tevî Even Zohar xebitîbû. Li gorî Toury, werger beriya her tiştî cihekî di sîstemên civakî û wêjeyî yê di çanda armanc de hildide û bi vê Teoriya xwe Toury li ser Teoriya Even Zohar û li ser xebatên xwe yê ku di sala 1978an de dest pê kir ibû, devam dike. ⁹² Dîsa, li gorî Toury beriya her tiştî di sîstemên civakî û edebî yê çanda armanc de pozîsyoneke wergerê heye û ev pozîsyon biryara nêzîktêdayînên ku tên bikaranîn dide.

⁸⁹ Munday, **Introducing Translation Studies**, r.111

⁹⁰ Munday, **Introducing Translation Studies**, r.111.

⁹¹ Snell-Hornby, "The Turns of Translational Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (266-370).

⁹² Munday, **Introducing Translation Studies**, r.112.

Toury ji bo Teoriya xwe sê qedemeyên metodolojîk dayîne û tevî teswîra berhemê, roleke firehtir ya sîstema sosyokultûrel jî dixê nav: ⁹³

1. Metnê di nav sîstema çanda armanc de bi cîh bike, li girîngî û guncaniya wê binihêre.

2. MJ û MA bide ber hev û têkiliyên di navbera perçeyên MJ û MA terîf bike û têgeha wergerê gelemperî bike.

3. Ji bo biryardayîna di wergêrana paşerojê de fikrên xwe derxe.

Li gorî Toury wergêr beriya her tiştî berjewendiyên çanda armanc difikire ne yê metna jêder û çanda jêder. Û bi peyva çandê jî tiştê Toury destnîşan dike hemû peywenda civakî ye ku di wergerê de bi cîh dibe; yanê *norm*, *kelepûr*, *ideolojî* û *nirxên* wê civakê ne, yan jî ya *sîstema wergir* (*receptor system*) e bi awayê ku Toury bi nav dike.⁹⁴ Divê em vê jî bêjin ku Teoriya Toury rasterast li ser çandê nasekine bêtir li ser *norman* disekine. Ev norm yê sosyokultûrel in ku taybetiya çandekî, civakekî û demekê ne.

1.3.2 Teoriya Skoposê (Hans Vermeer û Katharina Raiss)

Teoriya Skoposê ji aliyê çandnasiyê ve li ser wergerê xebitiye û ji bo vegeîna çandî ya di wergerê de ya 1980yan bûye bingeş. Ev teorî di sala 1984an de ji aliyê Hans Vermeer û Katharina Raiss ve hat avakirin. Teoriya Skoposê wusa ferz dikir ku "armanc yan jî bi gotineke din erka wergerekî biryarê dide ka di wergerê de kîjan stratejî wê were bikaranîn. Ji ber vê, subjektîviya wergêr derdikeve pêş û erka ku wergerek wê di çanda armanc de hilde, îmkanê dide wergêr ku biryarên taybet hilde."⁹⁵ Yanê wergêr biryaran distîne ka wê kîjan stratejiyê di wergerê de bikar bîne. Ev stratejî bêtir li ser çand û metna armanc disekinî ka ew ê çawa baştir bêne îfadekirin. Bi vî awayî Teoriya wergerê ji teoriyên ku li ser metna jêder disekinî dûr ket û bi awayekî ber bi vegeîna çandî ve çû.⁹⁶ Jixwe li gorî Snell-Hornby, Vermeer wergerê li dewsa veguhezîna zimannasiyî wekî veguhezîna çandî dibîne, û li gorî

⁹³ Munday, *Introducing Translation Studies*, r. 112.

⁹⁴ Snell-Hornby, *The Turns of Translation Studies . New paradigms or shifting viewpoints?*, r.49.

⁹⁵ Bassnett, "Culture and Translation", *A Companion to Translation Studies*, (13-23).

⁹⁶ Bassnett, "Culture and Translation", *A Companion to Translation Studies*, (13-23).

Vermeer ziman pişkeke çandê ye.⁹⁷ Dema ku wergêran êdî li dewsa çand û metna jêder bala xwe dane ser çand û metna armanc wê gavê êdî nêzîktêdayînên çandî bêtir hatin ber çav.

Derbarê Teoriya Skoposê de, ji aliyê Vermeer ve mînakê wergera pirtûka Adolf Hitler ya *Mein Kampf* tê dayîn. Li gorî Vermeer, dema ku mirov wê pirtûkê dixwîne, li hin cihên wê de mirov dibê qey ew otobiyografiyek e. Ji aliyekî din ve ew vîzyoneke dîrokî jî dide. Dema mirov rûpelên dawiyê jî dixwîne, mirov dikare bibêje erka wê pirtûkê ew e ku xwendevan Sosyalizma Nasyonal (Nazîzm) binasin û heq bidinê. Ger mirov li ser metna jêder û niyeta nivîskar hûr bibe mirovê bi vî awayî wergerîne. Lê wergerandina bi vî awayî (yanê wergerandineke ku Hitler wekî yekî ezîz nîşan dide) wê bêguman çend wergêran û weşangêran aciz bike, ji ber ku ew werger wê bi awayekî pesnê nazîzmê bide. Ji bo ku tiştêkî bi vî awayî çê nebe, wergêr metnê wekî nusxeke dîrokî werdigerînin ku li çend cihan têbiniyên dîrokî dinivîsin. Vermeer li ser vê yekê disekine û li gorî wî Teoriya Skoposê bersîva vê pirsê dide ka wergêr çima dixwaze erka metnê biguherîne. Ji ber ku li gorî Vermeer divê wergera *Mein Kampf*ê girîngiyê bide vê yekê û li pey vê pirsê bikeve: *Divê ev metn çi tesîrê li ser xwendevanê zimanê armanc çêbike*, ne ku girîngiyê bide erka metna bi almanî ya orijînal.⁹⁸ Divê wergêr jî li gorî vê nêrînê stratejî û rêbaza ku wê di wergerê de bikar bîne, hilbijêre.

Li gorî Anthony Pym, Vermeer bala wergerê guherande li ser armancê. Hêmanên bi wî awayî anî ku rola muşterî (kesê ku wergerê bi wergêr dide kirin) derxiste pêş; û divê beriya ku wergêrek metnek wergerand, hişê wî zelal bibe ka wê kîjan rêbazê di wergerê de bikar bîne. Metnek dikare bi awayên cuda bîn wergerandin ji bo ku xizmeta armancan bike.⁹⁹

Herwiha li gorî Pym heta ku metnek hemtayîtiyê dahûrîne ew ê zimannasiyê bikar bîne. Lê eger tu wekî wergêr, armanca wergerandina pirtûkê hilbijêrî wê gavê zimannasî têrê nake. Tu yê bi civaknasî, bazargerî, etîka ragihandinê û hemû fikrên teorîk ve mijûl bî ku bi awayekî sist be jî di bin têgeha "Çandnasî" de hatine

⁹⁷ Snell-Hornby, *The Turns of Translation Studies . New paradigms or shifting viewpoints?*, r. 55.

⁹⁸ Anthony Pym, *Exploring translation theories*, Routledge, New York 2014, r. 49-50.

⁹⁹ Pym, *Exploring translation theories*, r. 49.

berhevkin. ¹⁰⁰ Wekî di mînaka pirtûka Hitler de jî dixuye, li gorî Teoriya Skoposê dema wergêrek biryara rêbaza xwe dide, ew rêbaza ku wê di wergerê de bikar bîne; wê gavê mecbûr e tiştên derveyî zimannasiyê wekî civaknasî, etîk, bazargerî bifikire. Ev tiştên derveyî zimannasiyê jî bandorê li ser armanc û erka wergerandina pirtûkê/metnê dike. Ev armanc û erk jî jixwe rêbaza wergêr tayîn dikin.

Wekî dawî em dikarin bêjin ku li gorî Teoriya Skoposê, ji ber ku armanc û erka metna jêder û metna armanc ji hev cuda ne, wergêr jî mecbûr e dema ku werdigerîne li gorî armanca xwe, rêbazekî hildibijêre. Em dîsa mînaka pirtûka Hîtler bînin bîra xwe: Di destê wergêr de ye ku pirtûkeke bi vî awayî ji bo nazîyan wekî pirtûkeke pîroz wergerîne û propagandaya wê bike; lê dîsa di destê wergêr de ye di vî pirtûkê de Hîtler wekî yekî faşîst nîşan bide û rêbaz xwe li gorî armanca xwe tayîn bike. Ji ber vî di Teoriya Skoposê de girîng e ku wergêr bizanibe ka MJ çima tê wergerandin û erka metna ku hate wergerandin wê çi be. ¹⁰¹ Teoriya Skoposê wergerê wekî ragihandineke di navbera çandan de (intercultural communication) nîşan da. ¹⁰² Vê nêrînê jî ji bo vegerîna çandî di nav wergerê de rêyek vekir.

1.3.3 Vegerîna Çandî di Wergernasiyê de

Piştî ev guherînên di wergerê de çêbûn û di heman demê de avabûna çandnasiyê di sala 1980an de, Susan Bassnett û Andre Lefevere nêrîneke nû anîn ser wergerê ku wekî "vegerîna çandî" di wergernasiyê de hatiye binavkirin ku ji teoriyên beriya xwe wekî Wergernasiya Teswîrî, Ekola Manîpulasyonê, Teoriya Polîsîstem û xebata Gideon Toury ya li ser normên wergerê istifade kir. ¹⁰³ Li gorî tespîta Bassnett û Lefevere, divê werger tenê bi zimannasiyê ve mijûl nebe û nêzîkî çandê be jî. Bassnett û Lefevere di pirtûka xwe *Werger, Dîrok û Çandê* de dema behsa guherînên di pratîka wergerê de dikin û dibêjin ew ji asta xwe ya formalîst xilas bûye û êdî li ser mijarên firehtir wekî kontekst, dîrok û kelepûrê disekine: ¹⁰⁴

¹⁰⁰ Pym, **Exploring translation theories**, r. 49-50.

¹⁰¹ Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 78.

¹⁰² Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 87.

¹⁰³ Cristina Marinetti, "Cultural Approaches", **Handbook of Translation Studies** Vol. 2, (26-30), John Benjamins, Amsterdam/ Philadelphia 2011.

¹⁰⁴ Susan Bassnett, "The Translation Turn In Cultural Studies", **Constructing Cultures: Essays On Literary Translation Topics in Translation**, (123-140), Multilingual Matters, Great Britain 1998.

"Demekê, pirsê ku daîm dipirsîn ev bû: 'Werger çawa dikare bê hînîkirin?' û 'mîrov bi çî awayî dikare li ser wergerê bixebite?' Kesên ku xwe wekî wergêr didîtin gelcaran di çalakîyên hînîkirina wergerê de qurêtî dikirin tevî ku yêr digotin em wergerê hîndîkin werger nedîkin, û ji ber vê jî mecbûr diman rêbaza berê bikar bînin ya ku wergerek didane ber yeke din û li ser herduyan di valahîyeke formalist de hûr dibûn. [Lê] niha pîrs guherîn. Mijara ku li ser dixebitîn cardin hate terîfkirin. Tiştê ku li ser dixebitîn metnek e ku di çanda jêder û armanc de hatiye bicîhkirin û bi vî awayî Wergernasî hem karî nêzîktêdayîna zimannasîyî bikar bîne hem jî ji wê wêdetir here."¹⁰⁵

Qesta wan ji vê *wêdetir çûyîne* ew bû ku werger ji bandora zimannasîyê xilas dibe û mijarên nû yêr çandî bandorê li wergerê dikin ku perspektîfa wergerê firehtir bikin. Li gorî gotina Bassnettê, beramberî "tiştên metnî tiştên derveyî-metnê" jî tesîrê li ser wergerê dikin. Metnek çawa ji bo wergerê tê hilbijartin, wergêr di hilbijartina metnê de roleke çawa hildide, editor; weşanger yan jî patron roleke çawa hildidin; stratejîyên ku wergêr bikar tîne li gorî kîjan krîteran tîne diyarkirin; wergerek çawa di sîstema [zimanê] armanc de tê hildan. Ev mijarên me behskirî, bûn xalên sereke ji bo wergernasîyê û ji bo ku bikaribin li ser van bixebitîn wergernasîyê rêya xwe guherand û hem kûrtir bû hem jî firehtir.¹⁰⁶ Ev peyva ji zimên wêdetir çûyîr bi awayekî din wergernasî ber bi hevkarîgeriya werger û çandê anî ku çand bandorê li wergerê dike. Herwiha, li gorî pênasîya Mary Snell Hornby ev dûrçûyîna wergera wekî metn ber bi wergera wekî çand û politikayê "vegerîna çandî" pêk anî¹⁰⁷

Susan Bassnett jî derbarê vê wêdetir çûyîna ji zimannasîyê û ber bi çandê ve çûyîne, fikrên xwe bi vî awayî terîf dike:

"Dema ku me derbarê wê de nivîsand me ferqa teoriyên zimannasîyî û yêr wêjeyî yêr wergerê baş dizanî û me herdu jî zêde teng û preskrîptîv didîtin. Wergernasî ji 1980yan vir ve wekî dîsîplîneke serbixwe digihîşt ku metodolojîyên zimannasîyî û wêjeya danberhevî bikar dianî, û me -ne tenê me, yêr din ku li ser wergerê dixebitîn jî- wusa hîskir ku dem ev dem e ji bo ku dîroka çand û çandnasîyê jî tevî vî karî bibin."¹⁰⁸

¹⁰⁵ Bassnett, "The Translation Turn In Cultural Studies", **Constructing Cultures: Essays On Literary Translation Topics in Translation**, (123-140).

¹⁰⁶ Bassnett, "The Translation Turn In Cultural Studies", **Constructing Cultures: Essays On Literary Translation Topics in Translation**, (123-140).

¹⁰⁷ Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 127.

¹⁰⁸ Bassnett, "Culture and Translation", **A Companion to Translation Studies**, r. (13-23).

Axirî, vegeîna çandî ji bo wergerê rêyên nû vekirin ku êdî werger ne tenê ji zimanekî bo yeke din dihate kirin, her wiha ji çandekî jî dihate kirin û wergêr jî dema ku metnek wergerand mecbûr bû ku vê yekê bîne ber çavê xwe.

1.3.4 Vegerîna Wergerî di Çandnasiyê de

Hin teorîsyenên wergernasiyê, Bassnett¹⁰⁹ û vê dawiyê jî teorîsyenê çandnasiyê Doris Bachmann-Medick¹¹⁰ vegeîneke din anîn ziman: " 'vegerîna wergerî' di çandnasiyan û zanistên civakî de" ku piştî vegeîna çandî ya di nav wergernasiyê de pêk hat. Di pirtûka Susan Bassnett û Andre Lefevere de bi navê "vegerîna wergerî di çandnasiyê de" beşek derket ku li wê derê Susan Bassnett behsa biyekirina hêzên çandnasî û wergernasiyê dikir: "[...] di van interdîsîplînên pîraliyê de jiheveqetan tişteki çewt e.[...] Pêdiviya wergernasiyê wekî çandnasiyê bi pîrbûna dengên heye. Û her wekî wê, xebata li ser çandnasiyê herdemê lêkolîna pêvajoyên înkod û dîkodê dihewîne ku [ev jî] wergerê pêk tînin."¹¹¹

Ev gotinên Bassnett derbarê têkiliya çandnasî û wergernasiyê de hatine rexnekirin. Li gorî Harish Trivedi çandnasî û wergernasan guh nedan van gotinên Bassnett û Lefevere. Sedemeke wê ev bû ku tevî ku Bassnett û Lefevere binyadên hevpar yê wergernasî û çandnasiyê nîşandan jî, cudahiyeke mezin di navbera herdu înterdîsîplînan de heye ku çandnasî -heta dema ku bi çanda populer û ya rajêr (subaltern) ve jî mijûl dibe- hema hergavê bi yek zimanî dişixule, bi îngîlîzî. Herwiha çandnasî bi Teoriyan ve zêde dixebite. Lê wergernasî carna çiqas teorîk dibe bila bibe, divê bi du zimanan bixebite ku tenê yek ji wan dikare bibe îngîlîzî. Yanê vegeîna çandî di wergernasiyê de jinûveterîfkirinek e. Lê vegeîna wergerî di çandnasiyê de xwestek e ku hê pêk nehatiye û tenê tê hêvikirin.¹¹²

¹⁰⁹ Bassnett, "The Translation Turn In Cultural Studies", **Constructing Cultures: Essays On Literary Translation Topics in Translation**, r. (123-140).

¹¹⁰ Doris Bachmann Medick, "Introduction: The Translational Turn", **Translation Studies**, Vol. 2, (1), (2-16).

¹¹¹ Bassnett, "The Translation Turn In Cultural Studies", **Constructing Cultures: Essays On Literary Translation Topics in Translation**, (123-140 , vgz., Harish Trivedi, "Translating Culture vs Cultural Translation", **91st Meridian International Writing Program**, The Iowa University, (1 Spring 2005), <http://iwp.uiowa.edu/91st/vol4-num1/translating-culture-vs-cultural-translation> (07.08.2015).

¹¹² Trivedi, **h.b.**

Tevî van rexneyan, teorîsyena Alman Doris Bachmann-Medick ev nîqaşa vegerîna wergerî bi pirtûk û gotarên xwe berfirehtir kir/dike ku li gorî wê werger êdî di nav têkiliyên di navbera zimanên netewî, wêjeyên netewî û çandên netewî de bisînor nebû. Dîsa li gorî Bachmann-Medick ev perspektîfa wergerê ya ku asoya wê fireh dike hem ji wergernasiyê re hem jî ji dîsîplînên din re ku di nav çandnasiyan de ne, bi taybetî ji çandnasiyê re kete pêşbaziyê.¹¹³ Li vê derê qesta Bachmann-Medick ji wergerê, wergera di navbera komên civakî û etnîk de, di navbera dînan de, di navbera sîstemên çandî de, û di navbera tradîsyonên akademîk û çandên zanîne(cultures of knowledge) de ye. Bi vî halê wergerê ve Bachmann-Medick wê hem wekî kategoriyeke pratîka civakî dibîne, hem jî ji bo dahûrana wan baleke(focus) girîng dibîne.¹¹⁴

Dîsa li gorî Bachmann-Medick ji bo "vegerîna wergerî têrê nake ku mirov wergerê ji zimannasiyê û paradîgmaya metnî xilas bike û wekî çalakiyeke çandî wê têxe nav tevgera civakî. Bachmann-Medick ji bo ku "vegerîna wergerî" ya rastî ji bo "vegerînek" çêbe 3 tiştan wekî şert davêje ortê: 1. Berfirehbûna wê mijarê yan jî qada tematîk; 2. Metaforîzasyon(mecazîkirin); 3. Nûjeniyeye metodolojîk, qevza têgehî (conceptual leap) û sepandina transdîsîplîner. Yanê bi gotineke din ji bo ku vegerîna wergerî çêbibe li gorî Bachmann-Medick divê "werger" êdî tena serê xwe mijareke lêkolînê nebe, lê wekî amrazêke nû ya zanîne û wekî kategoriyeke akademîk ji nav dîsîplînan re derbas be.¹¹⁵

Teorîsyenekî din ku bi vê mijarê ve mijûl bû Mary Snell Hornby ye. Lê Snell Hornby jî bêhêvî ye ka gelo bi rastî jî vegerîna wergerî wê di nava dîsîplînên din de, bi taybetî jî di nava çandnasiyê de çê bibe an na. Li gorî wê ev mijareke bigengeşe ye û hêj nediyar e ka ev teoriyeke saf e yan di nav cemaeta zanyariyê de fikrek e ku

¹¹³ Bachmann Medick, "Introduction: The Translational Turn", **Translation Studies**, Vol. 2 (1).

¹¹⁴ Bachmann-Medick, "The 'Translational Turn' in the Literary and Cultural Studies: The Example of Human Rights ", **New Theories, Models and Methods in Literary and Cultural Studies**, (213-233).

¹¹⁵ Bachmann-Medick, "The 'Translational Turn' in the Literary and Cultural Studies: The Example of Human Rights ", **New Theories, Models and Methods in Literary and Cultural Studies**, (213-233).

tê hêvîkirin ku pêk were.¹¹⁶

Ev iddiaya wan, vegeîna wergerî, di nav çandnasiyê de zêde nehatiye şopandin, lê belê di çandnasiyan û di zanistên civakî de ji hêla "vegeîna wergerî"yê ve lêgerînek heye. Hin kesên derveyî wergernasiyê jî vê gavê tevî nîqaşên li ser vê mijarê bûn.

1.3.5 Wergernasî wekî Interdîsîplînerî

Înterdîsîplîn qadeke xebatê ya cuda nîn e, lê qadeke vekirî ya lêkolînê ye ku dîsîplînên curbicur dikarin tê de cih bigirin.¹¹⁷ Wergernasî înterdîsîplîner e ku piştî salên 1980yan wekî dîsîplîneke serbixwe hate pejirandin. Herçiqas beriya wê jî bi dîsîplînên din re di nav têkiliyê xurt de be jî, piştî ku bû dîsîplîneke serbixwe, hevkarigeriya dîsîplînên wekî çandnasiyê bi wergernasiyê re zêdetir bû. Jixwe bi zimannasiyê re herdemê di nav têkiliyê xurt de ye ku Snell-Hornby vê wekî înterdîsîplîneriya emperyalîstîk bi nav dîke "ku dîsîplînek; têgeh, teorî û rêbazên xwe bi darê zorê li ser dîsîplîna din dide pejirandin wekî ku zimannasiyê di salên 1960 û 70yan de li ser wergerê kir."¹¹⁸

Bi vegeîna çandî di wergerê de, ji xilasbûna wergernasiyê ji bin bandora zimannasî û wêjeya danberhevî û bi derketina wê wekî dîsîplîneke serbixwe, sînorên wergernasiyê guherî û mijarên din ketin nav, înterdîsîplîneriya wê baştir xuya bû. Wergernasî hem ji ber taybetiya xwe ya pirzimanî, hem jî ji ber dînamîktiya xwe, bi dîsîplînên din re di nav têkiliyê de ye. Teorîsyenê wergerê Jeremy Munday înterdîsîplîniya wergerê bi dîsîplînên din re nîşan dide û li gorî wî têkiliya wergernasiyê bi van dîsîplînan re heye: Di serî de bi zimannasiyê re [bi taybetî semantîk, pragmatîk; û zimannasiya sepandî(applied), û zimannasiya danberhevî], xebatên li ser zimanên modern û xebatên zimanan, wêjeya danberhevî, çandnasî[di

¹¹⁶ Snell-Hornby, "The Turns of Translational Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (266-370) .

¹¹⁷ Richard Schwarz, "Internationales Jahrbuch für interdisziplinäre Forschung", **Wissenschaft als interdisziplinäres Problem**, de Gruyter, Berlin 1974, r.59, vgz., Snell- Hornby, **The Turns of Translation Studies. New paradigms or shifting viewpoints?**, r.71.

¹¹⁸ Snell-Hornby, **h.b.**, r. 72.

nav çandnasyê de xebatên li ser cinsiyetê, yên postkolonyal] û felsefe[ya zimên û wateyê, hermeneutîk û dekonstruksiyon di nav de] ¹¹⁹

Ji ber vê înterdîsîplîneriya wergernasyê ye ku xebatên/pirtûkên bi sernavê Werger û Teror(Translation and Terror), Şidet û Werger(Violence and Translation) û Werger û Konflikt (Translation and Conflict) derketine ku Bachmann Medick vê helwestê wekî çûyîna wergerê ber bi qadên sosyopolîtîk ên wergerê destnîşan dike. ¹²⁰

Li gorî teorisyenê wergernasyê Jeremy Munday, wergernasî dikare ji zimanan û ji çandnasyê nêzîktêdayînan bîne, wan li gorî xwe biguherîne û modêlên nû ji bo pêwîstiyên xwe çê bike. ¹²¹ Ji ber vê dînamîkbûna wê, wergernasî roj bi roj geş dibe.

1.3.6. Venuti- biyanîkirin û ehlîkirin

Lawrence Venuti teorîsyenekî wergerê ye ku di salên 1990an de dîsa bi rêbazên çandî nêrînên çandî anî li ser wergerê. Fikrên Venuti li ser argumentên edebiyat û çandnasyê bûn; li ser têkiliya zimên, subjektivite û ideolojiyê; têgehên cinsiyet, nîjad, sinif û neteweyê û tesîra van li ser form û pratîkên çandî, etîk, temsîliyeta çandî ya polîtîk û têkiliyên di navbera gerdûnîti û çandê ûhw. bûn. Weki teorisyenên çandê yên din Venuti jî di wê fikrê de ye ku divê asoya wergernasyê firehtir be, lewma çarçoveyêke sosyokultûrel jê re lazim e.

Ev têgeha Venuti, *Nedîtîni* di wergerê de muhîm e. Di pirtûka xwe *Nedîtîniya Wergêr (The translator's invisibility)* de Venuti, dîroka wergerê ya di dinyaya Anglo-Amerikan de keşf dike. Têgeha Venuti *Nedîtîni* di wergerê de tê wê wateyê ku di metna wergerandî de wergêr naxuye, metn herîkbar e, xwendina wê û têgehêştina wê hêsan e û ev jî bandoreke wusa li ser xwendevan çêdike ku jê wetrê metna orîjînal dixwîne. Li gorî Venuti wergêr bi du awayan bandorê li ser metna wergerandî çêdike. Rêya yekem ew e ku metn yan wusa dixuye ku metna orîjînal e, yanê wergêr

¹¹⁹ Munday, *Introducing Translation Studies*, r. 183. Kevanekên goşebend yên Munday bixwe ne.

¹²⁰ Bachmann-Medick, "The 'Translational Turn' in the Literary and Cultural Studies: The Example of Human Rights ", *New Theories, Models and Methods in Literary and Cultural Studies*, (213-233).

¹²¹ Munday, *Introducing Translation Studies*, r. 182.

di metna wergerandî de naxuye; ya duyem jî ew e ku wergêr di metnê de xwe dide xuyakirin û xwendekar pê dihisîne ku ew metna di destê wî de werger e. Ji bo vê jî Venuti du têgehên bikar tîne. Yek ji wan biyanîkirin e ku wergêr eslê metnê zêde naguherîne, di wergerê de têgehên zimanên jêder hin cihan bi formên xwe yên esil dimînin û bi vê jî xwendevan têdigeheje ku wergera metneke ji çandê cuda dixwînin.¹²² Tiştê ku Venuti qest dike wergera rasterast nîn e, lê parastina hin formên çanda jêder e. Lê paşwendiyê ve stratejiyê heye ku ev stratejiya herîkbariya metnê dikuje.

Stratejiya din jî ehlîkirin e û di vê stratejiyê de jî wergêr çiqas ji destê wî tê metnê nêzîkî çand û zimanê armanc dike; ji ber vê jî wergêr di metnê de naxuye û metnê herîkbar e. Ev herdu stratejiyên Venuti li ser statuya wergerê ya Anglo-Amerikan ava bûye. Venuti nîşan dide ka kanonên edebiyatên biyanî dema ku di sedsala 17an de bo îngilîzî hatine wergerandin çawa bi yek stratejiyê hatine wergerandin yanê bi ehlîkirinê. Îtîraz û rexneyên Venuti li ser vê heye. Ji ber ku li gorî wî du encam derdikevin li vir. Ya yekem ew e ku xebata wergêr ya li ser metnê naxuye û wergêr wunda dibe. Jixwe tiştê ku xwendevan û weşanger dixwazin jî ew e yanê wergerekî wekî metna orijînal bixwînin û wergêr di metnê de nexuye. Wergêrê ku li pey endîşeya xwendebariya metnê ye di metnê de wunda dibe, naxuye. Encama duyem jî ew e ku ev stratejî "daxistîneke etnosentrîk"(an ethnocentric reduction) ya metneke biyanî ji bo nirxên çanda ZA e.¹²³ Bi her awayî temsîliyeta çanda zimanê jêder bi ehlîkirinê wunda dibe. Ji ber vê stratejiya wergerê ye ku mirov her çî metna wergerandî bi îngilîzî bixwîne hemû tîmekê wekî hev didin ku mirov nizane werger e. Ji ber ku hemû jî wusa hatine wergerandin ku şopa zimanê jêder di metnê de nayê xuyakirin. Herwiha ev herdu stratejî di wergerê de hegemonyaya zimanekî li ser yeke din nîşan didin. Xebatên ku mijara wan hegemonyaya zimanan e jî di peywendan van herdu stratejiyan de hatine amadekirin.¹²⁴

¹²² Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 147.

¹²³ Giuseppe Palumbo, **Key Terms in Translation Studies**, Continuum, London/ Newyork 2009, r. 183.

¹²⁴ Bnr. Sinem Sancaktaroglu Bozkurt, **Translation of text as translation of culture: A Study of the Turkish Translation of John Fowles's The French Lieutenant's Woman, Jeanette Winterson's Oranges are not the only Fruit, and Julian Barnes's England, England**, (Doktora, Zanîngeha Hacettepeyê, Enstituya Zanistên Civakî, Enqere, 2010).

1.4. ÇI YE WERGER-PÊNASEYEKE GIŞTÎ Û NÛJEN

Werger di destpêkê de wekî wergerandina metnekî ji zimanekî/ zimanê jêder ji bo zimanekî din/zimanê armanc dihate dîtin. Li gorî vê pênaseyê jî hê bi sedan sal berê, derbarê wê yekê de stratejî hatine pêşkêşkirin ka wergerê çawa were kirin. Hindî stratejî û teorî ketin nav wergerê, bi guherîna stratejî û teoriyên xwe ve werger bixwe guherî.

Bi guherînên di wergernasiyê de mirov di vê serdema modern de dema ku pênaseyê wergerê pêşkêş dike nemimkun e ku mirov bikaribe bêyî wergernasiyê, bêyî dîtina guherînên ku di wergernasiyê de çêbûne bikaribe terîfeke hêsan ji wergerê re bîne. Wergera ku bi wateya xwe ya destpêkê wekî guherandina metnekî ji zimanekî bo yeke din dihate dîtin, guherî. Lewma li gorî nêrîna kesekî bi çavê teorî, nêzîktêdayîn û vê dawiyê jî vegerînên cuda ew dikare curbicur pênaseyan ji wergerê re peyda bike, wekî:

-Ji aliyê zimannasiyê ve bi îfadeyê hêsan, werger cihguherandina keresteyê metnî di zimanekî de, bi keresteya metnî ya wekî wê di zimanekî din de, tê terîfkirin¹²⁵.

- Nêrîna Roman Jacobson ku li gorî *teoriyên hemtayıtiyê*(equivalence theories) di navbera zimanê jêder û zimanê armanc de wergerê pênase dike, werger 'veguhezîneke' zimannasiyî ye. Zimannas û semiyotîsyen Jacobson wergerê wekî wergera linavzimanî(intralingual), wergera di navbera zimanan de (interlingual) û wergera di navbera sîstemên semiyotîk de (intersemiotic) îfade dike ku ev pênase hemû li ser fikra "werger, di du kodên cuda de du peyamên hemta dihewîne" ava bûye.¹²⁶

-Bi nêrîneke sosyolojîk werger çalakiyê sosyolojîk e ku mirov nikare erkên wê bi navbeynkarî yan jî ragihandinê ve sînordar bike.¹²⁷

¹²⁵ Catford, **h.b.**, r. 20.

¹²⁶ Sandra Berman û Catherine Porter (Ed.), **A Companion to Translation Studies**, Blackwell, Oxford, 2014, r. 3.

¹²⁷ Gisele Saphiro, "The Sociology of Translation: A New Research Domain", **A Companion to Translation Studies**, (82-94), Blackwell, Oxford 2014.

Wekî em dibînin werger bi dîsîplînên din ve xwe dide îfadekirin, yanê dîsîplînên din bi awayekî pênaseyên wergerê li gorî xwe diguherînin. Herwiha werger jî ji nêzîktêdayînen van dîsîplînan îstîfade dike û pênaseyên xwe dibîne. Derbarê pênaseya wergerê ku tiştên ji derveyî metnê jî li tev bûn, Mona Baker van gotinan tîne zimên: " Pênaseya 'werger'ê bixwe berfirehtir bû; werger (êdî) bi gelek çalakiyên û berhemên ku bi metneke jêder re di têkiliyeke nas de nîn in, dihewîne."¹²⁸

Berfirehbûna vê pênaseya wergerê bi taybetî di salên 1980yan bi vegeerîna çandî pêk hat, herçiqas beriya wê jî teoriyên ku bi çandê ve jî elaqedar dibûn, wekî Teoriya Polîsîstem û ya Skoposê hin gav avêtibûn jî. Ji ber ku em di vê tezê de li ser nêzîktêdayînen çandî yên di wergerê de disekin in em ê bêtir wergerê ji aliyê çandî ve binirxînin û pênaseyên bi vî awayî derxine pêş û li jêrê em ê berê behsa pêvajoya pêkhatina pênaseya wergerê ya çandî bikin.

Wekî me di gelek cihan de jî behs kir, beriya salên 1970yan wergernasî bi zimannasîyê ve girêdayî bû. Lê piştî van salan bi taybetî ji ber ku zimannasî jî ji bin bandora rêzimana transformatif generatîv xilas bû ku qet taybetiyên ji derveyî rastiya zimên qebûl nedikir, êdî aliyê zimên yê pratîk, vekirî derket û ziman wekî zimanê rojanê yê hawirdorê hat dîtin. Bi Teoriya speech actê jî ev pêvajoyên berdewam bû û êdî aliyên zimên yên civakî û bêjekar (communicative) bêtir ketine nav zimannasîyê. Vê geşedanê jî bandora xwe ji wergerê kir ku ew demekê piştî van pêşketinan bi navê "translational studies" û wekî dîsîplîneke serbixwe derkete meydanê¹²⁹

Piştî van çalakiyên di zimên de û bi derketina wergernasîyê wekî dîsîplîneke serbixwe êdî, bi "vegerîn"ên ku di wergerê de pêk hatin, geşedaneke di wergerê de çêbû; di destpêkê de di salên 1980yan de wekî vegeerîna çandî û bi bandora wê jî vegeerîna îdeolojîk, vegeerîna gerdûnîtiyê, vegeerîna sosyolojîk û hwd. Ji ber van vegeerînen -bi awayekî din jî nêzîktêdayînen- di wergerê de jî werger bêguman êdî bû

¹²⁸ Mona Baker, "The Changing Landscape of Translation and Interpreting Studies" , **A Companion to Translation Studies**, (15-27), Blackwell, Oxford 2014.

¹²⁹ Snell-Hornby, "The Turns of Translational Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (266-370).

mijareke înterdîsîplîner û bi dîsîplînên din wekî felsefe, çandnasî û civaknasîyê re di têkiliyeke xurt de ye.

Ev geşedanên di zimên de çêbûn, bandor li ser teoriyên wergerê kirin ku tevî zimên bi çandê ve, bi têkiliyên wergerê û çanda ku werdigerîne ve, bi aliyê civakî yê zimên û wergerê ve mijûl bibe. Yanê mirov dikare bêje pênaseya ku werger wekî "metnek ku bi peyvên ji zimanekî din tê wergerandin" didît êdî guherî. Ji ber ku mesele ji *peyv*an derbastir bû, *ji zimên wêdetir* çû, ber bi *çandê* ve, ber bi *tiştên dervêyî zimên* ve hat. Ji ber van geşedanên di wergerê de wergêr êdî nikarî tenê bala xwe bide li ser metnê. Ji ber ku nêrînên zanistî yên li ser wergerê guherîn. Ji bo van nêrînên zanistî, di wergerê de "hemtayîtî" girîng bû. Yanê ji bo wergereke tekûz wekhevkirina peyvên ZJ û ZA muhîm bû. Lê, bi van geşedanên di wergerê de, wekî berê werger êdî tenê wekî meseleyeke zanistî nedihate dîtin, dewsa perspektîfên preskrîptîv, yên teswîrî derketin pêş. Li dewsa qaîdeyên "divê werger bi vî awayî bê kirin û wergêr jî bi vî awayî wergerîne" nîqaşên cuda li ser wergerê çêbûn ku tiştên wekî "çand, bandora nivîskar ya li ser wergêr, etîk û hwd." hatine nîqaşkirin. Jixwe piştî demekê jî têgeha "vegerîna wergerî" derket.¹³⁰

Piştî salên 1990an vegerînên din di wergerê de pêk hatin ku werger bi dîsîplînên din ve kete nav çalakiyekê. Li gorî Snell Hornby du sedemên wê yekê hene ku piştî salên 1990an vegerînên nû di wergerê de pêk hatin, bi awayekî din werger bi dîsîplînên din re xebitî, nêzîktêdayînên nû derketin. Yek ji wan "vegerîna gerdûnîtiyê"ye. Bi salan werger ew tişt bû ku tu li ber maseyekê runê, metnê hildî pêşiya xwe û ji zimanekî derbasî yekî din bikî, lê bi xêra teknolojiyê, komputerê, internetê guherîn di wergerê de çêbûn. Sedemeke din jî "vegerîna empîrîk" e ku di nav wergerê bixwe de çêbû.¹³¹

Li gorî Bachmann-Medick destpêka hemû ev guherînên ku me behskirî *vegerîna çandî ya di wergerê de* ye ku di dawiya salên 1980yan dest pê kir ku di

¹³⁰ Bachmann-Medick, "The 'Translational Turn' in the Literary and Cultural Studies: The Example of Human Rights", **New Theories, Models and Methods in Literary and Cultural Studies**, (213-233).

¹³¹ Snell-Hornby, "The Turns of Translational Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (266-370).

encamê de wergera filolojîk-lîngûistîk bi xebata li ser çandê perspektîfên nû qezenc kir.

Mirov dikare bi awayên cuda li ser wergerê bisekine û li gorî teoriyên cuda ji bo wergerê pênaseyên cuda bike; lê rastiyeke heye ku werger û wergernasî di van salên dawî de êdî li ser çandê û nêzîktêdayînên çandî disekin. Ji ber vê yekê ku bi taybetî piştî werger ji bin bandora zimannasiyê xilas bû û nêzîktêdayînên çandî di Teoriya Skopos (di 1970yan), di Teoriya Polîsîstem (1978) de hatin bikaranîn û piştî 1980yan jî jixwe bi vegeftina çandî ve êdî nêzîktêdayînên çandî di wergerê de roj bi roj geş dibin.

Ger mirov li gorî van nêzîktêdayînên çandî wergerê terîf bike, wê gavê mirov ê bibîne ku werger ji sînorên xwe yê destpêkê derbastir bûye, sînorên ku bi zimannasiyê ve hişkehişk girêdayî bû bi qewlê ku Snell Hornby wekî înterdîsîplîniya emperyalîstîk terîf dike ku zimannasiyê teorî û rêbazên xwe empozeyî wergerê dîke.¹³² Ev terîfîkirina nû ya wergerê berê jê re azadiyek tîne ku di bin bandora zimannasiyê xilas dibe. Piştî wê jî bi dîsîplînen din re dikeve tîkiliyê, wê dike înterdîsîplîner û nêzîktêdayîn û stratejiyên nû ji bo wergerê ava dike. Nêzîktêdayînên û stratejiyên vê dawiyê di bin bandora çandnasiyê derketiye; bêyî ku yên zimannasiyî bavêje alîkî digel wan dixebite ku mirov dikare stratejiyên ehlîkirin û biyanîkirin yên Venuti wekî mînak nîşan bide.

Dema mirov guherînen vê dawiyê yên di wergerê de dinihêre -bi vê dawiyê qesta me ev 30-40 salên dawî ne- teorîsyenên ku zêdetirîn tesîrker ew kes in ku xebatên xwe yên wergerê digel çandnasiyê wekî înterdîsîplînerî jî dimeşînin ku Mary Snell Hornby û Lawrence Venuti du kes ji wan in ku di pirtûkan/ferhengan de wekî ramangerên sereke yên wergerê derbas dibin.¹³³ Xaleke sereke heye ku xebatên van kesan, herwiha xebatên wergernasiya vê gavê yên li ser wergerê girîngtir dike. Wergernasî êdî bi awayê înterdîsîplînerî dixebite, ji ber ku bi saya înterdîsîplîneriyê wergernasî prespektîfên xwe firehtir dike û dikare bi saya tîkiliyên xwe yên bi wan dîsîplînan re nêzîktêdayînên nû derbixe û tîxe xizmeta wergerê.

¹³² Snell- Hornby, *The Turns of Translation Studies . New paradigms or shifting viewpoints?*, r. 72.

¹³³ Bnr. Giuseppe Palumbo, **h.b.**

Xêncî vegerîna çandî di wergerê de Susan Bassnett¹³⁴, Bachmann-Medick¹³⁵ û Mary Snell-Hornby¹³⁶ behsa vegerîna wergerî di çandnasiyê de û dîsîplînên din de dikin. Pêşiyê, di salên 1990an de Susan Bassnett behsa vegerîna wergerî di çandnasiyê de kir. Herwiha, li gorî Bachmann-Medick di van salên dawî de kesên ji derveyî wergernasiyê jî tev li vê nîqaşê bûn û ev nêrîna hem ji aliyê teorîk hem jî ji aliyê sîstemîk ve perspektîfa wergernasiyê berfirehtir kir; û mirov dikare behsa vegerîna wergerî bike dema ku sînorên "wergernasiyê" ji qada xwe derkeve, berfirehtir bibe û ev têgeh ji aliyê metodolojîk ve di navbera dîsîplînan de hereket bike.¹³⁷ Hindî ku dengên ji derveyî wergernasiyê tev li nîqaşê bûn hindî çû perspektîfa wergerê ji aliyê teorî û sîstemê ve berfirehtir bû û êdî "vegerîna wergerî" di dîsîplînên cuda yê çandnasiyan¹³⁸ û di zanistên civakî de wê xwe nîşan bide.¹³⁹ Dîsa li gorî Bachmann-Medick xebatên girîng yê kesên wekî Venuti, Tymoczko û Gentzler, Cronin, Hermans, Snell-Hornby jixwe ev demeke dirêj e ku têgehiştinên li ser wergerê derdixin derveyî peywenda wê ya adetî. Lê "vegerîna wergerî" ji van jî wêdetir diçe, ji ber ku vegerîna wergerî dema ku kategoriya wergerê ji wergernasiyê derket û çû nav dîsîplînên din ên çandnasiyan pêk hat.

Têgehiştinên înterdîsîplînerî yê li ser wergerê rêya wê berfirehtir dike wusa ku vê carê wergernasî, ne ku tenê ji wan dîsîplînên din îstîfade bike, herwiha di nav wan de xuya bibe. Wekî Bachmann-Medick tîne ziman vegerîna wergerî di nav wan dîsîplînan de, bi taybetî di çandnasiyan, çandnasî û zanistên civakî de pêk tê.¹⁴⁰

¹³⁴ Bassnett, "The Translation Turn In Cultural Studies", **Constructing Cultures: Essays On Literary Translation Topics in Translation**, (123-140)

¹³⁵ Snell-Hornby, "The Turns of Translational Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (266-370).

¹³⁶ Snell-Hornby, "The Turns of Translational Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (266-370).

¹³⁷ Bachmann-Medick, "The Translational Turn", **Handbook of Translation Studies** Vol. 4, (186-193) John Benjamins, Amsterdam/ Philadelphia 2013.

¹³⁸ Çandnasiyan van dîsîplînan di hundirîne: Dîrok, arkeolojî, antropolojî, xebatên qadê (area studies), xebatên ragihandinê (communication studies), xebatên klasîk, hiqûk, polîtîka, semiyotîk, û zimannasî. Çandnasî jî ji bo wergera peyva "cultural studies" ya îngîlîzî tê bikaranîn. Di heman demê de ji dewsa peyva Almanî kultûrwissenschaft jî tê bikaranîn herçiqas di navbera cultural studies û kultûrwissenschaft de cudahiyeke hebe jî.

¹³⁹ Bachmann-Medick, "The Translational Turn", **Handbook of Translation Studies** Vol. 4, (186-193).

¹⁴⁰ Bachmann-Medick, "The Translational Turn", **Handbook of Translation Studies** Vol. 4, (186-193).

Di encama vê beşê de tişta ku mirov dikare bêje ew e ku têgehiştina li ser wergerê ya 50 sal beriya niha û ya niha ne yek e, ji ber ku werger êdî înterdîsîplîner e ku bi qadên din ve -wekî çandnasî, civaknasî, edebiyat, zimannasî- di têkiliyeke xurt de ye.



BEŞA DUYEM

WERGERNASÎ Û KURDNASÎ

2.1 DESTPÊKÊN WERGERÊ DI KURMANCÎ DE

2.1.1 Destpêka wergera kurdî- beriya 1980yan

Yekem nimuneya *kîtêba ku bo kurdî* (kurmancî) hatiye wergerandin " [...] Încîlek e, Încîla Matthew ku sala 1856ê bi elifbeya Ermenî li Stenbolê hatiye belavkirin."¹⁴¹ Ev beşa Încîlê ji aliyê vaîzekî Ermenî Stepan ve li bajarê Xanî ya Tirkîyê [li Diyarbekir] bo Kurmancî tê wergerandin û ji aliyê British and Foreign Bible Society ve tê çapkirin¹⁴² Ev pirtûk di heman demê de yekem nimuneya pirtûka kurdî ya çapbûyî ye¹⁴³ û 112 rûpel e.

Sala paşîn yanê di sala 1857an de vê carê herçar beşên Încîlê jî tîr çap kirin. Ev Încîla ku em behs dikin bi elifbeya ermenî hatiye wergerandin û li Stenbolê hatiye belavkirin.¹⁴⁴ "Ev werger ne ji bona Kurdan bû, ji bona Ermeniyên [li wê herêmê, Kurdîstanê] bû ku bi kurdî diaxaftin û jixwe ji aliyê Ermenîyan ve hatiye wergerandin û weşandin."¹⁴⁵ Ev Încîla jî wekî ya beriya xwe dîsa ji aliyê Stepan ve tê wergerandin yan jî bi gotineke din Stepan her sê beşên mayî jî li ser temam dike û vê carê bi awayekî tekûztir çap dike; 398 rûpel e, destpêka wê tune ye û hema rasterast dikeve nav mijarê. Li gorî agahiyên Ferhad Pîrbal dide, rûpelên pirtûkê hatine nimrokirin. Herwiha Pîrbal taybetiyeke din ya vê wergerê diyar dike ku ev Încîla ji

¹⁴¹ Öpengin, **h.g.**, r. 4.

¹⁴² K. J. Thomas, **Encyclopedia Iranica**, <http://www.iranicaonline.org/articles/bible-viii> (11. 12. 2015)

¹⁴³ Ji bo agahiyên zêdetir bnr: Öpengin, **h.g.**, r.4. û Thomas, **h.b.** Lê divê em vê jî bibêjin ku di çend çavkaniyên me bi destxistî de yekem pirtûka ku bi kurdî çap bûye wekî wergera Încîlê ya 1857an de dixuye. Lê ev çavkaniyên em behs dikin qet behsa wergera Încîla di sala 1856an de nekirine. Bnr: Ferhat Pîrbal "The history of translating Kurdish literature from foreign languages into Kurdish", **The Kurdish Globe**, 2008, <http://www.kurdishacademy.org/?q=node/540>(10.12.2015). herwiha bnr. Martin Rzepka, "Some Remarks on the Bible Translation into Kurdish and the Kurds. The Christian Missionary Narratives from the 19th Century", **Fritillaria Kurdica, Bulletin of Kurdish Studies**, No 1, Institute of Oriental Studies Jagiellonian University National Science Center Krakow, 2013.

¹⁴⁴ Öpengin, **h.g.**, r. 4.

¹⁴⁵ Martin Rzepka, "Some Remarks on the Bible Translation into Kurdish and the Kurds. The Christian Missionary Narratives from the 19th Century" , **Fritillaria Kurdica, Bulletin of Kurdish Studies**, No 1.

bo dîroka wergera zimannasiyê ya danberhevî (comparative linguistic translation) girîng e. Di heman demê de di qadên termînolojî, sentaks, û morfolojîyê de jî xebateke girîng e.¹⁴⁶

Li gorî agahiyên E. Öpengin, digel vê încîla ku nimûneya yekem ya wergera kurdî tê qebûlkirin, wergerên pêşî yên kurdî ji destê Mela Mehmudê Bazîdî di salên 1858-59an de derketin. Wî pişkek ji kitêba Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî, ji farsî wergerandiye kurmancî.¹⁴⁷

Di sala 1860ê¹⁴⁸ de pirtûkeke din bi sernavê Ayneparan Alifbe Cuz Kurmancî tê wergerandin. Armanca wê, hînkirina zarokên ermenî yên li Kurdîstanê bû ku bi ermenî nizanîbûn.¹⁴⁹ Li gorî Ferhad Pîrbal ev pirtûka, Încîlê rave û şîrove dike, 56 rûpel e û 42 heb wêne tê de hene. Her rûpel jî du situnan pêk tê, yek bi kurdî hatiye nivîsandin ya din jî bi ermenî û ev jî diyar dike ku nivîskarên ermenî berê bi ermenî nivîsandine paşê wergerandine kurdî. Pîrbal taybetiyên din yên vê pirtûkê wuha rêz dike: "Ew yekemîn pirtûka kurdî ye ku încîlê şîrove dike, yekemîn pirtûka kurdî ya pedagojîk jî bo zarokan e, yekemîn pirtûka kurdî ye ku behsa dîroka zimanê kurdî dike, yekemîn pirtûka kurdî ye ku îllustrasyonên kurdî tê de hene û yekemîn pirtûka kurdî ye ku herfan jî bo kurdî formule dike."¹⁵⁰ Di vê pirtûkê de ferhengeke bi kurdî-ermenî jî cih digire ku tê de 300î zêdetir peyv hene.¹⁵¹

Di salên 1856an de beşeke încîlê ya Peymana Nû hatibû wergerandin û di sala 1857an de jî sê beşên din yên Peymana Nû ji aliyê heman kesî ve, Stephan ve, hatibû wergerandin. Di sala 1872yan de beşên Peymana Nû yên mayî jî aliyê Temoyê kêşeyê Ermenî ve hat wergerandin û li Stenbolê ji aliyê American Bible Society ve hate weşandin.¹⁵²

¹⁴⁶ Ferhat Pîrbal, **h.g.**, (10.12.2015).

¹⁴⁷ Öpengin, **h.g.**, r. 5.

¹⁴⁸ Ferhat Pîrbal vê dîrokê wekî 1861 destnîşan dike. Bnr. Ferhat Pîrbal, **h.g.**

¹⁴⁹ Mesud Serfiraz, **Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de(1844-1923)**, Peywend, Stenbol, 2015. r. 207.

¹⁵⁰ Pîrbal. **h.g.**

¹⁵¹ Pîrbal. **h.g.**

¹⁵² Thomas, **h.b.** ; Serfiraz, **Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de(1844-1923)**, r. 208.

Li gorî Martin Rzepka (ku vê gavê li ser wergerên încîlê yên bi kurdî dixebite) ev wergera ku Temo kirî, hate rexnekirin. Sedemeke wê ew bû ku elfabeya ermenî hatibû bikaranîn û ya duyem jî zaravayên curbicur di wergeran de hatibû bikaranîn.¹⁵³ Ji ber vê jî wusa dixuye ku têgihêjtina wê zehmet e. Dîsa li gorî Rzepka, herçiqas rexne hebin jî ji bo ku mirov li ser zimanê kurdî yê sedsala 19an bixebite ev nimuneyeke baş ya zimannasiyê ye."¹⁵⁴

Ji aliyê şiklê wergerê ve jî wuha hatiye nirxandin:

"Peyvên ku eslê wan erebî ne di wergera berhemê ya bo kurdî de qadeke pîroz ava dikin. Peyvên wekî Allah, Isa, şerîat rasterast bi îslamê ve girêdayine. Peyvên ku ji erebî hatine deynkirin jî, ji aliyê semantîkê ve hinekî guherîne û tê de cih girtine, jixwe ev jî taybetiyeke zimanê kurdî ye. Peyva: *t'ahvil* ku wateya wê ya eslî guherîn e, ji bo vaftîzê hatiye bikaranîn, ku ev jî nûjeniyek e. Ev peyv di farsî de wekî *tamîd* û di tirkî de jî wekî *vaftiz* hatiye wergerandin. Ji aliyekî din ve gelek peyvên tirkî jî tê de hene ku ji bo jiyana rojane tên bikaranîn wekî *çarşi*, *alışveriş*, *bayram*."¹⁵⁵

Li gorî Rzepka wergereke baş di bin berpirsiyariya wergêr, bi qabiliyeta wî, bi hizra wî û hevkarîya wî bi muhatabên wergerê re pêk tê. Tunebûna hevkarîgeriyeke wuha wergerê bêkêr dike. Dîsa li gorî wî di van wergeran de peyvên tirkî wekî bayram û alışveriş hatine bikaranîn.¹⁵⁶ Lê, dibe ku bikaranîna peyvên tirkî wekî bayram û alışveriş ji ber qelsbûna wergêran be. Jixwe peyva çarşi jî bi kurdî ye û ji farisî derbasî tirkî bûye.¹⁵⁷ Ji aliyekî din ve dema ku dîn li cihekî geş dibin pêşanî jî li gorî wê diguherin. Di sêrî de xwe gihandina wê metna pîroz tiştê herî muhîm e û ji ber vê jî wergêr bêyî ku zêde li ser pêvajoya wergerê bifikire, werdigerîne. Ji aliyekî din ve jî her dîn di çandên cuda de di astên cuda de ye.¹⁵⁸ Muheqeq tevî şert û

¹⁵³ Martin Rzepka, "Protestants among Kurds and some problems of the Bible translations into Kurdish in the 19th Century", *Orientalia Christiana Cracoviensia* 1, (87-92), 2009.

¹⁵⁴ Rzepka, "Protestants among Kurds and some problems of the Bible translations into Kurdish in the 19th Century", *Orientalia Christiana Cracoviensia* 1, (87-92).

¹⁵⁵ Rzepka, "Protestants among Kurds and some problems of the Bible translations into Kurdish in the 19th Century", *Orientalia Christiana Cracoviensia* 1, (87-92)

¹⁵⁶ Rzepka, "Protestants among Kurds and some problems of the Bible translations into Kurdish in the 19th Century", *Orientalia Christiana Cracoviensia* 1, (87-92)

¹⁵⁷ Serfiraz, *Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de(1844-1923)*, r. 215.

¹⁵⁸ Lynne Long, "Translation of sacred texts", *The Routledge Handbook of Translation Studies*, (464-474), New York, Routledge 2013.

mercên wê demê ev sedem jî muhîm in. Herwiha, ji ber ku metnên pîroz in wergerandina wan ne tenê tiştekî çandî û zimanî ye, ji wan wêdetir e.¹⁵⁹

Di sala 1880an de pirtûkeke bi navê *Yerkaran* bi tîpên ermenî tê çapkirin û beşeke wê jî wergera ilahiyên xristiyanî bo kurdî ye û li Xarpetê çap bûye.¹⁶⁰

Wergereke din ya Încîlê bo kurmancî di sala 1891ê de dest pê kir. Çend heb keşeyên ermenî Peymana Nû û mezmûnên wê wergerandin. Berê Matthew li Stenbolê ji aliyê American Bible Society ve di sala 1891ê de hate weşandin.¹⁶¹ Wergera wê di bin birêveberiya J. G. Bliss ve hat kirin ku ew jî ji bo American Bible Society dixebitî.¹⁶² Piştî vê jî beşên din, Mark, Luqa, Johannes û "Emelê Resulan"(the acts) di sala 1911an de hatin çapkirin. Çapxaneyê van herçar beşan jî Stenbol bû.¹⁶³ Ev her sê beşên dawiyê ji aliyê sê heb ermeniyan ve hate wergerandin ku navên wan Amirkhaniyan, Der Ghazarian û Abalahadiyan bû.¹⁶⁴ Li gorî K. J. Thomas wergêrê van pirtûkan çend heb bûne, ne tenê sisê bûne.¹⁶⁵ Ev navên li jorê hejmartî jî diyar e ku ev sê kes, sê kesên ji wan çend heban e. Bi xebateke ku çend salan dikişîne projeya sererastkirina wergeran û tîpguhêzîkirina van încîlan ji bo herfên erebî ji aliyê A. N. Andrus û H. H. Riggs ve dest pê kir ku herdu jî ji bo American Board of Commissioners for Foreign Missions dixebitîn. Di encama xebata wan de sê beşên Încîlê -Matthew, Mark, Luqa- bi herfên erebî hatin amadekirin. Di sala 1922an de Matthew û Mark û di sala 1923an de jî Luqa li Stenbolê hatin çapkirin.¹⁶⁶

Divê em vê jî bêjin ku beriya încîlên me li jor hejmartî ji bo wergerandin û çapkirina încîlan hewldan çêbûne. Mesela li gorî agahiyên Thomas ku ji British and Foreign Bible Society vediguhêze, pîSkoposê Katolîk-Keldanî Şevrîz (Shevriz) wergereke încîlê ya ji erebî bo kurdî pêk anî ku di sala 1826an de tamam kir û alimên

¹⁵⁹ Long, **h.b.**, r. (464-474).

¹⁶⁰ Serfiraz, **Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de(1844-1923)**, r. 207.

¹⁶¹ Thomas, **h.b.**

¹⁶² "No Full Bible in Kurdish Yet", Kurdish Facts and West-Asian Affairs, j.5, r. 15-16.

¹⁶³ Thomas, **h.b.** ;"No Full Bible in Kurdish Yet", Kurdish Facts and West-Asian Affairs, j.5, r. 15. ; Serfiraz, **Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de(1844-1923)**, r. 210.

¹⁶⁴ "No Full Bible in Kurdish Yet", Kurdish Facts and West-Asian Affairs, j.5, r. 15-16.

¹⁶⁵ Thomas, **h.b.**

¹⁶⁶ Thomas, **h.b.**

Kurdan çavek lê gerandin. Xelkên Kurdîstanê ku bi çend zaravayan xeber didan, ji wê fem nekirin û ev wergera nehate çapkirin. Ji ber vê ji van hewldanan encamek derneketiye ortê.¹⁶⁷

Wergerên încîlên bo kurdî(kurmancî) prestîja zimanê kurdî û axiftina kurdî bilintir kir. Wusa dixuye ku armanc ji bo wergerandina van încîlan propagandaya dînî bû û armanceke din jî ew bû ku Ermeniyên di nav Kurdan li ser dîne xwe bimînin.¹⁶⁸

Xêncî van çalakiyên wergera kurdî yê destpêkê ku bi taybetî ji aliyê biyanîyan ve hatiye kirin, vê carê Kurdek, Kamûran Ali Bedirxan û keşeyê dominikan Thomas Bois ku li Musulê dixebitî, li beyrutê di sala 1947an de beşa încîlê Luqa bi tîpên erebî û latînî çap kirin. Dîsa di heman salê de Metelokên Hezrefî Silêman ji Îbranî wergerandine kurdî.¹⁶⁹

Beriya van xebatên ku me li jor hejmartî jî çalakiyên wergera kurdî çêbûne, lê wergerên ku beriya vê dîrokê bo kurdî hatine kirin, ne wekî pirtûk lê wekî nusxe hatine wergerandin. Wekî mînak gernasê Italyayî Maurizio Garzonî di pirtûka xwe ya bi navê Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda de ku di sala 1787an de li ser zimanê kurdî derdikeve, du duayên xristiyanîyê werdigerîne kurdî.¹⁷⁰ Duaya yekem Orizzione Domenicale ango Duaya Rebb e, ya duyem jî Salutatione Angelica ango Silavên Melekan e.¹⁷¹ Herdu jî duayên pir kurt in lê dîsa jî nimûneyên wergerê ne.

Dîsa, Peter Lerch di kitêba xwe *Forschungen uber die Kurden und die iranischen Nordchaldaer* de cih dide wergera kurdî ya hejmareke çîrok û metelokên ji fînlandî û tirkî.¹⁷²

¹⁶⁷ Thomas, **h.b.**

¹⁶⁸ Öpengin, **h.g.**, r. 5.

¹⁶⁹ Thomas, **h.b.**, vgz. Öpengin, **h.g.**, r. 5.

¹⁷⁰ Maurizio Garzoni, **Grammatica E Vocabolario Della Lingua Kurda**, Roma, 1787, r. 283-284 vgz. Mesud Serfiraz, "Di Çapemeniya Kurdî ya Dewra Osmanî de Wergera Wêjeyî", **Wêje û Rexne**, Istanbul, : Kayhan Matbaacilik, 2014. r. 57-58

¹⁷¹ Garzoni, **h.b.**, r. 283-284, vgz., Mesud Serfiraz, **Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de(1844-1923)**. r. 200.

¹⁷² Öpengin, **h.g.**, r. 5.

Di sala 1931ê de Erebê Şemo bi wergêrana *Koçeke Derewîn* a Aleksandr Araratyan nimuneyeke wergereke edebî pêşkêş kir.¹⁷³ Herwiha di navbera salên 1931-1937an de ji wêjeya rûs û ermeniyên 15 pirtûk hatine wergerandin bo kurdî. Ev werger ji aliyê nivîskar û rewşenbîrên kurd yê sovîyetê yê wekî Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Casîmê Celîl, Qaçaxê Çaçan, Cerdoyê Genco, Ruben Drampyan û Erebê Şemo ve tên kirin.¹⁷⁴ Öpengin diyar dike ku heta salên 80yan hinek xebatên Celadet Alî Bedirxan, Kamuran Alî Bedirxan, Qedrîcan, û Osman Sebrî tene pêş çavan. Celadet Alî Bedirxan çîrokeke bi ku bi eslê xwe îngîlîzî bû ji fransî wergerand û di sala 1943an de bi navê Conî û Cîmema li şamê çap kir. Kamuran Alî Bedirxan xêncî xebatên me behskirî, 36 Çarînên Xeyam û gelek sûretên Quranê û qedera 700 hedîs wergerandin û di hawarê de belav kirin. Qedrîcan ji romeneke finlandî beşên ji romana *Di welatê zembeqê gewir de* di hejmarên Roja Nû de belav kirin. Herwiha wî çîrokek ji erebî di hejmara 13ê ya Ronahiyê de belav kiriye.¹⁷⁵

Digel van nimûneyan Xelîl Xeyalî jî helbesteke Mehmet Akîf Ersoy wergerandiye kurdî û di Rojî Kurd'ê de weşandiye. Dîsa Xelîl Xeyalî helbesteke Tehiru'l Mewlewî wergerandiye û di Hetawî Kurd de weşandiye.¹⁷⁶ Mihemed Mîhrî ji bo ku îspat bike ku edebiyata kurdî heye û zimanê kurdî kêrî edebiyatê jî tê çend xezel, beyt, stran, lawje û berîteyan werdigerîne tirkî û di *Jînê* de par ve dike.¹⁷⁷ Helbesteke Nalî di sala 1908an de bo fransî hatiye wergerandin û di rojnameyekê de hatiye weşandin. Herwiha helbestên wî bi wergerên wan yê tirkî di *Jîn* û *RAPKê* de jî hatine weşandin. Gelek lêanîn jî ji aliyê kesên wekî Nureddîn Zaza û çend kesên din ve ji zimanên din bo kurdî hatine kirin. Nureddîn Zaza digel lêanînen hin çîrokan ku gelek ji wan di Hawarê de derketine, di sala 1968ê de, salek beriya mirina xwe Mem û Zîn wergerandiye fransî. Herwiha Memet Emîn Bozarslan di sala 1968an de Mem û Zîn latînîze kiriye û wergerandiye tirkî jî. Dîsa wekî Bozarslan di pêşgotina Mem û Zînê de behs dike, beriya wî jî Mem û Zîn bo rûsî hatiye wergerandin û çend

¹⁷³ Öpengin, **h.g.**, r. 5.

¹⁷⁴ Remezan Alan, axaftina şexsî (08.01.2015).

¹⁷⁵ Öpengin, **h.g.**, r. 5.

¹⁷⁶ Serfiraz, "Di Çapemeniya Kurdî ya Dewra Osmanî de Wergera Wêjeyî", **Wêje û Rexne**, r. 59-60.

¹⁷⁷ M. Emîn Bozarslan, *Jîn Kovara Kurdî- Tirkî* Kürdçe-Türkçe Dergı 1918-1919*, c. 1, Weşanxana Deng, Uppsala, 1986, r. 219-220. vgz. Serfiraz, Mesud. "Di Çapemeniya Kurdî ya Dewra Osmanî de Wergera Wêjeyî", **Wêje û Rexne**, Istanbul, : Kayhan Matbaacılık, 2014. 61.

pişkên wê jî bo elmanî hatine wergerandin.¹⁷⁸

2.1.2. Wergera kurdî piştî 1980yan

Xebatên li ser wergera kurdî, yên ji aliyê teorîk ve dinirxînin jixwe hema tune ne û yên ku rewşa wergera kurdî ya piştî 1980yan bi hejmar û rêjeyên pirtûk û weşanxaneyan radixin ber çavê me, beşeke pirtûka Malmîsanij e, pirtûka ku di sala 2006 de bi Tirkî û Îngîlîzî çap bûye bi navê xwe yê îngîlîzî "The past and present of book publishing in Kurdish Language in Turkey"; yeke din jî gotareke Ergin Öpengin e ku di sala 2009an de li konferansekî hatiye pêşkêşkirin. Ji ber ku xêncî van, nivîsar û pirtûkên ku li ser dîroka wergera kurdî ya dema modern nîn e, em ê bi taybetî ji van îstîfade bikin.

Pêşvebûna û pêşveçûna wergera kurdî ya piştî 1980yan girêdayî du sedeman e. Ya yekem xebatên rewşenbîrên Kurdan bû ku piştî salên 1980yan ji ber sedemên siyasî derketin çûn welatên Ewrûpî wekî Swêd, Fransa, Almanya hwd. Kesên li vê derê, ji bo zimanê kurdî, ji bo wêje, çand û herwiha ji bo wergera kurdî xebatên girîng kirin. Ya duyem jî xebatên piştî 1991ê ne ku bi rabûna qedexeyên li ser weşanên bi kurdî li Tirkiye û Kurdîstana bakûr hatin kirin.¹⁷⁹

Destpêkên wergera kurdî yên piştî salên 1980yan li Ewropayê pêk hat û xêncî çend pirtûkên zarokan, yekem nimuneya wergerê ku wê demê hate belavkirin *Şervanekî Biçûk ê Vietnamî* bû ku ji nav weşanên Roja Nû derket.¹⁸⁰

Di sala 1996an de li Swêdê bi pêşengiya Firat Cewerî bi navê Nûdem werger yekem kovara wergerê derket. Di kovarê de digel beşên ji wergerên berhemên cihanî wekî Îlyadaya Homeros, gotarên nivîskarên wekî Yaşar Kemal û Murathan Mungan, hevpeyvîn, gotarên li ser nivîskaran û danasîna pirtûkên cihanî yên ku bo kurdî hatine wergerandin jî cih digirin. Ev kovara ji vî aliyê ve girîng e ku yekem kovara wergerê ya kurdî ye. Armanca wê ew e ku "di riya wergerandina berhemên cihanî de, zimanê kurdî ji kirasê folklorî yê teng derxîne, bi riya peydakirin û avakirina formulasyonên edebî, dewlemendiyekê bigihîne zimanê kurdî yê edebî û herweha

¹⁷⁸ Ehmedê Xanî, **Mem û Zîn**, wer. Mehmet Emîn Bozarlan, Gün yayınları, İstanbul, 1986. r. 12.

¹⁷⁹ Öpengin, **h.g.**, r. 6.

¹⁸⁰ Öpengin, **h.g.**, r. 7.

Kurdan bike şîrkên edebiyata cîhanî."¹⁸¹ Digel perspektîfeke bi vî awayî, ev kovar tenê yek hejmar derket.

Di sala 1991ê de li Tirkiyê zagona bi hejmara 2932yan, pêşî ji weşanên "ji bilî tirkî" vedibe bi vî awayî jî hejmara weşanên kurdî zêde dibin. Herweha piştî vê demê çalakiya wergerê li Tirkiyê xurtir dibe. Derketina çend dîwanên helbestan ji nav weşanên Avestayê li tirkiyê destpêka wergerên çapkirî ne.¹⁸² Piştî vê salê di navbera sala 1992 û 2001an de li diyasporayê li dora 45 pirtûkên wergerî hatine weşandin digel ku li tirkiyê 15 pirtûkên wergerî bo kurdî hatine çapkirin ku piraniya wan berhemên nivîskarên soranîziman yan jî yên nivîskarên kurd yên tirkînûs in ku di navbera wan de *Mîrovên Hejar* ya Victor Hugo û *Qaqlîbaz* a Richard Bach deriyekî cihanî vedikin ji bo wergera kurdî.¹⁸³

Di navbera salên 2002 heta 2009an hejmara wergerên kurdî yên ku li tirkiyê çapbûyî 105 e digel ku hejmara wergerên li diyasporayê 37 e.¹⁸⁴ Wusa dixuye ku tesîra rabûna qedexeyên li ser axaftin û weşangeriya kurdî ya piştî sala 1991ê tesîrekê mezin li ser wergera kurdî ya li tirkiyê dike.

Bi taybetî piştî salên 2000an çalakiya wergera kurdî li tirkiyê xurtir bû û çend nav derketin pêş wekî Kawa Nemir ku roman û helbestên ji edebiyata Îngîlîz û Amerîkanî werdigerîne Kurdî. Ji Shakespeare, Edgar Allan Poe, Herman Melville, Oscar Wilde, William Butler Yeats, Samuel Beckett, Walt Whitman, Emily Dickinson, T.S. Eliot, Ezra Pound, William Blake, John Keats, Sylvia Plath, James Joyce û ji van zêdetir ji nivîskar û helbestvanên edebiyata cihanî berheman werdigerîne.¹⁸⁵ Lê bi taybetî wergera hemû soneyên Shakespeare di nav berhemên wî de bal kişand.

Herwiha, Ciwanmerd Kulek ku digel nivîskariya xwe bi wergerên xwe jî tê nasîn wergêrekî din e ku di qada wergera kurdî de derdikeve pêş ku ji zimanên wekî

¹⁸¹ **Nudem werger**, Hejmar 1, amd. Firat Cewerî, 1996. r.4-5.

¹⁸² Öpengin, **h.g.**, r. 7.

¹⁸³ Öpengin, **h.g.**, r. 8.

¹⁸⁴ Öpengin, **h.g.**, r. 8.

¹⁸⁵ İnsanokur, Ulysses Kürtçeye çevriliyor-Kawa Nemir ile söyleşi, 2013, <http://www.insanokur.org/ulysses-kurtceye-cevriliyor-kawa-nemirle-soylesi-ayca-orer/> (çile 15, 2016.)

îngîlîzî û îspanyolî ji nivîskarên wekî William Faulkner, J.M. Coetzee, Gabriel Garcia Marquez wergeran dike.

Ji bilî wan, navên wekî Samî Hezil ku bi taybetî ji edebiyata Îngîlîz û Amerîkî werdigerîne û Dîlawer Zeraq ku ji edebiyata tirkî werdigerîne, di nav wergêrên kurd yên li tirkîyê derdikevin pêş.

Li derveyî welêt jî navên wekî Firat Cewerî, Hesenê Metê, Mustafa Aydogan, Fawaz Hisên û Ergin Öpengin digel xebatên xwe yên din di wergerê de jî derketine pêş. Digel ku destpêka wergerê jî bi awayekî derweyî welêt bû, bi taybetî piştî salên 2000an mirov dibîne ku wergerên li tirkîyê çapbûyî ji yên diyasporayê zêdetir bûne. Sedemeke wê ew bû ku piraniya weşanxaneyên ku li derveyî welêt hatibûn avakirin, hatin girtin û berewajî wê li tirkîyê sal bi salê hejmara weşanxaneyên nû zêdetir bû.¹⁸⁶

Xebatên wergerê jî wekî xebatên wêjeyê meşîya, ji ber ku şertên herduyan zêde ji hev cuda nebûn. Pêşveçûna di wêjeyê û xebatên zimên de jixwe tesîr li wergerê jî dikir. Ji ber ku kesên ku berhemên wêjeyî, wekî roman, çîrok û helbest dinivîsandin; ji derveyî welêt wekî mînak Firat Cewerî, Fawaz Hisên, Mustafa Aydogan di heman demê de werger jî diki[ri]n. Yan jî li tirkîyê navên ku bi wergerê derketine pêş di heman demê de li ser berhemên wêjeyî jî dixebit[î/i]n, wekî Kawa Nemir û Ciwanmerd Kulek.

Ergin Öpengin di lêkolîna xwe de ji 211 berhemên wergerê çeşnên wekî helbest, çîrok, roman, mîtos, ceribandî, deqên dînî, biyografî, lêkolînên warên zanistiyên komelayetî wek dîrok û antropolojî dibîne û wergeran di bin navê helbest, deqên edebî yên vegotinî û deqên ne-edebî di bin sê beşan de disenifîne ku hejmara helbestan 39 ya deqên edebî yên vegotinî 140 û ya deqên ne-edebî jî wekî 32 heb dibîne. Helbest û deqên edebî yên vegotinî tevahî deqên edebî pêk tînin ku hejmara wan 179 e.¹⁸⁷ Bi 179 hejmaran berhemên edebî ji berhemên teknîkî, civakî, yên derbarê zimannasiyê hwd. zêdetir têne wergerandin. Em ê li vê derê kevanekekê ji bo sedema pirbûna wergerên wêjeyî vekin. Dibe ku sedema wergerandina bêtir

¹⁸⁶ Öpengin, **h.g.**, r. 8.

¹⁸⁷ Öpengin, **h.g.**, r. 9.

berhemên wêjeyî wekî çîrok, roman, helbest bi taybetî jî ji aliyê kesên ku bi awayekî bi wêjeyê ve elaqedar in, ew be ku wergêr dixwazin ji qada ku jê fem dikin û hez dikin wergerînin; û ji ber ku hema hemû wergêrên Kurd bi awayekî wêjeyê ve elaqedar in, ji bo wergerê berhemên wêjeyî hildibijêrin. Jixwe ji wergêrên ku me li jor qal kirî de Ergin Öpengin, ku bi taybetî bi xebatên xwe yê li ser zimannasiyê tê nasîn, di kategoriyeke cuda de ye, ji ber ku ew ku bêtir bala xwe dide li ser berhemên derveyî wêjeyê wekî dîrokî û siyasî.

Herwiha mirov dikare hin sedemên din jî wuha bi rêz bike: Kêmbûna xwendevanên ku dixwazin metnên teorîk û lêkolînî bi kurdî bixwînin dibe sedem ku weşanxane û wergêr li dewsa berhemên teknîkî û teorîk berhemên wêjeyî hîlbijêrin. Ji ber ku ji ber perwerdeya wan ya ji zimanên din wekî tirkî jixwe berhemên teknîkî û teorîk ji wî zimanî peyda dikin û hêsantir dixwînin. Lewma dibe ku weşanxane û wergêrên Kurd ji ber piyasayê, tîrsa nefîrotana wergeran, dest navêjin wergerên teknîkî û teorîk. Baweriya edîtor û wergêran ku kurdî tenê kêrî edebiyatê tê û zehmet e mirov metnên xêncî edebiyatê wergerîne jî dibe sedema vê yekê.¹⁸⁸ Herwiha, têrênêkirina ferhengan ku zehmet e mirov peyvên teknîkî tê de bibîne jî sedemeke û zehmetiyeke din e ku wergêr kêmtir dest davêjin metnên/pirtûkên teknîkî ku wergerînin.

Di nav wergerên di lêkolîna Öpengin de pirtûkên edebiyata zarokan jî bi saya wergerên Mehmûd Lewendî, Amed Tîgrîs, Mûrad Ciwan, Seyîdxan Anter cihê xwe digire û zêdetirî 65 pirtûk ji edebiyata zarokan li Swêdê hatine çapkirin. Ji ber ku zarokên Kurd bi zimanê dayikê perwerde nedîtine û piraniya wan nikarin bi kurdî berheman bixwînin, hejmara berhemên kulliyata edebiyata zarokan hinekî kêm dimîne.¹⁸⁹

Öpengin, di lêkolîna xwe ya 2009an de rastî 211 pirtûkên wergerê yê kurdî yê çapbûyî tê û li gorî tehmîna wî her sal herî kêm deh pirtûkên wergerê çap dibin ku ev hejmar dibe ku van salên dawî zêdetir jî bûbe.¹⁹⁰ Bi avabûna enstîtuyên kurdî di bin banê zanîngehan li Tirkiyê, rê vedike ku zêdetir kes di warên wekî ziman,

¹⁸⁸ Öpengin, **h.g.**, r. 10.

¹⁸⁹ Öpengin, **h.g.**, r. 13.

¹⁹⁰ Öpengin, **h.g.**, r.7.

edebiyat, wergerê de xwe pêş ve biherin. Ev jî pêkan dike ku zêdetir kes li ser wergerê hûr bin û zêdetir berhem bêne wergerandin. Ji ber van sedeman mirov dikare bêje ku hejmara werger û wergêran piştî sala 2009an heta 2016an sal bi sal zêdetir bûye.

Bi kurtayî, sal bi salê hejmara weşanên bi kurdî, herwiha wergerên kurdî zêde dibin wekî ku di vê nimuneyê de dixuye ku hejmara wan ji sala 1980yan heta 1991an 8 bûn, di navbera salên 2002 û 2009an de digihêje 126 pirtûkan.¹⁹¹ Ev jî girêdayî zêdebûna hejmara xwendevan û xwendekar; nivîskar û wergêrên kurdî ye digel pêşîvebûn, serbestbûn û bikaranîna kurdiyê li tirkîyê.

2.2 WERGER DI KURDOLOJİYÊ DE

Wergerên ku ji zimanekî bo zimanekî din tên kirin tiştekî îfade dikin. Yanê ger mirov ji kurdî bo îngîlîzî berhemekî wergerîne wateya wê wergerê cuda ye, lê ger mirov ji îngîlîzî yan jî ji tirkî bo kurdî berhemekî wergerîne wateya wê cuda ye. Herwiha, ji ber ku Kurdolojî înterdisîplîner e û bi gelek zimanan ve dixebite rola van wergeran di avabûn û pêşveçûna Kurdolojiyê de girîng e. Di vê beşê de em ê rola wergerê ji bo Kurdolojiyê binirxînin. Ji bo wê, me rola wergerê di Kurdolojiyê de di bin du binbeşan de nirxand wekî *beriya Ekola Hawarê* ku îşaretî derketina kovara Hawarê dike û *piştî Ekola Hawarê*. Sedema senifandineke bi vî awayî ev e ku beriya Hawarê wergerên ku hatibûn kirin bi taybetî ji aliyê biyaniyan ve bû û rola wê cuda bû ku em ê li jêrê binirxînin; di Hawarê de û piştî Hawarê rola wê cuda bû.

2.2.1 Kurdolojî

Martin Van Bruinessen têgeha Kurdolojiyê bi du awayan pênase dike. Di serî de *Kurdolojiyê* wekî zanistek dibîne ku *hemû zanistên derbarê Kurdan de* dikevin nav. Herwiha lêkolînên derbarê dîrok, çand, ziman, wêje, strûktûrên civakî û antropolojîk yên civaka Kurdîstanê jî dikevine nav. Ji aliyekî din ve Kurdolojî tê

¹⁹¹ Öpengin h.g., r. 6.

wateya saziyên zanistî jî; yanê akademiyên zanistî, enstituyên perwerdeyê hwd.¹⁹² Salih Akin ji ber vê piralîbûna Kurdolojiyê, wê wekî *înterdîsîplîner* dibîne û li gorî pênaseya wî Kurdolojî "tevahiya dîsîplînên lêkolînê yên li ser gelekî ku zimanekî hevbeş diaxife rave dike. Ev dîsîplîn bi zanistiyên civakî û mîrovî ve girêdayî ne. Ango lêkolînên fizîkî yan kîmyayî di Kurdolojiyê de cih nagirin."¹⁹³ Dîsa li gorî Akin, tevî ku em Kurdolojiyê wekî *înterdîsîplîner* dibînin, ev taybetî têrê nake ku Kurdolojî bikeve statuya zanistê. Ji ber ku "[M]etod û teoriyên [ku] zanistê ava dikin di ware Kurdolojiyê de nîn in."¹⁹⁴

Dîsa, li gorî Akin ev dîsîplînên li jêr dikevî nav çepera Kurdolojiyê: zimannasî, filolojî, cografya, etnolojî, sosyolojî, antropolojî, ekonomî, tarîx, polîtîka, psîkolojî.¹⁹⁵ Her wiha çend navên din yên ji bo *Kurdolojiyê* tên bikaranîn wekî *kurdnasî* û *kurdzanî* jî hene; û di zimanên din de, di tirkî de *Kürt incelemeleri*, di îngîlîzî de *Kurdish Studies*, di almanî de *Kurdische Studien*, di fransî de *Etudes Kurdes* û di erebî de *dirasat kurdiyye* jî li dewsa Kurdolojiyê carna tên bikaranîn.¹⁹⁶ Li gorî Rohat, di çavkaniyan de heta sala 1934ê peyva lêkolînên kurdî hatiye bikaranîn û di sala 1934an de di kongreya Kurdolojiyê de peyva *Kurdolojiyê* yekem car hatiye bikaranîn.¹⁹⁷ Lê, li gorî agahiyên Bruinessen, peyva *Kurdolojiyê* di sala 1936an de di gotareke Basil Nikitin de hatiye bikaranîn û dibe ku ev yekem car be Kurdolojî ji aliyê rojavayîyan bi vî navî hatibe bikaranîn.¹⁹⁸

Li gorî pênaseyên li jor, du taybetmendiyên Kurdolojiyê bala mirov dikişîne. Ya yekem ew e ku Kurdolojî *înterdîsîplîner* e. Ya duyem jî Kurdolojî *hemû zanist û lêkolînên sosyal û mîrovî yên li ser Kurdan* ku têkiliya wan bi awayekî bi Kurdan re heye, dihevine.

¹⁹² Martin Van Bruinessen, **Kürdolojinin Bahçesinde**, Vate yayinevî, İstanbul 2009.

¹⁹³ Salih Akin, "Çend Pirsgirêkên Kurdolojiyê", **Kovara Bîr** (1), 30 Ocak 2011. <http://www.kovarabir.com/2011/01/salih-akin-cend-pirsgireken-kurdolojiye/> (09.12.2015)

¹⁹⁴ Akin, **h.g.**

¹⁹⁵ Akin, **h.g.**

¹⁹⁶ Rohat, **Kürdoloji biliminin 200 yıllık geçmişi (1787-1987)**, Köln, komkar yayınları, 1987. r. 9.

¹⁹⁷ Rohat, **h.b.**, r. 10.

¹⁹⁸ Martin Van Bruinessen, "Kurdish Studies in Western and Central Europea", **Wiener Jahrbuch für Kurdische Studien** 2, (18-96), Jahrgang 2014.

2.2.2 Rola wergerê di Kurdolojiyê de beriya Ekola Hawarê

Di warê Kurdolojiyê de werger cihekî taybet digire. Ji ber ku xebatên li ser Kurd û Kurdîstanê di serî de li ser milên oryantâlîst û mîsyoner û gerokan dimeşiya ku dihatin Kurdîstanê, derbarê mijarên curbicur de lêkolîn dikirin. Di van salên dawî jî dîsa peywendiya lêkolînerên derveyî Kurdîstanê bi saya xebatên wan yên li ser Kurdolojiyê bi Kurd-kurdî û Kurdolojiyê re xurtir bûye .

Hem ji ber ku Kurdolojî înterdîsîplîner e, hem jî ji ber ku gelek xebat û lêkolînên girîng yên Kurdolojiyê li derveyî welêt tên kirin, pêdiviya wergerê ji bo Kurdolojiyê girîngtir dibe.

Li gorî Bruinessen çavkaniyên ji bo Kurdolojiyê qedera sê-çar hezar sal beriya niha hebûn ku yên arkeolojiyê bûn; lê nivîsên ku mirov jê re bêje Kurdolojî, di sedsala 18an de dest pê dikin.¹⁹⁹ Herwiha eger em Kurdolojî û wergernasiyê bi hev ve girê bidin yanê wergerên ku di xebatên kurdologan de derbas dibe, nîşan bidin divê em dîsa biçin sedsala 18an û behsa *Maurîzîo Garzonî* bikin ku di sala 1787an de pirtûkeke gramera kurdî amade dike bi navê *Grammatica E Vocabolario Della Lingua Kurda [Reziman u Ferhenga Zimane Kurdî]* ku wekî yekem nimuneya gramera kurdî tê qebûlkirin û Garzonî di pirtûkê de wergera du duayên navdar yên Xrîstiyaniyê bi cîh dike. Navên duayan “Orizone Domenicale” ango Duaya Rebb û “Salutazione Angelica” ango Silaven Melekan e.²⁰⁰ Garzoniyê ku li Kurdîstanê mîsyonerek bû, ji aliyê kurdologekî din Basile Nikitin ve wekî "bavê Kurdolojiyê" jî tê qebûlkirin²⁰¹ û pirtûka Rohat "Kurdolojinin 200 yillik geçmişi" ku serhatiya 200 salên Kurdolojiyê dinirxîne bi sala 1787an dest pê dike, yanê bi Maurizio Garzoni; lê divê em vê jî bêjin ku beriya wî jî mîsyoner hebûn ku hatibûn Kurdîstanê.²⁰² Herwiha ev nimuneyên ku Garzonî wergerandin du duayên pir kurt in, lewma ji dewsa nimûneyeke wergera kurdî ya girîng, dibe nimuneyek kurt, belkî, ji bo temsîliyeta wergera kurdî di pirtûka wî de.

¹⁹⁹ Bruinessen, *Kürdolojinin Bahçesinde*, r. 177.

²⁰⁰ Serfiraz, *Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de(1844-1923)*, Peywend, Stenbol 2015, r. 200.

²⁰¹ Van Bruinessen, "Kurdish Studies in Western and Central Europea", *Wiener Jahrbuch für Kurdische Studien* 2, (18-96), Jahrgang 2014.

²⁰² Van Bruinessen, "Kurdish Studies in Western and Central Europea", *Wiener Jahrbuch für Kurdische Studien* 2, (18-96), Jahrgang 2014.

Ev duayên ku Garzonî wergerandibûn, gaveke pir piçûk bû ji bo wergerê. Lê wekî me di beşa beriya vê jî gotibû yekem nimûneyên wergerê ku wekî pirtûk tê çapkirin încîlek e ku di sala 1856an de tê wergerandin. Herwiha Mela Mehmudê Bazîdî beşeke Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî wergerandibû kurdî. Ev jî wekî destpêkên wergera kurdî dihate qebûlkirin.

Ger mirov pirsekî bike ku ew mînakên încîlê yên di para duyem ya sedsala 19an de ji aliyê mîsyoneran ve dihatin kirin ji bo kurdî û ji bo Kurdan çi îfade dikir? Li gorî Michael Rzepka ev wergerên ku di wê demê de hatin kirin nêrînek di derbarê Kurdan de guherand. Ev werger ji bo Ermeniyên ku di nav Kurdan de dijiyan û kurdî dizanîbûn, hatibû amadekirin. Armanç ji van wergeran ew bû ku Ermeniyên li herêmê dîne xwe nas bikin, herwiha kesên misilman jî bînin li ser dîne xwe. Bikaranîna kurdî ji aliyê Ermeniyên ve prestîjek ji kurdî re jî anî lê mirov nikare bêje ku ev wergerên încîlê yên wê demê hatin kirin tesîrek li ser ziman û çanda kurdî kirin.²⁰³ Li gorî Rzepka sedema wê ev bû ku wergerên ku hatibûn kirin zêde kêr nedihatin. Ji ber ku baş nehatibûn wergerandin ji ber sedemên wekî wergerandina bi zaravayên kurdî yên curbicur, kêmasiya danûstandina wergêr bi civakê re hwd. Yanê pirsgirêka wergerên wê demê ne tenê ji ber sedemên zimanî bûn, herwiha ji ber sedemên sosyokultûrel jî bûn.²⁰⁴

Di nav biyaniyan de yên ku alîkariya avabûna Kurdolojiyê kirin navê Alexander Jaba derdikeve pêş ku li Erzurumê digel Mele Mehmûdê Bazîdî konsolosê Rûsî bû û gelek kar kirin ji bo Kurdolojiyê. Mînakeke girîng ku mirov ji karên wan ê li ser wergerê bide ev e ku bi alîkarî û teşwîqa wî Mele Mehmûdê Bazîdî di sala 1858-59an de beşek ji Şerefnameyê wergerande kurdî. Jaba hin metn jî wergerandine rusî.²⁰⁵

²⁰³ Martin Rzepka, "Protestants among Kurds and some problems of the Bible translations into Kurdish in the 19th Century", *Orientalia Christiana Cracoviensia* 1,(87-92), 2009.

²⁰⁴ Rzepka, "Protestants among Kurds and some problems of the Bible translations into Kurdish in the 19th Century", *Orientalia Christiana Cracoviensia* 1, (87-92).

²⁰⁵ Bruinessen, *Kürdolojinin Bahçesinde*, r. 175.

Basil Nikitin ku di navbera salên 1915-1918an de li Urmiyê wekî konsolosê rûsî xebitiye, çîrokeke bi navê Suto û Tato²⁰⁶ werdigerîne îngîlîzî. Ev hîkayeya Nikitin behs dike di navbera Oramarê(li Colemêrgê) û Rekanê(li Kurdîstana başûr) derbas dibe ku derbarê şerê di navbera du eşîrên Kurdan de ye. Nikitin ev çîrok ji mamosteyê xwe Mele Seîd guhdar kiriye û di sala 1920an de digel E.B. Soane werdigerîne îngîlîzî. Li gorî Nikitin ev çîrok sedî sed rast e ji ber wê jî wê fêdeyê bide kesên ku piştî wî herin nav Kurdan de bixebitin²⁰⁷. Lewma, vê çîrokê werdigerîne.

Digel ku armanca kesên ku wê demê li ser kurdî dixebitîn bêtir stratejîk bû yanê sedemên wekî mîsyonerî bû, dîsa jî em dibînin ku bi qeydkirina belgeyên ku kêrî dîrok û zimanê kurdî tên di avabûna Kurdolojiyê de alikariyeke mezin dan. Jixwe Bruinessen; Nikitin, Jaba û Minorsky wekî avakarê kurdolojiya modern terîf dike.²⁰⁸ Herwiha xebatên wan, ji bo lêkolînên li ser zimên û li ser wergerê dokumentên zimanî ne. Armanca Garzonî jî mîsyonerî bû û armanca amadekirina pirtûka wî ya rêzimanê ew bû ku karê kesên piştî wî tene herêmê hêsantir bike; li gorî Bruinessen xebata Garzonî zanistî nebû û xebatên zanistî yên Kurdolojiyê di sedsala 19an de bi A. Jaba, V. Minorsky û B. Nikitin dest pê dikin.²⁰⁹

Herçiqas ev xebatên wergerî yên navborî, ji ber ku ji bo Kurdolojiyê dokument in û ji wî aliyê ve xebatên girîng bin jî, mirov nikare bêje di warê wergera kurdî de nimuneyên serkeftî û bilind bûn. Digel ku armanca wan ya sereke ji wergerandina wan metnan ji ber vê sedemê bû ku yên wî zimanî nizanin bikaribin bixwînin -jixwe ev wekî armanca sereke ya wergerê tê qebûl kirin- ji aliyê wergernasiyê ve ihtîmaleke biçûk e ku bibin mînakên baş. Ji ber ku ji wergerandina wan metnan armanca sereke ew bû ku kesên wî zimanî nizanin, bi wan metnan têbigihêjin, ne ew bû ku bi hunerî wan metnan wergerînin zimanekî din.

²⁰⁶ Basil Nikitine, E.B. Soane. "The tale of Suto and Tuto", **Bulletin of the School of Oriental Studies**, Vol. 3, No. 1. (69-106), University of London, <http://www.jstor.org/stable/607166> (10.12. 2015)

²⁰⁷ Nikitine û Soane, **h.b.**, r. (69-106)

²⁰⁸ Bruinessen, **Kürdolojinin Bahçesinde**, r. 173.

²⁰⁹ Bruinessen, **Kürdolojinin Bahçesinde**, r. 177.

Mirov dibîne ku di kurdî de ji aliyê hunerê ve wergerên tekûztir, di salên 1930an de dest pê kir . Xebateke Erebe Şemo *Koçekê Derewîn* di sala 1931ê hate çapkirin û em dikarin bêjin ku piştî Mela Mehmûdê Bayezidî ev wergera nimuneya wergereke edebî û xwedan endîşeyeke zimanî ye.²¹⁰ Lê ev berhema rasterast wergerekê zêdetir lêanînek e wê pirtûkê ye.

Berhemên xwedan endîşeyeke zimanî ku kêrî wergera kurdî tên, em dikarin bibêjin, piştî salên 1930an dest pê kir . Ji ber ku berhemên xwedan endîşeyeke zimanî bûn, rola wan jî li gorî wê guherî, bêtir ji bo avakirina, pêşvebirina zimên û edebiyata kurdî hatin wergernadin. Li jêrê em ê van berheman binirxînin.

2.2.3 Rola wergerê di Kurdolojiyê de piştî Ekola Hawarê

Ekola Hawarê wekî di hemû warên kurdî û Kurdolojiyê de tesîrker bû, ji bo wergerê jî nimuneyên girîng pêşkêş kir ku ji aliyê wergerê ve ev nav derdikevin pêş: Celadet Alî Bedirxan, Qedrîcan, Osman Sebrî, Kamiran Alî Bedirxan û Nureddîn Zaza.²¹¹ Armanca Ekola Hawarê pêşdebirina ziman, wêje û çanda kurdî bû. Di vî warî de rola didane wergerê û lewma ji zimanên din bo kurdî berhem werdigerandin.

Rola wergerê di kurdî de piştî salên 1930an hêdî hêdî diguhere; û werger digel rola xwe ya ku mirov dikare *wekî metneke navbeynkar yan jî yeke pedagojîk* bibîne -wekî ku em ji Gramera Garzonî de dibînin- roleke din jî hilda ser xwe wekî *wergera ku bêtir xizmeta zimanê kurdî û wergera kurdî dike*. Di guherîneke bi vî awayî de, digel pêşdeçûna şert û mercên cîhanê û yê Kurdan, endîşeya rewşenbîrên Kurdan li ser zimên jî pareke girîng hilda.

Mirov dikare bêje ku wergerên di Hawarê de çend rol hildane ser xwe wekî agahdarkirina Kurdan, pêşdebirina zimên, danasîna çand û wêjeyên cîhanê ji bo miletê kurd. Em dikarin bêjin ku wergerên ji derveyî wêjeyî bêtir ji bo agahdarkirina Kurdan bû, lê yên wêjeyî bêtir ji bo pêşdebirina ziman û danasîna çandên din ji bo miletê kurd bû.

²¹⁰ Öpengin, **h.g.**, r.5.

²¹¹ Nivîsên Nureddîn Zaza yên di Hawarê de bêtir Lêanîn bûn.

Celadet Alî Bedirxan ku li ser wergerandina metnên ji zimanên biyanî di Hawarê de nivîsekî pêşkêş dike, sedema wergerandina metnên biyanî girîng dibîne. Li gorî Celadet sedema yekem ew bû ku biyanî wekî *çavekî ku ji derveyî Kurdistan in li Kurdistan dînehêrin*; Lewma dikarin kêmaniyan bêtir tespît bikin. Ya duyem jî ew e ku *ji bo dîtina kêmaniyên welat û miletekî re pispor lazim in, nemaze jî pisporên biyanî da ku her tiştî bi çavekî bêalî û bêmeyeldarî bibînin.*²¹² Ji ber van sedeman em dikarin bêjin ku Celadet ji aliyekî ve rola wergerê wekî *agahdarkirin û ronîdarkirina miletê kurd* jî dibîne. Herwiha Celadet metnên wêjeyî jî ji zimanên din werdigerîne kurdî ku yek ji wan pirtûkeke ji eslê xwe Îngîlîzî ye ku ji Fransî werdigerîne kurdî. Ev gotinên Celadet bi taybetî ji bo wan metnên derbarê Kurdistan de ne, hatine gotin.

Di Hawarê de nivîseke ku li ser "yekitiya zimanê kurdî" di bin nav yan jî maxlasê "Elî Seydoyê Gewrî" hatiye nivîsandin, ji bo gihandina zarên kurdî yek ji madeyan jî wekî *wergerandina kitêbên biyaniyan ên hêja li zarê xwe* pêşniyar dike ku li vir mirov dibîne hêj wê demê girîngiya wergerê ji bo zimanê kurdî hatiye zanîn.²¹³

Digel van çalakiyên mezin ji bo Kurdolojiyê û zimên ku yên piçûk in ji bo wergera kurdî, ji 1980yan vir ve hem hejmara berhemên wergerê zêdetir bûye, hem jî werger ji bo Kurdolojiyê girîngtir bûye. Ji ber ku kesên ku karên xwe li ser wan mijarên ku bi Kurdistan re elaqedar e dimeşînin, bi taybetî di akademiya cîhanê de berbelav bûne. Lewma, ev hem kurdologan mecbûrî hînbûna zimanên ji bilî kurdî dike, hem jî wan mecbûrî wergerê dike ku ev wergerandin digel di pêvajoya xwendina wan ya berhemekî, yanê wergerandina ku xwebixwe dikin; dikare bibe wergerandina nivîskî ku rasterast ji berhemekî dikin. Ji vî aliyê ve mirov nikare bêyî wergerê Kurdolojiyê bifikire.

Werger ji bo pêşketina ziman, çand, hunerê û hwd. girîng e. Ji ber ku ziman bi saya wergerê tiştên ku di wî zimanî de tune ye hildide nav zimanê xwe û dike malê xwe. Ji bo kurdolojiya ku wekî înterdîsîplîner dixebite bi şîrîkiya dîsîplînen wekî

²¹² Hawar, Cild 1, Hejmar 1-23 (1932-1933), amd. Firat Ceweri, weş. Nudem, Stocholm, 1998, r. 383.

²¹³ Hawar, Cild 1, Hejmar 1-23, r. 447.

zimannasî, antropolojî, çandnasî, edebiyat, dîrok, polîtîka, psîkolojî û hwd. werger hêj muhîmtir dibe. Ji ber ku bi wergerê îmkân çêdibe ku mirov bigihêje berhemên bi van zanistan ve girêdayî.

Herwiha xaleke din jî di Kurdolojiyê de heye ku di van salên dawî de wergerê ji bo Kurdolojiyê muhîmtir dike. Bi taybetî bi avabûna enstîtuyên kurdî re pêdiviya wergerê ji bo Kurdolojiyê bêtir xuya bû. Ji ber ku ji ber nebûna berhemên teorîk yê kurdî, mirov mecbûr dimîne ku van rasterast ji tirkî bixwîne. Lê xwendina wan ji tirkî fêdeyekî nade zimanê kurdî, lewma çalakiyeke wergerê di Kurdolojiyê de pêwîst e.

Rola wergerê ku di destpêkê de di warê Kurdolojiyê de wekî navgînek ji bo ragihandina mîsyoneran, yan jî wekî bi hewlên mîsyonerî pêk dihat, di serdema Hawarê û piştî wê bi endîşeyeke zimanî û ji bo agahdarkirina milletê kurd dihat kirin. Iroj jî dîsa rola wergerê ji bo Kurdolojiyê geşedana zimên, pêşdebirina wergera kurdî, îspatkirina karîna kurdî ye.

2.3 WERGERA PEYVÊN KULTÛR-SPESÎFÎK JI METNÊN KURMANCÎ LI GORÎ RÊBAZÊN EHLÎKIRIN û BIYANÎKIRINÊ

Di vê binbeşê de em ê çend mînakên ku me ji wergerên zimanên din bo kurdî hilbijartî li gorî rêbazên Venuti -ehlîkirin û biyanîkirin- binirxînin. Berê em ê derbarê van rêbazan de agahiyan bidin, paşê jî li gorî van rêbazan, herwiha stratejiyan nimûneyên me hilbijartî, binirxînin.

2.3.1 Ehlîkirin û biyanîkirin

Lawrence Venuti teorîsyenekî Amerîkî yê wergernasiyê ye ku bi nêzîktêdayîneke çandî û îdeolojîk li ser wergerê xebitiye. Venuti bi nêzîktêdayîneke çandî *têkiliyên hêzê* nirxandiye.

Stratejiyên wergerê yê ku Venuti derdixe pêş *biyanîkirin* û *ehlîkirin* in. Beriya wî jî ev stratejî dihatin zanîn lê wî derxiste pêş. Venuti ev herdu stratejî li ser

fikrên teorîsyenê Alman Friedrich Schleiermacher ava kiriye. Schleiermacher ji bo wergêran du rêyan pêşkêş dike. Wergêr yan wê xwendevan ber bi nivîskar bihere ku li vê derê armanc ew e ku xwendevan rêya xwe bixwe bibîne; yan jî wê nivîskar ber bi xwendevan bihere, li vê derê jî wergêr wê wusa wergerîne ku xwendina berhemê ji bo xwendevan hêsantir bibe.

Di ehlîkirinê de armanca wergêr ew e ku metnê wusa wergerîne ku dema xwendevan metnê dixwîne, nizanibe ku ew metna dixwîne werger e yan na. Li gorî vê jî divê çiqas ji destê wergêr hat metnê nêzî ziman û çanda armanc bike, qalib û peyvên çanda armanc bikar bîne û wergerê bike malê wî zimanî. Bi vî awayî jî wergêr xwe di metnê de nade xuyakirin yanê *nedîtîni* (*invisible*) dibe û metn herîkbar dibe; nivîskar ber bi xwendevan diçe. Bi gotineke din ehlîkirin, lêanîna peywenda çandî yan jî têgehên kultûr-spesîfik in. Yanê wergêr hewl dide ku metna zimanê armanc ji bin bandora metna jêder xilas bike. Ji ber vê jî çiqas ji destê wî were têgeh û peywenda zimanê jêder adapteyî zimanê armanc dike.

Di biyanîkirinê de jî wergêr xwe di metna wergerandî de dide xuyakirin û xwendevan jî hişyar dike ku ew metna dixwîne ne metna orjînal e, werger e; yanê bi gotina Venuti, metn xwendevan dişîne derveyî welêt (abroad)²¹⁴ û bi gotina Schleiermacher, wergêr, xwendevanan ber bi nivîskar dibe. Wergêr di vê rêbazê de *nedîtîni* (*invisible*) dibe. Ji bo ku vê bike jî hin qalib, peyv, taybetmendiyên ziman û çanda jêder di metna armanc de naguherîne, dide xuyakirin. Biyanîkirin, aliyê cih, nav hwd. ve parastina peywenda çandî ya metna orjînal e.

Nîqaşên li ser ehlîkirin û biyanîkirinê jixwe hebûn, lê nîqaşên ku li ser van dihatin kirin ji aliyê zimanî ve bûn, yanê nîqaşên zimannasiyî bûn. Lê piştî vegeerîna çandî, 1980yan, nîqaşên ku li ser van herdu têgehyan hatine kirin êdî *çandî û polîtîk* bûn.²¹⁵ Aliyê wan yê polîtîk jî Venuti rave dike. Venuti di wê baweriyê de ye ku çanda anglo-amerîkî ji ber meyla wan ya emperyalist, stratejiya ehlîkirinê çêtir dibîne. Herwiha îddîa dike ku pratîkên bi vî awayî wergêran *nedîtîni* dike û statuya

²¹⁴ Munday, **Introducing Translation Studies**, r. 147.

²¹⁵ Wenfen Yang, "Brief Study on Domestication and Foreignization in Translation", **Journal of Language Teaching and Research**, Vol. 1, No.1, (77-80), 2010. <http://ojs.academypublisher.com/index.php/jltr/article/viewFile/01017780/1511> (19.11.2015).

wan xirabtir dide nîşandan. Ji ber vê, Venuti biyanîkirinê pêşniyar dike ku wergêr xuyayî dike û bi vî awayî jî wergêr xwe di wergerê de dide xuyakirin.²¹⁶

Ev fikrên Venuti wekî îtîraza li hemberî dagirkerkirina zimanê îngîlîzî û çanda anglo-amerîkî ya ziman û çandên din bûn. Lewma Venuti di wergerê de biyanîkirinê tercîh dike. Ji ber ku Venuti dixwaze ku dema metnek ji bo îngîlîzî hate wergerandin çanda xwe di wî zimanî de bide xuyakirin û bi vî awayî bi gotineke din di bin hegemonyaya çand û zimanê îngîlîzî xilas bibe. Lewma nêrîna wî polîtîk e.

Venuti ev nêrînen xwe li ser rewşa wergerên ji zimanên kêmtir-domîne (less dominated) bo îngîlîzî avakiriye. Lê ger mirov li ser rewşa wergera kurdî bifikire, tişteki jî vê cudatir derdikeve. Ji ber ku vê gavê tirkî û îngîlîzî li hemberî kurdî domîne ne û ev beşa jî ji wergerên ji tirkî û îngîlîzî bo kurdî hatiye kirin; yanê ji du zimanên ku li hember kurdî domîne ne.

Ji ber ku rewşa kurdî cuda ye, meyla wergêrên kurdî li ser ehlîkirinê ye ku çiqas ji destê wan tê, berhemên wergerî dikin malê zimanê kurdî û ziman û şewaza kurdî diparêzin ku xwendevan jî nezaniye ew metna dixwîne werger e. Ji ber vê mirov dikare bêje ku digel ku Venuti biyanîkirin dixwast, wergêrekî kurd wê bêtir bixwaze ku bi rêbaza ehlîkirinê wergerîne ji bo ku, bi awayekî, hegemonyaya zimanê jêder qebûl neke.

Têgeheke ku Venuti di van herdu stratejiyên xwe de li ser disekine jî "herîkbarî" ye. Ji ber ku ger metn bi ehlîkirinê hatibe wergerandin wê gavê wergêr di metnê de nayê xuyan, yanê herîkbarî wergêr nexuyayî dike ku ev jî ji aliyê Venuti ve "hibijartineke neefîk e" ji ber ku bi vî awayî metna jêder, herwiha wergêr, di wergerê de nayê xuyan.²¹⁷

Venuti di xebatên xwe de li ser wergerên ku ji zimanên kêmtir-domîne (less dominated languages) ber bi îngîlîzî nixand. Lê ev xebata ku em dikin ji ya Venuti vediqete, ji ber ku em ê li ser wergerên ji îngîlîzî û tirkî bo kurdî bixebitin. Bi vî

²¹⁶ Goran Schmidt, "Foreignization and domestication in the Croatian translations of Oscar Wilde's *The Picture of Dorian Gray*" *Jezikoslovlje*, Vol. 14, No. 2-3. (237-548), 2013. <https://www.academia.edu/7353017>. (11.11.2015)

²¹⁷ Palumbo, **h.b.**, r. 48.

awayî jî îngîlîzî û tirkî li hemberî kurdî dibin zimanên domîne. Lewma bala vê beşê ji wergerên zimanên kêmtir-domîne ber bi zimanên domîne diguhere û tê li ser wergerên ji zimanên domîne(îngîlîzî û tirkî) ber bi yên kêmtir-domîne (kurdî).²¹⁸

Di vê beşê de em ê li ser hêmanên kultûr-spesîfik bisekinin. Di nîqaşan de peyvên sereke ku wergerandina wan dijwar bû ku ji wan re peyvên "kultûr-spesîfik" tê gotin, ji ber afdiya wan ya çandekî zehmet bû ku bêne wergerandin. Yek ji wan kesên ku li ser van peyvan xebitî Javier Franco Aixelá bû. Li gorî Aixelá, di wergerandina încîlê ji bo zimanên din pirsgirêk derdikevin. Aixelá mînaka berxê (lamb) dide ku dibe ku di çanda zimanên din de ev peyv tune be, wekî di çanda eskîmoyan da; yan jî hebe jî wateya wê ya 'bêgunehî-mesûmî' tune be. Ji ber vê yekê wergerandina peyva "berx"ê ji Îbranî bo eskîmo wê pirsgirêkeke wergerê derxe, pirsgirêka wergera hêmaneke kultûr-spesîfik. Lê ger ji bo îspanyolî yan jî ji bo îngîlîzî bê wergerandin heman pirsgirêk çênabe, ji ber ku heman wateya vê peyvê di wan zimanan de jî heye.²¹⁹ Lewma, em ê di peywenda ehlîkirin û biyanîkirinê de mînakên kultûr-spesîfik yên ji çend pirtûkan binirxînin ji bo ku rêbazên ku di wergerandina van mînanan de hatine bikaranîn derxin meydanê û bibînin ka wergêr di van mînanan de ji ehlîkirin û biyanîkirinê kîjan bikar aniyê. Herwiha em ê hewl bidin ku armanca wergêr ji bo bikaranîna stratejiyan jî binirxînin. Lê em ê tenê di peywenda metnên ku me dayî de biaxivin, ji ber ku nirxandina tevahiya pirtûkên ku me hîlbijartî derbasî derveyî sînorê vê tezê dibe.

Stratejiyên wergerê hene ku di metna wergerê de tînan bikaranîn. Beriya em derbasî nirxandina pirtûkan li gorî ehlîkirin û biyanîkirinê bibin, divê em van stratejiyan bidin nasîn.

2.3.2 Çend stratejiyên wergerê ku ji bo hêmanên kultûr-spesîfik di ehlîkirin û biyanîkirinê de tînan bikaranîn

Divê em behsa stratejî/prosedurên wergerê yên ku di wergernasiyê de tînan

²¹⁸ Ev fikra ji teza Sinem Sancaktaroglu Bozkurt hatiye standin. Bnr. Sancaktaroglu Bozkurt, **h.b.** Û heman rewşê li ser zimanê tirkî diceribîne herwiha di peywenda hegemonyayê de jî pirtûkan dinirxîne.

²¹⁹ Javier Franco Aixelá, "Culture specific items in translation", **Translation, Power, Subversion**, (52-78.), Multilingual Matters, UK1996.

bikaranîn, bikin ji bo ku em bikaribin peyvên kultûr-spesîfik yên di metnan de li gorî ehlîkirin û biyanîkirinê dahûrîn.

Senifandina hêmanên kultûr-spesîfik ji aliyê teorîsyenan ve bi awayên cihê cihê hatiye kirin. Javier Franco Aixelá di gotara xwe "Hêmanên kultûr-spesîfik di wergerê de"²²⁰ de ev hêmanên kultûr-spesîfik senifandine; herwiha Peter Newmark jî hin rêbaz pêşkêş kirine. Di nirxandina mînakên di peywenda ehlîkirin û biyanîkirinê de em ê hemû nebe jî hin stratejiyên van herduyan bişopînin.

Li jêrê em ê hin stratejiyên wergerê yên ku wê di vê xebatê de kêrî me werin yên ku Aixelia ji bo peyvên kultûr-spesîfik pêşkêş kirine, û yên Newmark pêşkêş kirine, bidin nasîn.

Dubarekirin (Repetition): Li vir wergêr, dema ku werdigerîne çiqas ji destê wî were heman hêmanê diparêze, naguherîne. Wekî mînak di pirtûkekê de ku peyva 'New York'ê wergerînin kurdî dîsa wekî 'New York' wergerînin, li vir peyvê dubare dikin. Li gorî Aixelia ev stratejî di wergerê de tesîreke arkayîk û egzotîk çê dike.²²¹ Yanî dema ev stratejî hate bikaranîn biyanîkirin heye.

Lêanîna ortografîk-guherîn (Orthographic adaptation)²²²: Di vê stratejiyê de wergêr peyvê li gorî bilêvkirina, nivîsîna zimanê armanç diguherîne. Armanca bikaranîna lêanîna wergerê ew e ku di xwendevanê ZA de tesîreke wekî zimanê metna orjînal çê bike, yanê bi awayekî li vir ehlîkirin tê bikaranîn.²²³

Ravekirin (Explanation): Wergêr, ew peyva ku bikar tîne hinekî rave dike. Aixela ravekirin kiriye du beşan:

- **Ravekirina derveyî metnê (Extratextual gloss):** Wergêr bi jêrenotan, yan jî bi parantezan ew hêmana ku aîdî çandeke din e rave dike.

- **Ravekirina navmetnê (Intratextual gloss):** Di vê stratejiyê de wergêr

²²⁰ Aixelá, **h.b.**

²²¹ Aixelia, **h.b.**

²²² Lêanîn herwiha rêbazeke wergerê ye, rêbaza herî serbest e ku gel caran tema, karakter, fikr tê parastin û metnê cardin tê nivîsandin.

²²³ Ana Fernandez Guerra, "Translating Culture: problems, strategies and practical realities", **Journal of literature, culture and literary translation**, No 1 year 3, 12/2012. r. 7.

hêmana ku werdigerîne rave dike. Dibe ku çend peyvan lê zêde bike. Wekî mînak navê otelekî wekî 'St Mark' di metnê de derbas be wergêr wê wekî 'Otela St. Mark' werdigerîne ji bo ku xwendevanan hayedar bike ku ev otelek e, yanê peyvê rave dike.

Notralizasyon (Neutralization): Li dewsa vê, navên wekî "*gelempêrîkirin*" (*generalization/universalization*) jî tê bikaranîn.²²⁴ Li dewsa peyva ku eger rasterast bê wergerandin wê di çanda armanc de neyê fehmkirin, peyveke "*gelempêrî*" tê bikaranîn. Wekî mînak di hevoka 'Kendine bir *range rover* aldî.' de dema wergêr bifikire ku xwendevan aşinayê peyva *range rover*ê nîn in û nizanin ku ew cureyeke cîpan e, dewsa wê dikare bêje "Wî ji xwe re *cîpek* stand". Bi vî awayî notralîze dike.

Wergera rasterast (Literal translation): Dema werdigerîne bi heman awayî werdigerîne û rêza peyvan xira nake.

Jêbirin (Deletion/ommission): Dema ku wergêr dibîne ku ew peyva ku wê bikar bîne zêde kêr nayê; bikar bîne jî neyne jî tiştek naguhere, carna jî ger wê peyvê bikar bîne xwendevan ténagihêje yan jî wate hinekî şêlû dibe, wê demê wergêr wê peyvê yan jî frazê bikar nayne.

2.3.3 Dahûrana mînakên wergerên kurdî li gorî ehlîkirin û biyanîkirinê

Di vê binbeşê de em ê dahûrana mînakên ku me ji pirtûkên wergerî yên kurdî hilibijartine bikin. Ji ber ku dahûrana zêdetir nimûne ji van pirtûkan hem ji aliyê cih hem jî ji aliyê rêbazê ve dûrî armanca tezê ye em ê ji her pirtûkê paragafeke ku nimûneyên çandî bêtir tê de derbas dibin, hilibijêrin û li gorî ehlîkirin û biyanîkirinê binirxînin.

1. Happy Prince, Oscar Wilde - Prensê Bextewar, wergêr: Samî Hezil

Çend mînakên li jêr me ji wergera Samî Hezil ya pirtûka Oscar Wilde, *Happy Prince*²²⁵ hilda ku bi navê *Prensê Bextewar*²²⁶ wergerandiye. Em ê jî bi awayekî

²²⁴ Bnr. Aixelá, **h.b.**

²²⁵ Oscar Wilde, **Happy Prince**, (Çapa li ser internetê), [pinkmonkey.com/dl/library1/happy.\(26.12.2015\)](http://pinkmonkey.com/dl/library1/happy.(26.12.2015))

²²⁶ Oscar Wilde, **Prensê Bextewar**, wer. Samî Hezil, Stenbol, Sîtav, 2015.

teswîrî hin nimûneyan şîrove bikin.

Metn:

“Who are you?” he said.

“I am the **Happy Prince**.” “Why are you weeping then?” asked the Swallow; “you have quite drenched me.” “When I was alive and had a human heart,” answered the statue, “I did not know what tears were, for I lived in **the Palace of Sans Souci**, where sorrow is not allowed to enter. In the day time I played with my companions in the garden, and in the evening I led the dance in the **Great Hall**. Round the garden ran a very lofty wall, but I never cared to ask what lay beyond it, everything about me was so beautiful. **My courtiers** called me the Happy Prince, and happy indeed I was, if pleasure be happiness. So I lived, and so I died. And now that I am dead they have set me up here so high that I can see all the ugliness and all the misery of my city, and though my heart is made of lead yet I cannot choose but weep.” “What, is he not solid gold?” said the Swallow to himself. He was too polite to make any personal remarks out loud.(3-4)

Werger:

“Tu kê yî?” wî pirsî.

“Ez **Prensê Bextewar** im.”

“De îja tu çima digirî?” pirsî Hehecîkî; “te ez kirim şêlav.”

“Wextê ez zindî bûm û dilekî min ê mirovî hebû,” bersivand peykerê, “min nedizanî ka rondik çî ne, lewre ez di **Qesra Sans-Souciyê** de dijiyam, ew warê ku ji xemgîniyê re qedexe bû ku bikeve hundir. Bi roj min bi hevalên xwe re di nav baxçe de dileyîst, êvarê jî ez sergovendê reqasa li **Sivdera Mezin** bûm. Li dora baxçe rîyeke fireh derbas dibû, min qet bala xwe nedidayê bê ka ji wê riyê wêdetir çî heye, jixwe her tişta derûdora min pir bedew bû. **Hevalên min** ji min re digotin Prensê Bextewar û bi rastî jî ez bextewar bûm, eger ku bextewarî bê wateya zewqê. Bi vî awayî ez jiyam û wisa jî mir im. Piştî mirina min, wan jî ez danîm cihekî wiha bilind da ku ez hemî kirêtî û perîşaniya bajarê xwe bibînim û her çiqas dilê min ji risasê (qurşûnê) çêkirî be jî ez nikarim xwe bigirim û hema digirîm.”

“Çi! Ew ne ji zêrê saf e?” Hehecîkê biçûk di ber xwe de got. Lê yekî gelek

kubar bû ku gotineke wiha bideng bibêje.(12-13)

Dahûran:

Happy Prince, herwiha serenavê pirtûkê ye jî û wekî "**Prensê Bextewar**" hatiye wergerandin. Wergera rasterast hatiye bikaranîn. Tenê peyv hatine wergerandin ji bo kurdî. The **Palace of Sans Souci** wekî **Qesra Sans-Souciyê** hatiye wergerandin. Wergêr peyva "palace" wekî "qesr" wergerandiye lê di navê qesrê de, yanê di "Sans- Souci" de guherîneke ortografîk çênekiriye, adapteyî kurdî nekiriye. Lê jixwe bi saya peyva qesrê wateyeke zelal derdikeve. Li vir hem ehlîkirin hem jî biyanîkirin hatiye bikaranîn. Yanê wergereke hibrit e (hybrid). Ji ber ku peyva qesrê hatiye wergerandin, lê Sans-Souci wekî xwe maye.

Great Hall wekî **Sivdera Mezin** hatiye wergerandin û wergereke rasterast e. "Great Hall" di çaxa navîn de odeya sereke ya qesran, manastiran bû ku tê de nan dixwarin, mihîrcan lidar dixistin û piştî çaxa navîn jî ev ode dîsa di qesran de hatin çêkirin.²²⁷ Herçiqas ev peyv zêde nêzî xwendevanekî kurd nebe jî, xwendevanekî kurd nezanibe jî ka ev Sivdera Mezin çî ye; mirov di nav hevokê de fehm dike ku ev der cihêkî mezin e ku lê govendê digirin, dileyîzin. Lewma wateya wê zelal dibe. Ev peyv jî hatiye ehlîkirin(domesticated) û xwendevan têdigihêjin ji ber ku nêzî çanda wan bûye.

Peyva "**courtier**" tê wateya "endamên qesra qral".²²⁸ Çend hevok beriya vê peyvê, wergêr ji bo peyva "companion" jî peyva "heval" bikar aniye. Li vir jî dîsa dewsa "**my courtiers**" peyva "**hevalên min**" hatiye bikaranîn. Wergêr li dewsa 'endamê qesrê' yan jî 'nedîm' peyv notralîze(gelemperî) kiriye ji bo ku metnê nêzî xwendevanan bike, yanê ehlîkirin bikar aniye.

Ku li gorî dahûrana wan mînak em biaxivin, em ê bêjin ku meyla wergêr li ser ehlîkirina wergerê ye. Armanca bikaranîna ehlîkirinê jî ew e ku xwendevan wusa hîs bikin ku metna orîjînal dixwînin ku werger li ber çavê wan wekî metneke xerîb nexuyê. Ji ber wê, wergêr ji bikaranîna peyv, qalibên derveyî kurdî dûr disekine. Ev

²²⁷ bnr. **Encyclopædia Britannica**, Great Hall.

²²⁸ bnr. **Merriam-Webster.com**, courtier.

jî nîşan dide ku hêmanên wekî xwendevan û armanca wergêr dibe sedema hilbijartina peyv û teknîka ku wergêr bikar tîne.

2. Benim adım Kırmızı, Orhan Pamuk - Navê Min Sor e, wergêr: Mustafa Aydoğan.

Vê nimûneya li jêrê em ê ji romana Orhan Pamuk ya *Benim Adım Kırmızı*²²⁹ hildin ku bi navê *Navê Min Sor e*²³⁰ ve ji aliyê Mustafa Aydoğan ve hatiye wergerandin.

Metn:

"**Aslanım, delikanlım**, hakikaten dedikleri kadar yakışıklıymışsın sen," dedi. "Evli misin, bekâr mısın, gizli sevgilin için İstanbul'un en başta gelen bohçacısı Ester'den **ipek mendil** alır mısın?"

"Yok."

"Atlardan bir kızıl kuşak?"

"Yok."

"Yok, yok, deme bakayım! Senin gibi bir aslanın nişanlısı, gizli sevgilisi olmaz mı hiç? Kaç gözü yaşlı kız senin için cayır cayır yanıyordur kimbilir?"(40)

Wergêr:

Egîdê min, xortê delal, bi rastî jî tu bi qasî ko tê gotin, çeleng î, tu zewicîyî, azib î? Ma tu ji bo yara xwe ji Estera sereka buçikfiroşên Stenbolê **destmalekê** nakirî?

-Na.

-Pişteke sor a atlasî?

-Na.

Hela bisekine, nebêje na! Ma qet dibe ko şêrekî wek te bê destgirtî, bê yar be?

²²⁹ Orhan Pamuk, **Benim adım kırmızı**, (Çapa lı ser internetê) kitabxana.net/files/books/file/1331208008.(26.12.2015).

²³⁰ Orhan Pamuk, **Navê min sor e**, wer. Mustafa Aydoğan, Doz û Nefel, Stenbol û Stocholm, 2002.

Kî dizane, bê te agir bi dilên çend keçikan xistiye û ji bo te digirîn? (53)

Dahûran:

Di wergerandina metnên ji tirkî ji aliyekî ve ji metnên zimanekî din hêsantir e. Ji ber ku hin detay hene ku alikariya wergêr dike hêsantir wergerîne. Xwendevan jixwe zimanê tirkî dizanin û aşînayê çanda tirkî ne, lewma hem di hişê wergêr de ev yek heye hem jî xwendevan xwe zêde xerîb hîs nakin dema ku wergereke ji tirkî dixwînin; ji ber ku çanda wan dizanin.

Di metna jor de peyvên wekî "**aslanım**","**delikanlım**" derketine pêşberî wergêr ku ya yekem wekî "**egîdê min**", ya duyem jî wekî "**xortê delal**" wergerandiye. Di herdu frazan de jî wergêr peyv adapteyî zimanê kurdî kirine û di herduyan de jî ehlîkirin bikar aniye.

Di peyva "**ipek mendil**" de wergêr tenê peyva "**destmalek**" bikar aniye. Yanê cureya destmalê nenivîsiye. Stratejiya deletion(ommission-jêbirin) bikar aniye û peyva hevrişîmê jê biriye. Tirk di dema osmaniyan de evîndariya xwe bi cure cure mendîlan dianîn ziman û her mendîl jî dihate maneyekê, ya şîn tiştê digot, ya sor tiştêkî din, ya hevrişîm jî tiştêkî din. Herwiha di nav Kurdan de jî "destmalên hevrişîm" pir bûn û reng rengî bûn wekî sor û kesk; pembe, û cure cure rengên din. Dema xortek evîndarê keçikekî bû, jê re "destmaleke hevrişîm" dişand. Lewma mîrov dikare nîqaş bike ku bikaranîna "destmala hevrişîm" wê wate xurtir bikira. Herwiha li vir jî ehlîkirin hatiye bikaranîn.

3. Of Mice and Men, John Steinbeck - Mişk û Mirov, wergêr: Firat Cewerî

Em ê nimûneyekî jî ji pirtûka *Of mice and Men*²³¹ ya John Steinbeck hildin ku ji aliyê Firat Cewerî ve bi navê *Mişk û Mirov* hatiye wergerandin û ji aliyê peyvên çandî ve zef dewlemend e ku tê de bi sedan ji wan peyvên hene.

Metn:

“What kind of a guy is the boss?” George asked.

²³¹ John Steinbeck, **Of Mice and Men**, (Çapa li ser înternetê), www.odyssey-academy.com/.../Of_Mice_and_Men. (10.12. 2015)

“Well, he’s a pretty nice fella. Gets pretty mad sometimes, but he’s pretty nice. Tell ya what—know what he done **Christmas**? Brang a **gallon of whisky** right in here and says, ‘**Drink hearty, boys**. Christmas comes but once a year.’”

“The hell he did! Whole gallon?”

“Yes sir. **Jesus**, we had fun. They let the **nigger** come in that night.(11)

Wergêr:

- Ev patronê we çi celeb mirov e, yaho?

- Naa. ew ne mirovekî xerab e, car caran serê wî lê

dlxe, lê dîsan peyayekî baş e. Binêr min ê çi bigota... Tu

zane bê wî di **Noelê** de çi kir? Wî **whiskyêke mezin** anî

vir, got: **zarokno**, ji salê carekê Noel e, **vexwin**.

- Wa mebêje. wî zirecêbek whisky anî?

- Bawer bike. newayî di peyva min de tune ye.

Xwedêyo. me çi çiqas kêf kiribû!... Wî wê şevê destûr da yê

reşik jî[...](25)

Dahûran:

Wergêr li vir peyva **Christmasê** wekî **Noel** wergerandiye. Christmas, mihîrcanek e ku xristiyan di 25ê berfanbare de rojbûna Hz. Îsa pîroz dikin. Noel jî heman tişt e ku di hin zimanên din wekî fransî de li dewsa peyva Christmasê tê bikaranîn. Peyva Noelê jixwe ji aliyê xwendevanên kurd ve tê zanîn. Bi vî awayî ev peyv rasterast hatiye wergerandin lê wateya wê ya çandî hatiye parastin. Stratejiya ku li vir hatiye bikaranîn ehlîkirin e.

A gallon of whisky wekî **whiskyêke mezin** hatiye wergerandin. Wergêr li vir peyva whîskiyê dubare kiriye û guherîneke ortografîk çênekiriye, adapteyî bilêvkirina kurdî nekiriye. Peyva gallon ji bo pîvana tiştên herîkbar tê bikaranîn ku galloneke amerîkî dora 3.785 litre digire, herwiha hin şîşeyên wîskiyê jî heqas digirin. Lewma, wergêr ji bo xwendevan xwe bi galon, lître û hwd ve mijûl nekin û metn herîkbar be, fraza **whiskyêke mezin** bikar aniye. Stratejiya li vê derê hatiye

bikaranîn hem ehlîkirin hem jî biyanîkirin e. Ji ber ku *whisky* wekî xwe mayê lê ji dewsa *gallonê* peyva mezin bikar aniyê ji bo ku xwendevan hêsantir têbigihêjin û xwendin herîkbar be.

Drink hearty biwêjek e ku wateya wê "hemûyê vexwin, bi xweşî vexwin, dema we xweş be." ye û wergêr dewsa vê biwêje tenê peyva **vexwin** bikar aniyê. Wekî gelek caran tê gotin wergerandina biwêj û pêşgotinan du zehmetiyên sereke yên wergerê ne. Li vir wergêr biwêj notralîze kiriye û li dewsa biwêjê peyveke sereke, vexwin, bikar aniyê. Herwiha stratejiya ehlîkirinê bikar aniyê.

Peyveke din jî **boys** e ku di înglîzî de ji bo pirjimara peyva zarok tê bikaranîn. Di peywenda vê paragrafê de di nav mêrên ku hevalên hev in û di grûbekî de nin tê bikaranîn.²³² Herwiha dema ku ev kes gazî hev dikin jî peyva boys bikar tînin. Wergêr di kurdî de peyva **zarokno** ji dewsa vê peyvê bikar aniyê û wergereke rasterast kiriye, herwiha ehlîkirin bikar aniyê.

Peyva **Jesus**, ji ber ku aîdî xristiyanîyê ye, wergêr vê peyva dînî adapteyî çandeke din dike ku ji aliyê xwendevanên kurd ve baş were fehmkirin û bi peyva **Xwedêyo** werdigerîne ku ev jî dibe ehlîkirin.

Peyveke din jî **nigger** e ku ji peyva negro (reş) tê û ji bo kesên afrîkî yên reş tê bikaranîn. Bi taybetî li Amerîkayê ji bo wan kesan dihat bikaranîn ku kole bûn û dihatin firotin. Niha ev peyva ji bo kesekî reş wekî heqaret tê qebûlkirin. Wergêr ev peyva wekî **reşik** wergerandiye û ehlîkirin bikar aniyê.

Firat Cewerî jî bêtir ehlîkirin bikar aniyê. Yanê çiqas ji destê wî hatiye bandora zimanê din li ser kurdî nedaye xuyakirin û peyv, qalib bi gotineke din rihê kurdî di wergerê de daye xuyakirin ku mirov nizanibe ew werger e û jixwe armanca ehlîkirinê jî ew e. Di van wergeran de bêtir ehlîkirin hatiye bikaranîn. Yanê wergêran hewl dane ku tesîra zimanê din, bi awayekî din jî hegemonyaya wî zimanî di kurdî de nedine xuyakirin.

²³² bnr. <http://dictionary.cambridge.org/dictionary/english/boy>

2.4 WERGER WEK ZIMANÊ SEREKE YÊ KURDOLOJİYÊ

2.4.1 Vegerîna çandî di wergerê de û Kurdolojî

Têgeha Vegerîna Çandî di Wergernasiyê de li sala 1990an di pirtûka Susan Bassnett û Andre Lefevere ya bi navê *Werger, Dîrok û Çand(Translation, History and Culture)* de cih girt. Beriya wan jî Mary Snell Hornby behsa wê têgehê kiribû. Tişta li vir armanc dikirin pêkanîna şîrkatiyeke zimannasî û çandê bû, yanê hevgerêdana teoriyên çandî û yên zimannasiyê bû, ne ku bi temamî piştguhkirina zimannasiyê di wergerê de.

Nîqaşên ku vegerîna çandî ji wergerê re anî ku çand jî pişkeke wergerê ye û divê wergêr dema wergerand bala xwe bide ser vê yekê jî. Lê tişta ku vegerîna çandî ji wergernasiyê re anî tenê ev nîqaş nibû. Herwiha wergera postkolonyal, wergera kolonyal, werger û hegemonya jî ji çend mijaran in ku derketin meydanê. Ev mijarên ku em behs dikin bê guman ne di qada wergerê de be jî ji bo lêkolîneran bûne mijarên balkêş. Lê divê mirov van nîqaşana di qada wergernasiyê de jî bike ka gelo tirkî bandoreke çawa li ser kurdî dike, ka hegemonyayeke tirkî li ser kurdî heye, ka wergêr dema metnek ji tirkî yan jî ji îngilîzî werdigerîne di bin bandora van zimanan de dimîne; gelo wergêr tercîhên peyvên ku werdigerîne li gorî van zimanan hildibijêre û bi gotina Venuti biyanî dike(foreignize), yan gelo li gorî zimanê xwe hildibijêre, ehlî dike(domesticate); ka gelo wergerandina bi van herdu awayan de mirov dikare tespît bike bê kîjan ziman li ser kîjan zimanî hegemonyayekî pêk tîne, bandorê li zimanê din dike? Ev pirsên sereke ne ku bi taybetî di van bîst-sih salên dawî piştî vegerîna çandî di wergernasiyê de derketin. Digel nîqaşên ku rasterast bi pêvajoya çawaniya wergerandina berhemekê ve elaqedar in, ev tiştên me hejmartî jî divê di peywenda wergernasiya kurdî de nîqaş li ser werin kirin.

Li gorî Bassnett bi vegerîna çandî di nav wergernasiyê de, xebateke li ser pêvajoya wergerê wê rêyekê derxe pêşiya me ku em têbigihêjin ka pêvajoya metnê ya manîpulatif çiqas tiştekî tevlihev e; yanê metnek çawa ji bo wergerê tê hilibjartin, wergêr di hilibjartina metnê de roleke çawa hildigire ser xwe, edîtor, weşangêr roleke çawa hildigirin, stratejiyên ku ji aliyê wergêr ve tên bikaranîn li gorî kîjan krîteran

tên hilbijartin, metnek ji aliyê çanda armanc de çawa tê hildan.²³³ Ev gotinên Bassnett, piştî nêzîktêdayînên çandî di wergernasiyê de derketin pêş. Têgihêjtinên bi vî awayî ku li ser wergernasiyê tên kirin ji bo wergera kurdî û Kurdolojiyê jî girîng in. Sedema hilbijartina berhemên wergerî ji bo kurdî roleke wekî "polîtîk" û "îspatkirina karîna kurdî" jî hildide ser xwe. Lewma yek ji wergêrên navdar di kurdî de, Kawa Nemir, dema ku dest bi wergera Ulyssesa James Joyce dike bi van gotinan sedemeke wergerandina Joyce di hevpeyvîneke xwe ku dide malpereke tirkî de, wiha tîne ziman:

"Ez îddîa dikim ku di navbera Îrlanda û Kurdîstanê de kopriyeke ruhê heye. Kurd hê ne di ferqê de ne lê ezê xeta di navbera Dublîn-Diyarbekirê bi wergera Ulyssesê ava bikim. Ev jî heye: Ez Ulyssesê di heman demê de ji bo ku ez bêsînorîyê nîşanî wan kesan bidim ku bi xefletê kurdî hepsî cureyeke ortodoksiya zimên dikin. Joyce belkî nekarî tişteki bi vî awayî di zimanê Gaelic de bikira, lê bi wergerê be jî ez di wê nîyetê de me ku vîna bi kurdî bikim."²³⁴

Taybetiyeke pirtûka James Joyce, Ulysses, ew e ku bi salan wergêr mijûl kirine ji ber zimanê wê yê dijwar ku Joyce li hin cihan li gorî xwe peyv ava kirine. Wergêrê ku Ulysses wergerandiye tirkî, Nevzat Erkmen, ji bo ku xwendevan bikaribin berhemê bixwînin ferhenga Ulyssesê amade kiriye, ji ber ku têgihêjtina pirtûkê bêyî wê ferhengê dijwar e. Gelo mirov van pirsan bike wekî çima Joyce û çima Ulysses, yek ji berhemek e ku wergerandina wê herî dijwar e, wê gavê mirov dikare bersîvên bi vî awayî bide: Ulysses di cîhanê de yek ji berhemên herî dijwar e ku mirov bikaribe wergerîne, lewma wergerandina wê bo kurdî, wekî Kawa Nemir dibêje wê "bêsînorîya" kurdî, herwiha karîna kurdî li hember zimanên din îspat bike. Di vê peywendê de werger dibe navgînek ji bo ku kurdî karîna xwe îspat bike, xwe li formên herî dijwar biceribîne û ji bo kesên ku kurdîyê wekî zimanekî biçûk dibînin, yan jî hin kesên ku wî wekî ziman jî nabînin xwe îspat bike. Herwiha dibe ku wergêr ji bo îspatkirina dewlemendiya zimanê xwe jî ev metn hilbijartibe. Li gorî Seydo Aydoğan, heta dibistanên kurdî venebin ne mimkun e ku berhemên bi vî awayî bînin xwendin. Ji ber ku kesê ku dixwaze van berhemên bixwînin jixwe di zimanekî din de

²³³ Susan Bassnett, "The Translation Turn In Cultural Studies", **Constructing Cultures: Essays On Literary Translation Topics in Translation**, (123-140), r.125.

²³⁴ Egoistokur, Kawa Nemir: "Îrlanda ile Kürdistan arasındaki Ruh köprüsü", 2013, <http://egoistokur.com/ulysses-irlanda-ile-kurdistan-arasindaki-ruh-koprusu/> (çile 15, 2015)

ew xwendine.²³⁵ Ji ber ku armanca wergêr li vê derê ne ew e ka ev berhema wê bi kurdî were xwendin yan na, lê bêtir ew e ku ev berhema ku mirov dikare wekî kanon pênase bike di kurdî de hebe.

Tiştê ku vegeerîna çandî balkêş dike ev e ku werger di navbera wan çandan de pêk tê ku têkiliyên hêzê yê asîmetrîk di navberê de heye.²³⁶ Wekî mînak îngîlîzî li hemberî zimanên din serdest e. Ji ber wê, wergerên ji îngîlîzî bo zimanên din zef zêdetir e ji wergerên ji zimanên din bo îngîlîzî. Herwiha wergerên ji tirkî bo kurdî zêdetir e ji wergerên ji kurdî bo tirkî. Ev hêza ku em behs dikin tenê di hejmara wergeran de xuya nabe, herwiha di pêvajoya wergerê de jî xwe xuya dibe. Di wergerê de hêza du ziman û çandan ne wekî hev e. Tiştê em li vir behs dikin hêza karîna zimên nîn e, lê şert û mercên derveyî karîna zimên in. Ji ber vê yekê vegeerîna çandî û wergera postkolonyal tevî hev dixebitîn; ji ber vê yekê vegeerîna çandî balê dikişîne li ser "kêmîneyî"yê(minority), kêmîneyiya ku wekî bi awayê Venuti fehm dike ku em ê li jêrê têgihêjtina Venuti ji wê rave bikin.²³⁷

Albert Branchadell di pirtûka xwe *Zimanên ku Kêm Hatine Wergerandin* (*Less Translated Languages*) de zimanên wekî Katalanî, Baskî, Bretonî, Korsîkayî, Welşî û hwd. wekî zimanên kêmîneyî pênase dike û destnîşan dike ka vegeerîna çandî, vegeerîna hêzî û avakirina neteweyê çawa dibe paşxaneyek ji bo têgeha van "zimanên ku kêm hatine wergerandin".²³⁸ Herwiha, li gorî Albert Branchadell, em nikarin pênaseyêke zimanên kêmîneyî ji bo wergernasiyê ava bikin, lewma em mecbûr in vê têgehê ji qadên din deyn hildin. Branchadell, pênaseya "peymanî Ewropayê ji bo zimanên herêmî yan jî kêmîne"²³⁹ esas digire. Li gorî Branchadell,

²³⁵ Îbrahîm Seydo Aydoğan, "Hin Pirsgerêkên Wergerê Di Kurmancî de", **Guman-1**, (267-283), Lîs, Ankara 2013.

²³⁶ Albert Branchadell, Lovel Margaret West, **Less Translated Languages**,(Ed.) John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2005, r. 6. ; Susan Bassnett, "The Translation Turn In Cultural Studies", **Constructing Cultures: Essays On Literary Translation Topics in Translation**,(123-140), Multilingual Matters, Great Britain 1998, r.137.

²³⁷ Albert Branchadell, Lovel Margaret West. **h.b.**, r. 6.

²³⁸ Bnr. Albert Branchadell, Lovel Margaret West, **h.b.**, r. 2.

²³⁹ Wekî me li jorê jî got ger kurdî zimanekî kêmîne ye yan na pirseke zelal nîn e; lê ger zimanekî kêmîne nebe jî, ji aliyê şert û mercan de kêm zêde wusa ye. Ji ber ku di "peymanî Ewropayê ji bo zimanên herêmî yan jî kêmîne" de pênaseya zimanên kêmîneyî wuha derbas dibe: "Zimanên herêmî yan jî kêmîne" ew ziman in ku "di erdekî taybet yê dewletekî de ji aliyê welatîyên wê dewletê ve yê ku hejmara wan ji nifûsa mayî kêmîtir e; û ji zimanê(n) resmî yê wê dewletê cudatir e." Li gorî vê pênaseyê kurdiya soranî ji alîkî, ya parçeyên din yê Kurdistanê dikevin nav vê pênaseyê. Lê li gorî vê pênaseyê jî pirsgerêkek heye, ji ber ku wê gavê erebiya ku li tirkîyê tê

digel ku zimanên kêmneyî têgeheke îzafî ye, ew ziman in ku "çiqaş gewre dibin bila bibin, ji zimanên li hemberî wan yê pirîneyî (majority) *kêmtir kes* wan diaxifin."²⁴⁰ Ji ber vê, zimanekî ku li derekî kêmneyî ye, dibe ku li cihekî din zimanekî pirîneyî be.²⁴¹ Ev têgihêjtineke guherbarî ye, ji ber vê, zimanek dibe ku ji cihekî pirîneyî be û ji cihekî din dibe kêmneyî. Lewma wekî mînak erebî li Erebîstanê zimanekî pirîneyî be, li Tirkiyê dibe zimanê kêmneyî.

Herwiha teorisyenê wergerê Venuti pênaseya kêmneyîyê di bikaranîna wê di wergernasiyê de berfireh hildide. Li gorî Venuti bi kurtî zimanên kêmneyî, zimanên ne standart û nexwediyê otorîteyê di hundirîne ku netewe û civat; ziman û edebiyata wan ji aliyê polîtîk ve qels e û hindik tê temsîlkirin, kolonîze ye û ji heqê xwe mehrûm e; tê dagirkerkirin û lekedarkirin.²⁴² Li gorî Albert Branchadell ev têgihêjtina Venuti ji kêmneyîyê ne tiştêkî zimannasiyî bû.²⁴³ Di rewşa kurdî de jî em ê di bikaranîna wergerê de wekî têgihêjtina Venuti ya û ya Branchadell esas bigirin. Ji aliyekî din ve jî, herçiqaş armanca me ne diyarkirina kurdî wekî zimanekî kêmneyî yan jî pirîneyî be jî, ji ber ku rewşa kurdî tê de ye û pênaseya Branchadell û Venuti ya zimanên kêmneyî li ser vê rewşê rûdinê, lewma em ê vê rewşê li ser kurdî şîrove bikin. Jixwe li gorî Michael Cronin hegemonyaya îngîlîzî û hêza dinyaya ku îngîlîzaxêv e, wusa kiriye ku xêncî îngîlîzî *hemû* zimanên din êdî bûne kêmneyî.²⁴⁴

Herwiha kurdî zimanekî ku kêm tê wergerandin e.²⁴⁵ Zimanên ku kêm tên wergerandin ew ziman in ku di qada navneteweyî de kêm caran dibin jêdera wergerê

axaftin jî, ku zimanê dewletan e jî dibe kêmnê. Pênaseya wê çî bibe jî, em ê li gorî vê pênaseyê û li gorî têgihêjtina Venuti li ser pênaseya kêmnê bi axivîn ku rewşa kurdî jî kêm zêde bi wî avayî ye. Ji bo agahiyên bêtir derbarê zimanên kêmneyî bnr: Branchadell, Albert, Lovel Margaret West. **h.b.**, r. 2.

²⁴⁰ Albert Branchadell, "Minority Languages and Translation", **Handbook of Translation Studies**, (97-101), Vol. 2, John Benjamins, Amsterdam/ Philadelphia, 2011.

²⁴¹ Albert Branchadell, **h.b.**, (97-101)

²⁴² Lawrence Venuti, *The Translator, Translation and Minority*, introduction, v.4. issue 2. , 1998. vgz. Albert Branchadell, Lovel Margaret West. **h.b.**, r. 4.

²⁴³ Albert Branchadell, **h.b.**, r. (97-101).

²⁴⁴ Mona Baker, "The Changing Landscape of Translation and Interpreting Studies", **A Companion to Translation Studies**, (15-27), Blackwell, Oxford 2014.

²⁴⁵ Ev têgeha "zimanên ku kêm tene wergerandin" serenavê pirtûkeke edîtorî ye ku ji aliyê Albert Branchadell û Lovel Margaret West ve hatiye amadekirin. Mijara wê zimanên kêmneyî ye û ka vegeerîna çandî, vegeerîna hêzî û avakirina neteweyê çawa paşxaneyê van zimanên ku kêm tene wergerandin pêk tîne. bnr: Albert Branchadell, Lovel Margaret West, **Less Translated Languages**.

bêyî ku mirov lê binihêre ka ji aliyê çend kesî ve tên axaftin.²⁴⁶ Di vê pênaseyê de zimanên wekî katalanî, kurdî dibin zimanên ku kêm tên wergerandin û zimanên wekî înglîzî, erebî, almanî, frensî jî dibin dijberî vê pênaseyê ne, lewra ev ziman zef tên wergerandin. Nirxandina kurdî, wekî zimanekî ku kêm hatiye wergerandin yan jî di peywenda gotinên Venuti de zimanekî kêmîneyî, pêkan dike ku em li gorî mijar û pirsên li jêr behsa wergera kurdî bikin.

Armanca sereke ji bo wergerê ew e ku berhemeke ku em di zimanekî de nikarin bixwînin û têbigihêjin bi wasiteya wergerê di zimanê xwe de bixwînin. Lê di rewşa kurdî de armanca wergerê ya sereke ne ev e. Ji ber ku hema hemû kurdên xwende vê gavê duzimanî ne. Yên li tirkîyê, tirkî û kurdî dizanin; yên derveyî welêt jî kurdî û zimanê wî welatê ku tê de ne dizanin. Wê gavê gelo em çima berheman werdigerînin kurdî? Lewra em dikarin heman berhemê bi zimanekî din jî bixwînin- jixwe dixwînin jî- û em têdigihêjin jî. Wê gavê di kurdî de têgihêjtina berhemekê ji bo wergerê ne armanca sereke ye. Ji ber ku em dikarin di zimanekî din de bixwînin û têbigihêjin, fikran ji wan pirtûkan hildin û di nivîs û gotinên xwe de bi kurdî îfade bikin, bikar bînin. Dema ku armanca sereke ya wergerê "têgihêjtinbarîfî" (intelligibility) nebe, di vê rewşê de werger dibe tiştekî nepêwîst; û wextê werger nepêwîst be jî hinceta wê ya bingehî namîne û bi awayekî meşrûiyeta wê namîne. Dema ku werger meşrûiyeta xwe wunda bike jî çend pirs derdikevin; wekî: Wextê werger ne pêwîst e, wê gavê çima tê kirin? Kê wergerê dike û çima? Li gorî kîjan krîteran werger tên kirin? Kê pirtûkên wergêrayî dixwîne?²⁴⁷

Di rewşa kurdî de bersîva van pirsan hêsan nîn e, lê wekî Toury îfade dike, werger hem ji bo parastin hem jî ji bo geşedana zimanên kêmîneyî dikare were bikaranîn û werger li hemberî zimanê din yê pirîneyî berxwedanek e, ji bo ku ew zimanê pirîneyî nekeve dewşê.²⁴⁸ Ji vî aliyê ve mirov dikare rewşa wergera kurdî bişîbîne vê yekê ku çawa em di hewlekê de ne ku li mala xwe kurdî biaxifin ji bo ku kurdî ji holê ranebe, em wusa jî di hewlekê de ne ku berheman wergerînin kurdî ji bo

²⁴⁶ Albert Branchadell, Lovel Margaret West. **h.b.**, r. 1.

²⁴⁷ Albert Branchadell, Lovel Margaret West. **h.b.**, r. 258.

²⁴⁸ Gideon Toury, "Aspects of translating into minority languages from the point of view of Translation Studies." **Multilingua – Journal of Cross-Cultural and Interlanguage Communication** 4, (3–10), 1985. vgz. Albert Branchadell, "Minority Languages and Translation", **Handbook of Translation Studies**, r. (97-101).

ku zimanê kurdî bijî, xurt be û bigihêje nişên nû û zimanên pirîneyî wekî tirkî nekeve dewsê. Ji vî aliyî ve rola wergerê li gorî armanca wergerê ya sereke yanê *wergerandina berhemekê ku em nikarin di zimanekî din de bixwînin* diguhere û roleke *parastina zimên, îtirazek li hember zimanên din* hildigire ser xwe.

Di Kurdolojiya îro de ku xebatên dîsîplînên curbicur li ser Kurdolojiyê tên kirin bivênevê pêdivî bo wergerê heye ji bo ku ev xebat bimeşin. Kurdolojî û wergernasî herdu jî bi awayekî înterdîsîplînerî dixebitin ku me beşên beriya vê de behs kiribû ku wergernasî êdî bi mijarên curbicur wekî kolonyalîzm, post-kolonyalîzm, çandnasyê û hwd. ve mijûl dibe; ji ber vê mirov dikare bêje ku *bikaranîna wergernasyê*²⁴⁹ di qada Kurdolojiyê de wê vîzyona Kurdolojiyê jî berfirehtir bike ber bi mijar û xebatên li ser dîsîplînên nû ve ku Kurdolojî pê ve pêwendîdar e.

Herwiha Kurdolojî gelek dîsîplînan di nav xwe de dihewîne wekî zimannasî, filolojî, cografya, etnolojî, civaknasî, antropolojî, ekonomî, tarîx, polîtîka, psîkolojî û hwd.²⁵⁰ Ji vî aliyî ve têkiliya wergernasî û Kurdolojiyê ew e ku werger vê derê dibe navgînek ku pêkan dike ku Kurdolojî bikaribe bi awayekî înterdîsîplînerî bixebite. Ji ber ku bêyî wergerê nemimkun e vê gavê xebat li ser Kurdolojiyê pêk werin. Sedema vê yekê ev e ku Kurdolojî mecbûr e bi zimanên din wekî îngîlîzî, almanî, rûsî, frensî bixebite. Ev perspektîfa Kurdolojiyê ku wê ber bi zimanên din dehf dide; Kurdolojiyê mecbûrî wergerê, wergernasyê dike. Bêyî wergerê ev perspektîfa Kurdolojiyê ku di destpêkê de bi xebatên mîsyoner û biyaniyan mecbûrî wergernasyê bû, niha jî dîsa bi xebatên ku her derê cîhanê li ser kurdî têne kirin, dibe mecbûrî werger û wergernasyê ye. Ev mecbûriyet, fêdeyekî dide înterdîsîplîneriya Kurdolojiyê jî, ji ber ku bi saya wergerê înterdîsîplîneriya Kurdolojiyê geş dibe, bi xebatên curbicur û bi zimanên curbicur. Jixwe taybetiyeke Kurdolojiyê jî ew e ku digel înterdîsîplînî, herwiha pirzimanî ye, ji ber ku xebatên Kurdolojiyê ne tenê bi kurdî bi zimanên din jî têne kirin. Herwiha beş û programên ku li zanîngehên derve bi navê Kurdolojiyê vebûne tenê bi kurdî kar nakin; digel kurdiyê bi zimanên wî welatî kar dikin. Ji vî aliyî ve mirov dikare wergerê wekî

²⁴⁹ Ji bikaranîne qesta me tenê wergerandina metnan nîn e, herwiha kurdolojî û wergernasî wekî du dîsîplînên cuda çawa dikarin fêdeyê bidine hev.

²⁵⁰ Akin, **h.b.**

zimanê sereke yê Kurdolojiyê pêname bike.

Xebatên wergera kurdî bi vegeerîna çandî ve wê deriyên nû ji bo wergera kurdî veke ku ji aliyê meseleyên wekî kolonyalîzm û postkolonyalîzmê jî xebat li ser wergera kurdî bêne çêkirin. Meseleyên *hêz* û wergerê ev demeke dirêj e di wergernasiyê de cih digirin. Teorîsyenên wergerê wekî Tymozko û Gertzler vê dawiyê meseleya "vegeerîna hêzî" (power turn) wekî mijareke bi serê xwe di wergerê de parastin. Tiştê ku dibe sedema vegeerîna çandî jî têkiliyên neyeksan yên hêzê ne, ji ber ku neyeksanî/newekhevî taybetiya sereke ya têkiliyên di navbera zimanên ku kêr têne wergerandin û zimanên domînant wekî îngilîzî, fransî, almanî û hwd. ne.²⁵¹ Tirkî li hemberî kurdî vê gavê zimanekî domînant e. Ji ber ku ne tenê di navbera Tirkan de di navbera Kurdan de jî di axaftinê de tê tercîhkirin û herwiha tirkî wekî zimanê televîzyonê (herçiqas qanalên kurdî jî hebin) zimanê medyayê, zimanê dewletê ye û serdest e. Ev têkiliyên di navbera tirkî û kurdî de bandorê li ser wergera kurdî herwiha bandorê li ser wergerandina berhemana jî dike. Yek ji wan sedeman jî ev e ku wergêrekî kurd her dem xwe hişyar dihêle ku çiqas ji destê wî were bi mentîqa tirkî nefikire, yan jî dema peyvek avakir dîsa xwe ji mentîqa tirkî dûr bixe. Bêguman tiştê wergêr li vir hewl dide ku bike wergerandineke tekûz e ku rihê kurdî di wergerê de bide nîşandan, ji aliyekî din ve jî ev çalakiyek e ku xwe ji bandora zimanê serdest xilas bike. Ger mirov bi vî çavî li wergera kurdî binihêre wê gavê mirovê şerekî ne tenê di navbera zimanan de, herwiha di navbera peyvan, hevokan û çandan jî bibîne ku li wir aliyê polîtîk yê wergerê derdikeve meydanê.

2.4.2 Kurdoloji wek wergernasî

Ev nîqaşên ku me li jor kirî di peywenda *vegeerîna çandî de li ser rewşa wergera kurdî* nixandinek e. Ji bilî vegeerîna çandî, Susan Bassnett û Doris Bachmann-Medick li ser *vegeerîna wergerê di çandnasiyê de* disekinin û Doris Bachmann-Medick li ser *vegeerîna wergerê di çandnasiyan û zanistên civakî de* disekine.²⁵² Di navbera nêrînên van herdu teorîsyenan yên li ser çandnasiyê de ferqek heye ku ev ferqa bandorê li ser nêrînên wan yê vegeerîna wergerê jî dike. Ji ber ku

²⁵¹ Albert Branchadell, Lovel Margaret West. **h.b.**, r. 6.

²⁵² Bachmann-Medick, "The Translational Turn", **Handbook of Translation Studies** Vol. 4, r. (186-193)

têgihêjtina Susan Bassnett ji çandnasiyê ji ekola Brîtîş(British) tê û bêtir ji aliyê polîtîk ve çandê dinihêre ku çandnasî li ser polîtîkaya nasnameyê, li ser nirxan ava bûye û li ser kêmîneyiyên çandî û civakî, yê marjînal dixebite; lê ya Bachmann-Medick bi navê wê yê Almanî *Kultûrwissenschaften* bêtir bikaranîna çandnasiyê di warê akademîk de ye. Digel ku *Cultural Studies* Anglo-Amerîkî ye û li ser bizav û konfliktê ava bû ye, *Kultûrwissenschaften* Almanî ye û bêtir analîtîk û hizirdar(reflectiv) e.²⁵³ Danîna vê ferqê lazim e ji bo ku em bikarin derbarê vegeerîna wergerî de biaxifin.

Wekî me berê jî rave kiribû, vegeerîna çandî di nav wergernasiyê de, wergernasî ji navenda wê ya zimannasiyê derxistibû, pêş de biribû û kesên pêşengî kiribûn jî teorîsyenên wekî Susan Bassnett û Andre Lefevere bûn. Herwiha bi xebatên kesên wekî Venuti, Cronin, Gentzler, Hermans, Snell Hornby jixwe wergernasî ji peywenda xwe ya adefî derketibû û ji wê derbastir bûbû. Lê wekî Bachmann Medick destnîşan dike vegeerîna wergerî, wergernasiyê ji wan hemûyan jî wêdetir dibe. Ji ber ku vegeerîna wergerî bi taybetî ji dûrketina kategoriya wergerê ji wergernasiyê ber bi qadên dîsîplînerî yê çandnasiyan ve çêbûye.²⁵⁴ Yanê bi ketina wergerê nav çandnasiyan (humanities) û zanistên civakiyê (social sciences) vegeerîna wergerî çêbûye. Mirov dikare bêje ku vegeerîna çandî di nav wergernasiyê de nêrîneke çandî anî liser wergernasiyê ku li gorî vê nêrîna çandî jî nêzîktêdayîn û rêbazên nû li ser wergerê hatin avakirin (wekî nêzîktêdayînen Venuti, ehlîkirin û biyanîkirin), û vegeerîna wergerî ku di nav çandnasî û çandnasiyan de pêk tê bi rêbazên yan jî bi nêrînen wergerê li ser çandnasiyê û çandnasiyan dixebite. Lewma têgehên wekî "werger wekî çand"²⁵⁵, "werger wekî çandnasiyan"²⁵⁶ derdikevin meydanê.

²⁵³ Mary Snell-Hornby, "What's in a turn? On fits, starts and writings in recent Translation Studies", **Translation Studies**, Vol 2, No 1, (41-51) 2009. ; Aleida Assmann, **Introduction to Cultural Studies, Topics, Concepts, Issues**, The Warburg Institute, Berlin 2012, r. 27-28.

²⁵⁴ Bachmann Medick, "Introduction: The Translational Turn", **Translation Studies**, Vol. 2, No. 1, 2009. https://www.academia.edu/2083188/Introduction_The_Translational_Turn.(27.07.2015)

²⁵⁵ Doris Bachmann Medick, "The 'Translational Turn' in the Literary and Cultural Studies: The Example of Human Rights ", **New Theories, Models and Methods in Literary and Cultural Studie**, (213-233).

²⁵⁶ Doris Bachmann-Medick, "The Translational Turn", **Handbook of Translation Studies** Vol. 4, (186-193).

Me di dêstpêkê de behsa firehbûna perspektîfa wergernasiyê kiribû ku ji ber wê wergernasî êdî dikare li ser mijarên bêaxaftin(nonverbal) jî bixebite. Herwiha me mînaka Bachmann-Medick ya heqên mirovî dabû ku heqên mirovî yên gerdûnî tên adaptekirin ji bo heqên mirovî yên îslamî ku ev mînakeke vegeerîna wergerî bû digel ku perspektîfa vegeerîna wergerî bi vê ve sînordar nîn e. "Vegeerîna wergerî" jî hewleke bi wî awayî ye ku perspektîfa wergernasiyê berfirehtir bike. Dema ku li ser vegeerîna wergerî agahiyan dide Bachmann-Medick ber bi "vegeerîna wergerî" di nav çandnasiyan de sê gavan pêşkêş dike. Gava yekem *wergera di nav dîsîplînan de ye* ku werger nêzîktêdayîneke nû ya metodolojîk û epîstemolojîk pêşniyar dike. Werger dikare alikariya dîsîplînên wekî dîrok, civaknasî, edebiyata berawirdî, polîtîka û zanistê bike ku "nêzîktêdayîneke wergerî" pêk bîne. Bi gotina Bachmann-Medick wergernasî li vê derê di nav dîsîplînên çandnasiyan de (wekî dîrok, edebiyata berawirdî, civaknasî, polîtîka, zanist) belav dibe. Ya duyem de werger di nav pratîkên lêkolînê yên akademîk de dixebite, bi gotineke din *wergera di navbera dîsîplînan de ye*. Yanê ev interdîsîplîneriyeke rasterast nîn e ku mînaka wê nîqaşa vê gavê ya li ser "îradeya azad"(free will) e ku di Neurosciences û çandnasiyan de tê nîqaşkirin. Ya sêyem jî *werger wekî çandnasiyan e* ku werger dikare di şîrovekirina rewşên rasthatin, cudahî û konfliktên çandî yên gerdûnî de were bikaranîn. Wekî Bachmann-Medick diyar dike wergera li vir êdî bi têkiliyên dualî(binary) di navbera du zimanên netewî, du wêjeyên netewî, du çandên netewî de sînordar nabe.²⁵⁷

Me ji Kurdolojiyê re gotibû ku hemû zanistên civakî û mirovî yên bi Kurdan ve girêdayî dikevî nav wê. Li gorî vê pênaseyê digel zanistên civakî, dîsîplînên çandnasiyan jî dikevî nav wê ku mirov dikare van dîsîplînan wiha pêşkêş bike: antropolojî, ekonomî, erdnigarî, dîrok, zanista polîtîkayê, psîkolojî, civaknasî, felsefe, edebiyat, dîn, huner, muzîk û ziman. Ji ber ku dîsîplînên çandnasiyan û yên Kurdolojiyê hevbeş in mirov dikare nîqaşa "Kurdolojî wekî wergernasî" veke wekî ku Bachmann Medick "çandnasiyan wekî wergernasî" terîf dike. Lê ji ber ku nîqaşeke bi vî awayî ku pîrhêlî yê, derbasî derveyî çarçoveya vê tezê dibe em ê nekaribin vê nîqaşê pêşdetir bibin.

²⁵⁷ Doris Bachmann Medick, "Introduction: The Translational Turn", **Translation Studies**, Vol. 2, No. 1.

ENCAM

Di vê beşa dawî de em ê berê derbarê pêşveçûna wergerê di kurdî û Kurdolojiyê de nêrînên xwe bînin ziman, paşê nixandinên herdu beşên ku me nivîsandî bikin.

Paşxaneyêke xurt ya wergera kurdî tune ye. Ji ber vê jî ev dema ku em tê de ne demeke krîtîk e ji bo ku wergera kurdî pêş de here. Geşedana çand, ziman û miletan bi saya wergerê pêk tê. Ji bo geşedana zimanekî, herwiha ji bo perwerdeya bi wî zimanî pêkanîna pirtûk, gotar û her cure berhemên zanistî û nezaniyê lazim e. Bi taybetî di rewşa zimanekî wekî kurdî de, ku nikare her cure berhemên biafirîne-wekî mînak berhemên zanistî- wê gavê mecbûrî wergerê ye ku vê kêmasî û valahiya xwe dagire.

Ji ber bêderfetiyan heya vê gavê xêncî hewlên weşanxaneyan û yê şexsî pêngaveke xurt di wergera kurdî de çênebûye. Ji bo ku gaveke wuha bê avêtin jî berî her tiştî pêdivî ji finans û projeyan heye. Wekî mînak Katalonya ku di rewşa kurdî de bû demekê bi alikariya sazî û banqeyekê, koleksiyonên xwe yê wergerê yê herî navdar pêk anîn wekî berhemên navdar yê edebiyata cihanê û berhemên navdar yê edebiyata cihanê yê sedsala 20an.²⁵⁸ Bêguman, ji aliyê polîtîk û ekonomîk ve mirov nikare rewşa wergera kurdî rasterast bişibîne ya Katalanan jî, lê rastiyeke heye ku bêyî proje û finansê nemimkun e ku wergera kurdî bigihêje asta zimanên din. Herwiha di Tirkan de jî bi pêşevaniya wezîrê perwerdeyê Hasan Ali Yucel, çalakiyêke wergerê ya şoreşî pêk hat ku wî di sala 1939an de Komîteyêke wergerê saz kir û di sala 1940an de jî Buroya wergerê ava kir ku armanca wê xurtkirina zimanê tirkî bi politikayên zimên yê nû bû û ji bo geşkirina çandî, damezrandina planekê bû. Bi saya edebiyatvan û akademisyenan di serî de 'klasîkên cihanê' hatin hilbijartin û wergerandin û di nav çar salan de 109 pirtûk, heta sala 1967an jî hezar pirtûk hatibûn wergerandin.²⁵⁹ Herçiqas, rewşa kurdî, ji ber bêderfetiyan ne guncan e ku çalakiyêke bi vî awayî bimeşîne, mirov dikare di van mînakên de bibîne ka miletên din

²⁵⁸ Christina Garcia de Toro, "Translation between Spanish and Catalan today", **Less Translated Languages**, (269-287), John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2005.

²⁵⁹ Saliha Paker, "Turkish Tradition", **Routledge Encyclopedia of Translation Studies**, (550-559), Routledge, New York, 2009.

çalakiyên wergerê çawa meşandine ji bo ku wergerê pêşde biherin.

Werger ji bo standartkirina zimanekî jî girîng e wekî di mînaka wergera tirkî de dixuye ku peyvên Osmanî ji zimanê xwe avêtin û şoreşeke zimên pêk anîn û kêmasiya di zimên de jî bi alikariya wergerê dagirtin. Ji bo standardizasyona zimanê kurdî jî werger roleke taybet dilîze, ji ber ku bi saya pirtûkan û wergeran peyvên ku di zimanê rojane de ji aliyê her kurdî ve nayên zanîn lê li herêmên cuda de tên bikaranîn, di zimên de bi cih dibin û piştî demekê hindî tên bikaranîn rûdinên. Ji vî aliyê ve mirov dikare wergerê, ji bo planzasî û standardizasyona zimanê kurdî bikar bîne. Yanê herçiqas çalakiyek ji bo wergerê li Tirkîyê û Kurdîstana bakûr hebe jî pêdiviya van çalakiyan ji plansaziyekî heye, ji bo werger bikaribe rola xwe di standartbûna zimên, di perwerdeyê û di geşedana çand û zimên de bilîze.

Ji ber ku werger di kurdî de hê qadeke nû ye ku ev bîst sih sal e bi awayekî nîsbeten xurtir tê kirin pirsgirêkên wê hene û pir in. Ji bo çareserîya pirsgirêkên wergerê jî nirxandin li ser lazim e. Ev jî, bi ronahiya teoriyê nirxandinên li ser pratîkê çê dibe. Herçiqas armanceke vê tezê ne pêkanîna teoriyeke wergerê be jî, nirxandina wergera kurdî bi nêzîktêdayînên çandî ye.

Ev teza; hewl dide ku rola wergerê di kurdî de û ji bo Kurdolojiyê destnîşan bike. Di çarçoweya çandnasî, nêzîktêdayînên çandî û wergernasiyê de nirxandinên li ser wergera kurdî û Kurdolojiyê dike. Di vê peywendê de şîroveyên vegeerîna çandî di wergernasiyê de û vegeerîna wergerî li ser wergera kurdî û Kurdolojiyê dike. Di beşa ewil de me behsa dîrok, pergal û teoriyên wergerê kir û em bi taybetî li ser teoriyên çandî yên di wergerê de sekinîn. Herwiha me behsa "vegeerîna çandî" û "vegeerîna wergerî" kir. Me perspektîfên vegeerîna çandî û ya wergerî nîşan da ku ev herdu nîsbeten çalakiyên nû ne di qada wergerê de û nîqaşên nû ji wergernasiyê re anîn. Me behs kir ku van herduyan ji wergerê re nûbûnek anîn û wergernasî ji bin bandora zimannasiyê xilas kir, û perspektîfên wê firehtir kir. Me behs kir ku ev herdu vegeerên wergernasiyê ji wergerê re hêlên nû anîn wekî civaknasî, etîk, xebatên postkolonyal û hwd. û bi vî awayî jî perspektîfa wergerê ji zimên wêdetir çû û li ser meseleyên ku di destpêkê de ne di qada wergernasiyê de bûn hatine nîqaşkirin.

Di beşa duduyan de piştî dîrok û nasandina wergera kurdî û nirxandina li ser

mînakên ji wergerên kurdî, em li ser Kurdolojî û wergernasiyê sekinîn. Me destpêkên wergerê di kurdî de wekî salên 1650yan diyar kir. Rola wergerê di wan deman de têgihêjtina metnên kurmancî, avakirina nimûneyên nivîskî ya zimanekî bû ku ew ziman bêtir zimanekî devkî bû. Paşê me behsa rola wergerê di Kurdolojiyê de kir ku wekî beriya Hawarê û piştî Hawarê me kire du beş. Piştî 1930yan bi ekola Hawarê mirov dikare bêje wateya wergerê ji bo Kurdolojiyê jî guherî, ji ber ku werger êdî hem ji bo agahdarkirina gel ji nivîsên biyanî hem jî bi endîşeyên zimên hatin kirin ku ev rêyeke tekûztir bû. Li dora 1980yan çalakiyeke wergera kurdî ya xurt ji derveyî welêt çêbû û paşê ew hewldanên li derve li tirkîyê jî encam da û çalakiyên wergerê yê li tirkîyê bi taybetî piştî sala 1990an bi rabûna qedexeyên li ser zimanê kurdî dest pê kir û di salên 2000 de jî ev çalakiî geştir bû. Herwiha ji wan salan heta niha jî sal bi salê xurtir dibe ji ber sedemên pêşvebûna qismî ya kurdî û avabûna enstîtuyên kurdî. Rola wergera kurdî niha jî digel xurtkirina zimanê kurdî wekî hewleke polîtîk jî tê dîtin li hember zimanên serdest wekî tirkî. Ev hewlên polîtîk, wekî me diyar kiribû ji hîlbijartina wergêr ya berheman bigire heta bikaranîna stratejiya wî/ê wekî ehlîkirin û biyanîkirinê (nemuhîm e ku wergêr van stratejiyan bizane û bikar bîne, lê ya muhîm ew e ku mirov dikare bandora van stratejiyan di wergeran de bibîne) diçe.

Me diyar kir ku wergera kurdî bi wêjeya kurdî ve hevaheng meşiyaye, herçiqas rêjeya wergeran di nav berhemên ku hatine çapkirin de hindik be jî. Niha, dema ku hejmarên berhemên wêjeyî zêdetir dibin, werger jî li paş vê çalakiyê namînin û jixwe berhemên ku tên wergerandin piranî wêjeyî ne. Li ser wergerandina berhemên wêjeyî gotinên Itamar Even Zohar girîng in. Di gotareke xwe ya di sala 1978an de Itamar Even Zohar çend gotinan li ser wêjeyê dike. Even Zohar destnîşan dike ku werger di çandên cuda de û di demên cuda de rolên cuda hildigire li ser xwe. Hin caran xwediyê satuyêke bilind e hin caran jî xwediyê statuyêke marjînal e. Bi veguhezîna Susan Bassnett, di wê gotarê de Even Zohar diyar dike ku şert û mercên civakî yê cuda hene ku tesîrê li ser hilberîna wergerê dikin. Wekî mînak edebiyateke ku di destpêkê de ye û hêj digihêje bi îhtîmalekî wê zêdetir berheman wergerîne; her wiha edebiyateke ku guherînen mezin tê de çêdibin yan jî yeke ku

xwe wekî marjînal dibîne û bi gotina Even Zohar xwe "lawaz"²⁶⁰ dibîne, wê dîsa zêdetir berheman wergerîne. Lê edebiyateke ku êdî ava bûye û têra xwe dike wê kêmtir berheman wergerîne. Li gorî Susan Bassnett ev tespît di heman demê de ji bo vegeerîna çandî destpêkek e.²⁶¹ Herwiha, dema mirov kurdiyê bi zimanên din ve muqayese dike pêdiviya kurdî jî vê gavê bi wergerandina zêdetir berheman heye. Ger em li ser berhemên wêjeyî bifikirin, ev pêdiviya wergerê ne tenê ji ber şert û mercên civakî ye, di heman demê de ji ber rewşa wêjeya kurdî ye jî ku kêmtir berhem tê de hene yan jî berhemên tîn nivîsandin li gorî berhemên wêjeyî yên zimanên din lawaz dimînin.

Me di binbeşa 2.3an de sê nimuneyên wergerê li gorî Teoriya Venuti, ehlîkirin û biyanîkirin, nirxandin. Di nimuneyên ku me nirxand de encameke bi vî awayî derket: Herçiqas ji mînakên ku me ji pirtûkan hilbijartî sînordar be jî, di van mînakên de bêtir stratejiya ehlîkirinê hatiye bikaranîn. Eger ku em ji van mînakên bigihêjin encamekê em dikarin bêjin ku di van numuneyan de, mîla wergêran li ser ehlîkirinê ye; yanê wergêr hewl didin ku di wergerên xwe de numuneyên aîdî çand û zimanê kurdî bikar bînin. Ev jî, vê yekê nîşanî me dide ku wergêr, naxwazin ku hêmanên zimanên din di wergera bo kurdî de xuya bibin. Yanê di wergerên bo kurdî de hegemonyaya zimanekî din qebûl nakin. Ji ber ku di biyanîkirinê de wergêr hêman/peyv/çanda zimanê din bi awayekî diparêze, lê di ehlîkirinê de wergêr numuneyên zimanê xwe(zimanê ku berhemê werdigerîne) bikar tîne. Bikaranîna ehlîkirinê nîşan dide ku wergêr di wergerê de kêmtir dixuye(li gorî Venuti nedîtî/nexuyayî dibe), hemanên çanda xwe bikar tîne ku ev karê xwendevan hêsantir dike ku têbigihêje û metnê herîkbartir bixwîne. Bi gotineke din di stratejiya ehlîkirinê de ziman û çanda armanc li hemberî çanda jêder li ber xwe dide, hegemonyaya wê qebûl nake. Di biyanîkirinê de jî zimanê jêder bandora xwe li ser zimanê armanc dide xuyakirin. Armanceke din ya bikaranîna ehlîkirinê di metnên me hilbijartî de, dibe

²⁶⁰ Edebiyatek li gorî kîjan qaîdeyê dibe lawaz, ev yeka jî hêjayî nîqaşê ye. Wekî mînak Edebiyata Îtalyan zêde berheman werdigerîne, wê demê ew dibe edebiyateke lawaz an na? Bnr. Bassnett, Susan, Andre Lefevere, **Constructing Cultures : Essays On Literary Translation Topics in Translation**, ed., r.127.

²⁶¹ Susan Bassnett, "From Cultural Turn to Translational turn: A Translational Journey", **Literature, Geography, Translation**, (67-80), Cambridge Scholars Publishing, UK 2011.

ku ew be ku wergêr xwestiye ku metn herîkbartir be, lewma ew stratejiya hilbijartiye. Ev biryarên ku wergêr daye dibe ku bi zanayî be yan jî bêyî zanîna wî be.

Di beşa 2.4an de em bi taybetî li ser vegeftina çandî di wergera kurdî de sekinîn. Wekî me behs kiribû, nêzîktêdayînên çandî rê vedike ku mirov bikaribe li ser wergera kurdî û Kurdolojiyê xebatên hêz, hegemonyaya zimanan; herwiha xebatên kolonyal, postkolonyal bimeşîne. Ji vî aliyî ve nêzîktêdayînên çandî ji wergerê re deriyekî nû vedikin, herwiha ji wergera kurdî re jî. Yek ji wan nêzîktêdayînên/stratejiyên Venuti bûn ku me di beşekê de, di 2.3an de, ji bo çend mînakên ji wergera bo kurdî nirxand. Li gorî Teoriya Venuti, ji bo ku mirov bikaribe destnîşan bike ka bi stratejiya biyanîkirinê, wergêr çawa di heman demê de biryarekî dide ku bi parastina hin hêmanên/peyv-frazên zimanê jêder metna jêder bêtir bide xuyakirin; yan jî ka bi stratejiya ehlîkirinê wergêr çawa hêmanên çanda/zimanê xwe bikar tîne û çanda/zimanê jêder bi temamî di wergerê de wunda dibe û bi vî awayî jî bi awayekî hegemonyaya zimanê armanc yan jî zimanê xwe di wergerê de nîşan dide.

Wekî me behs kiribû, pêkhatina wergerên kurdî jî ji aliyekî ve polîtîk e, îspatkirina çand û zimanekî ye. Weki di gelek qadên jiyane de ku Kurdan hewl dane meşruiyetekî qezenc bikin, werger jî bi awayekî meşruiyetekî, payebilindiyekî dide zimanê kurdî. Digel nivîsandina berhemana, wergerê di vê yekê de roleke girîng girtiye. Yanê rola wergerê ya di vê mînakê de ku em behs dikin, digel xwe gihandina kesên kurdîzan, îspatkirina hebûna kurdîyê ye. Wekî mînak hevoka "em ê êdî Shakespeare bi kurdî bixwînin" ne tenê bi vê armancê tê gotin ku Shakespeare wê bigihije xwendevanên kurdî yên ku hêvrîyê ne ku wî kurdî bixwînin, lê armanca wê bêtir ew e ku Shakespeare di kurdî de tê xwendin; digel îngîlîzî û tirkî di kurdî de jî êdî heye ku hebûna berhemên wî bi zimanê kurdî hem qedrê zimanê kurdî bilind dike, hem jî Shakespeare bi kurdî dide naskirin ku dîsa fêdeya wê jî ew e ku hevkartêkeriyeke(interaction) ziman û çandan çê bibe.

Di kurdî de jî rola wergerê ji gihandina ziman û çandan bo yekê din "wêdetir" çûye. Yanê ji armanca xwe ya esil derketiye, ber bi polîtîkayê, xwe îspatkirinê çûye. Herwiha armanc, îspatkirina karîna kurdîyê ye jî. Dema mirov sedema wergerandina

Kawa Nemir ya berhemên ji Joyce, Shakespeare dinihêre mirov dibîne ku sedemeke wî ya wergerandina berhemên wuha kanonîk û biprestîj ew e ku nîşan bide ku zimanê Kurdî dikare berhemên wuha qerase wergerîne.²⁶² Dibe ku sedemên din şexsî bin ku wergêr dixwaze hêza zimanê xwe jî biceribîne.

Bi kurtayî em gotinên xwe yê li jor şîrove bikin, wergernasî qadeke înterdîsîplîner e ku bi tevî çandasî û dîsîplînên din dixebite. Ji ber vê, nêzîktêdayînên çandî rêyeke nû vekiriye, rêya mijarên nû û nêzîktêdayînên nû ji bo wergernasiyê. Ji bo zimanekî bînanî kurdî ku werger hê tê de qadeke nû ye, vegeerîna çandî û nêzîktêdayînên çandî rêyeke nû vekirine û bi vî awayî jî mirov dikare li ser wergereke ji tirkî hatiye kirin -wekî mînak navê min sor e ya Orhan Pamuk- behsa têkiliyên hêzê, hegemonyayê, bike. Herwiha mirov dikare li ser berhemeke ku ji Îngîlîzî hatiye kirin -wekî mişk û mirov a Jack London- behsa têkiliyên hevkarigeriya van herdu zimanan bike ku du heb ziman in ku şert û mercên wan ne yek in û ne yeksan in. Li ser vê neyeksaniya şert û mercên zimanan Peter Newmark difikire ku tu ziman, tu çand heqas "prîmîtîv" nîn e ku nekaribe wekî mînak têgehên kompûterê wergerîne. Lê wergereke bi wî awayî pêvajoyeke dûr û dirêj dixwaze ji bo zimanekî ku di çanda wê de kompûter tune be. Ji ber vê Newmark di wê fikrêde ye ku werger hergavê mimkun e lê dibe ku ji ber hin sedeman nekaribe ew bandora zimanê orjînal çêdike, çêbike.²⁶³ Lewma em dikarin bêjin ku her cure berhem dikare di kurdî de were wergerandin, herçiqas ew zimanê li hemberî wê-zimanê ku jê wergerê dike- zimanekî ku ji aliyê nivîs, werger û têgehyan ve xwediyê tecrube û dewlemendiyeke mezin be jî. Yanê, herçiqas wergera kurdî hatibe îhmalkirin jî, nêrîn û nîqaşên bi vî awayî wê ji wergernasiyê re jî firsetekê çêbike ku bikaribe li ser kurdî bixebite. Bi vî awayî jî herdu alî ji hev îstîfade bikin, Kurdolojî, wergera kurdî û wergernasî.

Herwiha mijareke din ku me 2.4an de behs kiribû li ser vegeerîna wergerî bû. Doris Bachmann Medick di gotarên xwe de çandnasiyan wekî wergernasî terîf dike (humanities as Translation Studies). Li gorî wê, nêzîktêdayînên wergerî vê gavê

²⁶² Seçil Töre, **Translation and Ideology: A study of paratexts of Turkish Translations of the Kurdish Mesnevi Mem û Zin in the Republican Period**, (teza masterê, Zanîngeha Bogaziçi, Stenbol, 2015) r.53.

²⁶³ Peter Newmark, **A Textbook of Translation**, Prentice Hall, New York 1988. r. 6.

di dîsîplînên çandnasiyan de berbelav e û ev jî ji bo vegerîna wergerî gava pêşiyê ye.²⁶⁴ Dîsîplînên çandnasiyan ku mirov dikare çend hebên sereke bihejmêre wekî - zimannasî, filolojî, cografya, etnolojî, civaknasî, antropolojî, ekonomî, tarîx, polîtîka, psîkolojî- herwiha ew dîsîplîn in ku di nav Kurdolojiyê de jî cih digirin.²⁶⁵ Lê tiştên dîsîplînên di nav çandnasiyan û yên di nav Kurdolojiyê de ji hev vediqetîne ew e ku Kurdolojî tenê tîkiliya van dîsîplînan yê ku Kurdan elaqedar dike, dihevine. Wekî mînak tarîx di bin banê çandnasiyan de ye, lê dema ku mijar bû tarîxa Kurdan wê gavê ev dîsîplîn di heman demê de dikeve bin banê Kurdolojiyê jî.²⁶⁶ Herwiha wekî me rave kiribû, dema Bachmann Medick behsa vegerîna wergerî di nav çandnasiyan de dike gava yekem *wergera di nav dîsîplînan de* ye ku li vir qesta wê dîsîplînên çandnasiyan e ku çend hebên wan wekî dîrok, civaknasî, edebiyata berawirdî, polîtîka û zanist e. Di vê peywendê de, dîsîplînên çandnasiyan û Kurdolojiyê yek in û tiştên wan ji hev vediqetîne ew e ku ev dîsîplînên çandnasiyan dema ku dikevin bin banê Kurdolojiyê tenê bi mijarên ku bi Kurdan re elaqedar e dixebitin. Lewma di cih de ye ku mirov pirseke bi vî awayî bike ji bo Kurdolojiyê. Gelo mimkun e ku di pêşerojê de wergernasî alikariya dîsîplînên Kurdolojiyê bike ku di nav wan de nêzîktêdayîneke wergerî pêk were wekî ku Bachmann-Medick pêşbiniya nêzîktêdayîneke wergerî di çandnasiyan de dike? Gelo mirov dikare nîqaşên "vegerîna wergerî di nav Kurdolojiyê de" jî bike û "Kurdolojiyê wekî wergernasî" terîf bike? Ev nîqaşa hêja ye ku mirov bibersivîne, lê nîrxandîna mijareke bi vî awayî têra tezeke masterê nake, û derbasî derveyî sînorê vê teze dibe...

²⁶⁴ Bachmann Medick, "Introduction: The Translational Turn", **Translation Studies**, Vol. 2, (1), (2-16).

²⁶⁵ Herwiha Bachmann Medick çandnasiyan(humanities) hinekî berfireh hildide û zanistên civakî jî dike nav. bnr: Doris Bachmann Medick, "Introduction: The Translational Turn", **Translation Studies**, Vol. 2, (1), (2-16), r. 14(binnivîs).

²⁶⁶ Akin, **h.b.**

ÇAVKANÎ

- AIXELIA, Javier Franco, "Culture specific items in translation", **Translation, Power, Subversion**, (52-78.), Multilingual Matters, UK 1996.
- AKIN, Salih, "Çend Pirsgirêkên Kurdolojiyê", **Kovara Bîr** (1), 30 Ocak 2011.
<http://www.kovarabir.com/2011/01/salih-akin-cend-pirsgireken-kurdolojiye/>
(09.12.2015)
- ASSMANN, Aleida, **Introduction to Cultural Studies, Topics, Concepts, Issues**, The Warburg Institutue, Berlin 2012.
- AYDOGAN, Îbrahîm Seydo, "Hin Pirsgirêkên Wergerê Di Kurmancî de", **Guman-1**, (267-283), Lîs, Ankara 2013
- BACHMANN-MEDICK, Doris , "The Translational Turn", **Handbook of Translation Studies** Vol. 4, (186-193) John Benjamins, Amsterdam/ Philedelphia 2013
- BACHMANN-MEDICK, Doris, "The 'Translational Turn' in the Literary and Cultural Studies: The Example of Human Rights ", **New Theories, Models and Methods in Literary and Cultural Studies**, (213-233), WVT Wissenschaftlicher Verlag Trier, Bergstraße 2013.
- BAKER, Mona, "The Changing Landscape of Translation and Interpreting Studies" , **A Companion to Translation Studies**, (15-27), Blackwell, Oxford 2014
- BAKER, Mona and Samed Fekhry Hanna, "Arabic Tradition", **Routledge Encyclopedia of Translation Studies**,(328-337), Routledge, Oxford 2009.
- BASSNETT, Susan, **Reflections on Translation**, (Ed.), Multilingual Matters, New York 2011.
- BASSNETT, Susan , **Translation Studies**, Routledge, New York 2005.
- BASSNETT,Susan, "Culture and Translation", **A Companion to Translation Studies**, (13-23), Multilingual Matters, New York 2007.
- BASSNETT, Susan, "The Translation Turn In Cultural Studies", **Constructing Cultures: Essays On Literary Translation Topics in Translation**,(123-140), Multilingual Matters, Great Britain 1998.
- BASSNETT, Susan , "From Cultural Turn to Translational turn: A Translational Journey", **Literature, Geography, Translation**,(67-80), Cambridge Scholars Publishing, UK 2011
- BERMAN, Sandra and Catherine Porter (Ed.), **A Companion to Translation Studies**, Blackwell, Oxford, 2014.


- BRANCHADELL, Albert, Lovel Margaret West, **Less Translated Languages**, (Ed.)
Amsterdam/Philadelphia: John Benjamins Publishing Company, 2005.
- BRANCHADELL, Albert, "Minority Languages and Translation", **Handbook of Translation Studies**, (97-101), Vol. 2, John Benjamins, Amsterdam/ Philadelphia, 2011.
- CATFORD, J.C., **A Linguistic Theory of Translation**, Oxford University Press, Oxford
1965.
- CHENG, Yan and Jinging Huang, "The culture turn in Translation Studies", **Open Journal of Modern Linguistics**.
- DE TORO, Christina Garcia, "Translation between Spanish and Catalan today", **Less Translated Languages**, (269-287), John Benjamins Publishing Company,
Amsterdam/Philadelphia, 2005.
- Egoistokur, Kawa Nemir: "İrlanda ile Kürdistan arasındaki Ruh köprüsü",2013,
<http://egoistokur.com/ulysses-irlanda-ile-kurdistan-arasindaki-ruh-koprusu/> (çile 15,
2015)
- Encyclopædia Britannica
- HALVERSON, Sandra, "Translation", **Handbook of Translation Studies**, Vol. 1,(378-384),
John Benjamins, Amsterdam/ Philadelphia 2010.
- HATIM, Basil and Jeremy Munday, **Translation an Advanced Resource Book**, Routledge,
New York 2004.
- HAWAR**, Cild 1, Hejmar 1-23 (1932-1933), amd. Firat Ceweri, weş. Nudem,
Stocholm, 1998, r. 383.
- Insanokur, Ulysses Kürtçeye çevriliyor-Kawa Nemir ile söyleşi, 2013,
<http://www.insanokur.org/ulysses-kurtceye-cevriliyor-kawa-nemirle-soylesi-ayca-orer/> (çile 15, 2016.
- LEFEVERE, Andre, **Translation/ History/ Culture**, Routledge, New York 1992.
- LONG, Lynne, "Translation of sacred texts", **The Routledge Handbook of Translation Studies**, (464-474), , New York, Routledge 2013.
- MARINETTI, Cristina, "Cultural Approaches", **Handbook of Translation Studies** Vol. 2,
(26-30), John Benjamins, Amsterdam/ Philadelphia 2011
- Merriam-Webster.com
- MUNDAY, Jeremy,**Introducing Translation Studies** , Routledge, New York 2001.
- MUNDAY, Jeremy, "Translation Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (419-
428), John Benjamins, Amsterdam/ Philadelphia 2010.

- NEWMARK, Peter, **A Textbook of Translation**, Prentice Hall, New York 1988.
- NIKITINE, Basil, E.B. Soane. "The tale of Suto and Tuto", **Bulletin of the School of Oriental Studies**, Vol. 3, No. 1. (69-106) , University of London,
<http://www.jstor.org/stable/607166> (10.12. 2015)
- “No Full Bible in Kurdish Yet”, **Kurdish Facts and West-Asian Affairs**, j.5, r. 15-16.
- NORD, Christiane, "Functional Approaches", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1,(120-128), John Benjamins Amsterdam/ Philedelphia, 2010.
- NUDEM WERGER, Hejmar 1, amd. Firat Cewerî, 1996. r.4-5.
- ÖPENGİN, Ergin, "Bizava Wergerê di Kurmanciyê de", **In Proceedings of first international conference on Kurdish Literature**, xxx. Sanandaj, University of Kurdistan Press, 2011.
- Oxford English Dictionary**, Oxford University Press.
- ÖZYÖN, Arzu, "Çeviride Eşdeğerlik Kavramının Tanımlanması ve Eşdeğerlik ile İlgili Sorunlar", **International Journal of Languages' Education and Teaching** Vol. 2, (28-39), 2014.
- PAKER, Saliha, "Turkish Tradition", **Routledge Encyclopedia of Translation Studies**, (550-559), Routledge , New York, 2009.
- PALUMBO, Giuseppe, **Key Terms in Translation Studies**, Continuum, London/ Newyork 2009.
- PAMUK, Orhan, **Benim adım kırmızı**,
kitabxana.net/files/books/file/1331208008.(26.12.2015).
- PAMUK, Orhan, **Navê min sor e**, wer. Mustafa Aydogan, Doz û Nefel, Stenbol û Stocholm, 2002.
- PANOÛ, Despoina, "Equivalence in Translation Theories: A Critical Evaluation", **Theory and Practice in Language Studies**, Vol. 3, No. 1, (1-6), January 2013.
<http://www.academypublication.com/issues/past/tpls/vol03/01/01.pdf> (28.12.2015)
- PÎRBAL, Ferhat, "The history of translating Kurdish literature from foreign languages into Kurdish", **The Kurdish Globe**, 2008,
<http://www.kurdishacademy.org/?q=node/540>(10.12.2015).
- PYM, Anthony, **Exploring translation theories**, Routledge, New York 2014.
- PYM, Anthony, “European Translation Studies, une science qui dérange, and Why Equivalence Needn’t be A Dirty Word”, **TTR: Traduction, Terminologie, Rédaction** 8 (1), (153–176), vgz., Sandra Halverson, "*Translation*", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (378-384), John Benjamins, Amsterdam/ Philedelphia 2010.

- RABABAH, D. Hussein Abdo, " Translation Movement in the Arab World: From the Pre-Islamic Era Until the end of Umayyad Dynasty(Before 610-750 A. D.)", **International Journal of Language and Linguistics**, 3(3), (122-131), 2015. (<http://www.sciencepublishinggroup.com/j/ijll>) (21.12.2015)
- ROBINSON, Douglas, **Becoming a Translator-An Introduction to the Theory and Practice of Translation**, Routledge, New York 2003.
- ROHAT, **Kürdoloji biliminin 200 yıllık geçmişi (1787-1987)**, Köln, komkar yayınları, 1987.
- RZEPKA, Martin, "Protestants among Kurds and some problems of the Bible translations into Kurdish in the 19th Century", **Orientalia Christiana Cracoviensia** 1, (87-92), 2009.
- RZEPKA, Martin, "Some Remarks on the Bible Translation into Kurdish and the Kurds. The Christian Missionary Narratives from the 19th Century" , **Fritillaria Kurdica**, Bulletin of Kurdish Studies, No 1.
- SANCAKTAROGLU BOZKURT, Sinem, **Translation of text as translation of culture: A Study of the Turkish Translation of John Fowles's The French Lieutenant's Woman, Jeanette Winterson's Oranges are not the only Fruit, and Julian Barnes's England, England**, (Doktora, Zanîngeha Hacettepeyê, Enstituya Zanistên Civakî, Enqere, 2010).
- SAPHIRO, Gisele, "The Sociology of Translation: A New Research Domain", **A Companion to Translation Studies**, (82-94), Blackwell, Oxford 2014.
- SCHMIDT, Goran, "Foreignization and domestication in the Croatian translations of Oscar Wilde's The Picture of Dorian Gray" **Jezikoslovlje**, Vol. 14, No. 2-3. (237-548), 2013. <https://www.academia.edu/7353017>. (11.11.2015)
- SERFIRAZ, Mesud, "Di Çapemeniya Kurdî ya Dewra Osmanî de Wergera Wêjeyî", **Wêje û Rexne**, Istanbul, : Kayhan Matbaacilik, 2014.
- SERFIRAZ, Mesud , **Kurd, Kitêb, Çapxane Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de(1844- 1923)**, Peywend, Stenbol, 2015.
- SHUTTLEWORTH, Mark, "Polysystem", **Routledge Encyclopedia of Translation Studies**, (197-199), Routledge, New York, 2009.
- SNELL-HORNBY, Mary, "The Turns of Translational Studies", **Handbook of Translation Studies** Vol. 1, (266-370), John Benjamins, Amsterdam/ Philedelphia 2010.
- SNELL-HORNBY, Mary, **The Turns of Translation Studies-New paradigms or shifting viewpoints?**, John Benjamins, Amsterdam/Philedelphia 2006.
- SNELL-HORNBY, Mary, "What's in a turn? On fits, starts and writhings in recent Translation Studies", **Translation Studies**, Vol 2. (1) , 41-51.

- STEINBECK, John, **Of Mice and Men**. www.odyssey-academy.com/.../Of_Mice_and_Men. (10.12. 2015)
- SUÇİN, Mehmet Hakkı, **Journal of Turkish Studies**, Arapça Çeviri Geleneği: Altın Dönem, Harvard University Department of Near Eastern Languages and Civilizations, 2010. <http://users.okan.edu.tr/cemal.demircioglu/sucin.pdf> (25.12.2015).
- THOMAS, J.C., **Encyclopedia Iranica**, <http://www.iranicaonline.org/articles/bible-viii> (11. 12. 2015)
- TÖRE, Seçil, **Translation and Ideology: A study of paratexts of Turkish Translations of the Kurdish Mesnevi Mem û Zin in the Republican Period**, (teza masterê, Zanîngeha Bogaziçi, Stenbol, 2015).
- TRIVEDI, Harish, "Translating Culture vs Cultural Translation", **91st Meridian International Writing Program**, The Iowa University, (1 Spring 2005), <http://iwp.uiowa.edu/91st/vol4-num1/translating-culture-vs-cultural-translation> (07.08.2015)
- VAN BRUINESSEN, Martin, **Kürdolojinin Bahçesinde**, Vate yayinevî, Istanbul 2009.
- VAN BRUINESSEN, Martin, "Kurdish Studies in Western and Central Europea", **Wiener Jahrbuch für Kurdische Studien 2**, (18-96), Jahrgang 2014.
- VENUTI, Lawrence, **The Translation Studies Reader**, Routledge, New York, 2004.
- VENUTI, Lawrence, **The Translator's Invisibility**, Routledge, New York 2008.
- WILDE, Oscar, **Happy Prince**, pinkmonkey.com/dl/library1/happy.(26.12.2015)
- WILDE, Oscar, **Prensê Bextewar**, wer. Samî Hezil, Stenbol: Sîtav, 2015.
- XANÎ, Ehmedê, **Mem û Zîn**, wer. Mehmet Emîn Bozarslan, Gün yayınları, Istanbul, 1986.
- YANG, Wenfen, "Brief Study on Domestication and Foreignization in Translation", **Journal of Language Teaching and Research**, Vol. 1, No.1, (77-80), 2010. <http://ojs.academypublisher.com/index.php/jltr/article/viewFile/01017780/1511> (19.11.2015).





T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

KÜLTÜREL BİR PRATİK OLARAK ÇEVİRİ

-Çeviribilimden Kürdolojiye Giden Yollarda-

Ziyattin YILDIRIMÇAKAR

13711017

Danışman

Yard. Doç. Mesut KESKİN

Mardin – 2016